3. Malbata Êhûka (Osmanê Çep)
4. Malbata Kûzê
5. Malbata Îso

Gund ji 100 xanî pêk tê û derdora 1500 kes di gund de dijîn. Dîroka çêbûna gund bêtirî 300 sal heye. Navê gund ji navê kalê malbta yekem ku li gund bi cih bûye, hatiye.

Xelkên gund debara jîyana xwe bi çandinîyê dikin û xizmetkirina darên zêtûnê di asta yekem de ye, ligel çandina zevîyên genim, ceh û nîskan. Hin malbat pêz xwedî dikin, lê hin jî tenê ji bo xwerina malê.

Weke kêrhate, gelek ji mêrên gund nêçîra kewan dikin û ta niha ev pîşe berdewam e.

Li derdora gund gelek bîr hene:

Bîrker, Qestel, bîra Çobana, bîra Kûra, bîra Danxiz, bîra Dudere û bîra Îskan. Hemû bîr ta nih av di wan de heye û gel ava xwe ji wan dibin û sewalan jî li derdorê av didin.

Ji xanedanên gund Seyda Axa ango Seydayê Dîkê bi nav û deng e, weke serokê eşîra Amkan dihate naskirin û rêbertiya nêzî 100 gundî dikir, gelek caran li dijî Mirûdan şer daye dest pêkirin û derdora 40 salî berdewam kiriye. Seydayê Dîkê carcarinan li dijî Fransîyan jî şer û pevçûn kiriye.

Tê gotin ku Seyda Axa kesayeteke adil û welatparêz bû. Di dema serwerîya Fransîyan de, Seydayê Dîkê serkêşîya şerekî mezin li dijî wan kiriye, û di encamê de li gelîyê Tîran tirêna leşkerên Fransî diqulibîne, her wiha bûyereke din jî li çerxerêya Be'dîna diqewime û dîsa êrîşî tirêna leşkerên Firansî dikin û gelek zîyanan digihînin wan. Lê piştî wê, artêşa Fransî dikeve gundê Qêsim û gefan li gundîyan dixwe û hewl dide ku gund bişewitîne, lê piştî danûstandinê ji gund vedikişin û bi firokan êrîşî bargehên Mirûdan li çîyayê Bilêlko dikin.

Gundê Dîkê ku nêzî gundê Qêsim e û li alîyê bakur dikeve, pêşengtîya hemû gundên derdorê dikir, mîna gundên : (Qêsim, Çobana, Zerka, Kêla, Kerê, Eşûnê û Zivingê).

Eşîreta Bilo ku li bakurê Helebê bû, lê Tirkan ew koçî bakurê Îranê kir û niha herêma Blocistan tê binavkirin.

Odeyek li gund hebû ku tê de xelkên gund di bin sîya xanedanên gund de hemû şîn û şahîyên xwe bi hev re derbas dikirin û bi awayekî komînal hemû pirsgirêkên xwe bi rêya danûstandinê çareser dikirin.

■ **Gundê Qêsim**

Gundê Qêsim

Dîroka çêbûna gund bêtirî 300 sal heye. Navê gund ji navê kalê malbta yekem ku li gund bi cih bûye, hatiye.

Şerîf Mihemed– Welîd Bekir

Gundê Qêsim, girêdayî navçeya Reco ya kantoan Efrînê ye, li bakurê Efrînê dikeve. Gundê Qêsim bi darên zêtûn û fêkîyan navdar e mîna: Vîşne, Mîşmiş û Tirî. Cihê gund bi navê (Gaza Hêra) dihate naskirin.

Gundê Qêsim ji 5 malbatên bingehîn pêk tê, û bingeha hemûyan yek malbat e:

Lê kêmasîya her dayîk û bavekî ew e ku zarokan nakin aşiqê zanistê, her tim dibêjin, kengê ew mezin bibin ew ê zana bibin. Lê mixabin, ger mirov di zarokatîyê de li ser bingehekî xurt perwerde nebe, sibe her çiqas ew kes derfet di dest de hebe, dê dîsa kêm be, enerjîya wan têra lêgerînê nake. Ji bo vê ew her di kêmasîyên xwe yên zarokatîyê de dimînin. Tiştê herî şaş ew e ku mirov li benda sibe ango li benda paşeroj û mezinbûnê dimîne. Ev yek mirovan dixapîne, ji ber van sedeman civak her li şûna xwe dimîne û ber bi pêşketinê ve naçe.

Çima xwendin mirovan diafirîne? Her çiqas mirov dixwîne, di zanebûnê de kûr dibe, agahîyên nû nas dike, bi naskirina her zanebûneke nû re, mirov dighêje encameke ku hîna her tiştî nizane û neghîştîye zanebûna her tiştî. Mîna ku Sokrates dibêje; "Ez tiştekî tenê baş dizan im, ew jî ew e ku ez tu tiştî nizan im." Ji ber vê yekê jî bi naskirina her agahiyeke nû re mirov ji nû ve diafire, ev afrandin jî mirov temam dike, mirov dike mirov. Mirov ji qaliban derdixe û ji tiştên neyînî diparêze. Lê bizanibin ne her xwendin, tenê xwendina ku mêjîyê mirov azad dike û mirov di paqijbûnê de dihêle, ew xwandin hêvîya mirovahîyê mezintir û xurtir dike. Ji bo vê mirov ji nû ve tê dunyayê, ji nû ve çavên xwe li dunyayê vedike û ji nû ve hebûna xwe di jîyanê de dipeyitîne. Her zanebûneke ku mirov fêr dibe, salekê ji temenê mirov zêde dike, mirov li hemberî mirinê her tim jîyaneke nû û bihêz diafirîne. Ji bo vê jî mirov bi rêya xwendinê gumanên xwe nas dike û îknah dibe ku mirov ji nû ve tê afrandin.

Çareserî çi ye ku asta xwandina pirtûkan di nava her civakekê de pêş bikeve;

-Divê ku di her malekê de pirtûkxaneyek hebe.

-Divê ku di her dibistan, akademî, zanîngeh û di qada perwerdeyê bi giştî de çalakîyên xwendinê hebin.

-Divê ku rewşenbîr her dem di nava civakê de pirtûkan belav bikin û çalakîyan ji bo pêşketina xwêndinê çêbikin.

-Divê kesên ku pirtûkan dixwînin naveroka wê pirtûkê li ser alavên ragihandinê mîna Radyo bi civakê re parve bikin.

Wisa dê hêdî hêdî bi rêya çalakîyên di nava civakê de asta xwendina pirtûkan çêbibe. Birastî jî xwendin afrînerî ye, ji bo vê bixwînin û xwe ji xwandin, zanebûn û zanistê bêpar û nezan nehêlin. Tiştê ku mirov bi serkeftî û bêtirs bighîne armancê, xwendin e. Encax mirov bikaribe bi rêya xwandinê jîyanê ji her tiştê nebaş û qirêj biparêze, bi pêkanîna vê yekê re dê mirov aram be û di heman demê de jî dê jîyan şad û bextewar be. Wekî gotineke Baba Tahirê Uryan heye, dibêje: "Nezanî kêmasîyeke lê nehînbûn jî kêmasîyeke dubare ye." Ji bo vê bixwînin, bixwînin, bixwînin.

belge, pirtûk û rûpel, yanî her tiştê ku bi çêbûna gerdûnê û heya vê kêlîyê derbasî dîrokê bûye, ev ne malê min û ne jî malê te ye, ev malê dîrokê ye. Ev tê wateya ku xwendin derya ye, her çiqas mirov avê jê vexwe, ewqas jî tî dibe û aşiqê xweşîya wê dibe, her dixwaze jê vexwe. Her çiqas mirov pirtûkan bixwîne, ewqas jî zindî dibe, dibe xwedî mêjîyekî ku gerdûnê di nava destên xwe de bizivirîne. Biqasî ku xwe nas dike, ewqas jî dibe afrîner. Mirovê ku dixwîne, ji jîyanê natirse, ji xwe û hebûna xwe nareve. Her tim dibe lêgervanê heqîqetê û hêza her xwezaya li derdora xwe mezin dike, xemil û bedewîyê dide. Her tiştî bi wate dike û wê watebûyînê vediguherîne zanistê, ew zanist jî dibe peyv, ji wê peyvê jî gelek peyv derdikevin, li pey hevdu dibin hevok û di nava rûpelên pirtûkan de rêz dibin. Wisa jî bi hezaran pirtûk bi destê mirovan tên afirandin. Lê xwandina dibistanê tenê têra mêjîyê mirov û naskirina jîyanê nake, em bi gelemperî behsa xwandina pirtûkên cîhanî dikin. Divê ku her şagirtek û xwandekarek di heman demê de bibe xwandevan. Ji bo zêdetir bikaribe hêza xwe ya zanistê xurtir bike û bi agahîyên xwe yên zanistî pêşketinê di civaka xwe de çêbikin.

Di vir de em ji xwe bipirsin, gelo çima asta xwandinê di Rojhilata Navîn de bi gelemperî kêm e? Birastî jî civak ewqas xwe nawestîne, ji xwandinê hez nakin, kesên ku dixwînin jî pir kêm in. Civaka me di vê demê de bi taybetî bi qasî ku internetê bikartîne, pirtûkan naxwîne. Ger ku biqasî demê xwe bi inernetê derbas dikin, tenê rojê saetk bidana xwandina pirtûkan jî, dê kêmekî civak zana bûbûya. Lê mixabin, ji bo vê bê zanist û zanebûn dimînin, ev yek jî dihêle ku gelek zehmetîyan di jîyanê de bibînin. Xwandin jîyana mirov, tecrûbeyên mirov, gera mirov û têkilîyên mirov temam dike. Ji vê zêdetir xwendina pirtûkên cîhanî, pirtûkên zanist, felsefe, îdeolojî, roman, çîrok û... whd, mêjîyê mirov nû dike, dihêle mirov her tim di nava guhertin û veguhertinê de be. Ev mirov zêdetir dikarin sûdekê li civaka derdora xwe bikin, ew dikarin li pêşîya zehmetîyên civakê rawestin û civakê bînin asta pêşketin û zanebûnê. Civaka ku asta xwendina wê bilind be, di civaka ku ciwan, biçûk, kal û pîr rewşenbîr bin, tirs li ser wê civakê tune ye. Ew civak her tim di xwezayîya xwe de parastî dimîne, tu carî nayên bişaftin û windakirin. Her çiqas dijminê wê civakê hewl bidin zererê lê bikin, nikarin û li hemberî wê zererê li xwe dikin. Birastî jî mirov û civaka xwedî rewşenbîrtî bihêz û xwedî vîneke bêsînor e. Ji bo vê em her çiqas bixwînin, em ê bi heyva li esîmanê ra bibin heval û hogir. Niha di her welatekî de ji bo pêşketina asta zanebûna civaka xwe li her derê, di dibistanan de, akademiyan de, li sûkan, li bajaran, li gundan û di her malekê de pirtûkxane hene. Ji ber ku dema mirov ku ve diçe û li pêşîya xwe pirtûkan dibîne, êdî bi wan mirovan re hezkirin û meraqa xwendinê çêdibe.

Xwendin Afrînerî Ye

Fatma Sîdo

Her çiqas mirov dixwîne, di zanebûnê de kûr dibe, agahîyên nû nas dike, bi naskirina her zanebûneke nû re, mirov dighêje encameke ku hîna her tiştî nizane û neghîştîye zanebûna her tiştî.

Em ê bi gotina helbestvanê gewre, nemir Seydayê Cegerxwîn dest pê bikin,dibêje: Xwendin nebe kes naçe pêş, peyda dibin pir derd û êş!

Di jîyana mirovan de ya herî zêde ku mêjî, zanebûn, zanist û naskirinê dide, xwendin e. Xwendin dihêle mirov xwe, derdora xwe, hebûna xwe, koka xwe û... hwd, nas bike. Mirovê ku dixwîne, her çiqas negihêje rastîyekê, dîsa jî digihêje naskirin û hebûna wê. Beriya çêkirina gerdûnê û heya roja îro tev bûye zanist û zanebûn. Ev zanist û zanebûn jî bûye,

Ez her ne şev im ku êşan hilgirim û li benda berbangekê bimînim
Ez her ne agirek im ku bisojim û li benda barîna baraneke ku min vemrîne bimînim

Ez ew tîpa ku ji nav pirtûka xwedê hatiye dizîn im
Ez ew kesayeta ku li ber êşa bisîkekê jî hêstiran dibarînim
Ez ew gîyana ku êdî nema dikare bi awiran gazind û gîlyan biweşînim
Ez ew kesa ku ji mêj ve ji ber çûyîna te mirim

De ka ji min re bibêje çima tu diçî?
De ka ji min re bibêje çima tu diçî?.

Çima tu diçî?

Şivîn Hecî

Ka ji min re bibêje çima tu diçî?
Ma ne ez bûm a ku dil ji te re kir hêlîn
Ma ne ez bûm a ku hezkirin ji te re kir mizgîn
Ma ne ez bûm a ku hest ji te re kir xemrevîn
Ma ne ez bûm a ku mejî ji te re kir helbest û vîn

De ka ji min re bibêje çima tu diçî?
Qey min jî parek nîn e ji hembêz û bîn
Qey min jî parek nîn e ji awir û bişirîn
Qey min jî parek nîn e ji hezkirin û evîn
Qey min jî parek nîn e ji te û bihareke rengîn

De ka ji min re bibêje çima tu diçî?
Hew dikarim peyvan bicivînim ji bo te
Hew dikarim êşan biçilmisînim li dû te
Hew dikarim rondikan bibarînim li ser te
Hew dikarim bijîm dûrî te

De ka ji min re bibêje çima tu diçî?
Ma ez her ne payîz im ku pelan biweşînim û ji nû ve şîn bibim

Ragihandina Vînê

Xemgîn Remo

Min evîna xwe
Li ser baskê perwaneyê ragihand
Helbesteke tî
Bi şîravê vehand
Û ji te re şand ....
Bi axîn û keserên hevdîtinê
Û xwezîyên xalxalokan
Ji bo kulîlkên çolan
Di sibeheke buharî de vegêrand
Û min çi got û te tewand .....
Çend salên bejok
Dûrî werzên vînê
Di baweşek şevînî de
Te hevendê birçî li mêrgê çêrand ...
Narînê .....!!
Bînvedana jînê
Ez te awazek şahîyê
Bi kemaneya Dilşad dijenim
Bo hêvîyên têkçûyî
Û nalîna ji birînê .....
De guh bide vê bizav û livlivînê
Tê bizanibî dildarê te çendî şêt e
Ey şêrînê ... dilrevînê .....
Tu kanîyeke zelal
Diherikî çolbeyaran
Binefş û lale dibişkivin hemereng
Li sibehên kerb û kînê ...
Silav li rojbûna te .. li dana te
Ku didî min hingivê dawerivandî
Bi girnijîn û bişkurînê .....



Nizanim!

Ciwan Qado

1

Li serê min dixe
hew yekcar gotineke din bibêjim
nizanim!
Ma yên pir diaxivin çi bi ser xistin?
Gotina herî dawî li ba wan "mû bi zimanê min ve şîn hatiye".
Û ji ber ku nizanim zimanan kur bikim
devê xwe digirim û bêdeng dimînim.
Ha ji min tê jî çavên xwe bigirim û hew careke din wan vekim
yan jî ya ji her tiştî rehettir bikim
Çavên xwe bi yên bûkeke zarokan ra biguherim,
ku çavên wê ber bi hundir ve qulipî bin.

2

Tenê zarok dikarin xweşik û di cihê xwe de bibêjin: Na
Loma hîn ew şeş salî ne li ber derîyê cehnemeyekê ku jê re "Dibistan" tê gotin, tên danîn.
Tê de 12 salan ser hev fêr dibin çawa hew karibin careke din bibêjin: Na
Dilê min bi mezinan dişewite,
gava dixwazin hev kêm bikin ji hev re dibêjin:
Tu zarok î!
Ma ew bi xwe çi ne, û çi dikin?
Jîyana xwe gişî bi lez û bez derbas bikin
bo careke din karibin bibêjin: Na.

Sîng Mertal im



Îsmet Hesen

Erê ez Arîna kurd im
Agir û polat û merd im
Tak ji kezîyên çîyayê
Kurmênc
Ji Ezrayîl re naberdim
Dîsa hatim xwedawend im
Melhema kovan û derd im
Bila cîhan ker û gêj be
Bila nan hişk û ji mêj be
Bila asîman qirêj be
Sinc û qada xwedawendan
Can û serê xwe bi serdim
Ev bû sê sal
Ji dil dûr im
Pişt xûz û kal
Lal û kor im
Jîyan bû çal
Birîn kûr im
Dest bûn gopal
Xwedî tûr im
Gav çal e çal
Hêvî hûr im
Hêj sîng mertal
Ziman şûr im
Herdem Kendal
Meştenûr im
Bo şevên tal
Meet bilûr im



■ **Tabloya Emîn Ebdo**

Û fenera wî hemîşe di destê wî de bû, her wiha bersiva wan dida û digot ev ya karê min e û peyvîn tê de qedexe ye û nayê pesindkirin ji kokê de.

Ev gerdiş bû weke çîrokekê li ser zimanan, herkesî ji hev re digotin; gelo bavê fener kor bûye yan bodele bûye. Rojekê ji rojan hişmend hevsûyê bavê Fener ji navenda bajêr tê û berê wî li malê ye di vê çarçovê de li ser kolana derverê herdu hevsî pêrgî hev hatin piştî silavê û li çax û demên hevdu pirsîn û vegotin, Hişmend ew pirsa bi tirs a di dilê wî û sercem gelê Amûdê de jê kir û got:

Hişmend, egera vê fenerê di destê te de çiye?, xwedê neke tu ne kor î û asîman ne bê roj e.

Bavê Fener: Kî ji te re bibêje roj heye tu bawer nekî, ji ber ku ewana kor in.

Hişmend: Ez fêr nebûm mebesta te çi ye?

Bavê Fener: Mebesta min roj nîn e.

Hışmend: Ma ev a li asîman çiye ma tu nabînî û asîman ji ber tîna wê tê sotin?!.

Bavê Fener: Ev roj ne roja me ye roja, herkesî ye ji bilî Amûdê tenê û heger tu peyva min bawer nakî heta ku tu sax bî nema rojê dibînî.

Hişmend: Ez tê negihîştim.

Bavê Fener: Gerek e navê te ne Hişmend ba, belê bêhiş û mendehoş ba.

Hişmend: Dîyar e ku tu bodele bûye bavê Fener, yek ji vî û yek ji wî bi vî awayî herdu pev ketin û şênîyên taxê tev derketin û bi zor ew ji hevdu vekirin. Hişmend berê xwe da malê û bi rê de dipeyivî; ev ê dîn dibêje ev roj ne roja me ye, ma qey Amûda me tenê bê roj e, dîn bûye û xwedîyên wî nîn in.

Bavê Fener jî berê xwe da mal û ji xwe re digot; ez ketim tora torîkan, dibêje ev roj roja me ye jî, ka roja me, ji bilî bîst û yekê adarê roj ji me Kurdan re nîn e.

Welatê Bê Roj

Dibêje ev roj roja me ye jî, ka roja me, ji bilî bîst û yekê adarê roj ji me Kurdan re nîn e..

Pêşeroj Cewherî

Li bajarokê Amûdê zilamek hebû, navê wî Milet bû her ku ji malê derdiket fenera wî herdem di destê wî de bû, li kolanên bajarê navborî bi şev û bi roj çîroka fenera milet bû.

Kulek bû di dilê miletê bajarokê Amûdê de, xelkê ji xwe re digot; gelo ev çi raze bi roj ronîya rojê heye û bi şev şemala elktrîkê geş û gur e, ev çi dîyarde ye. Ji ber vê yekê şênîyên bajarokê Amûdê di nav xwe de navê wî kirbûn bavê fener, bêyî ku ew pêzanibe û bi vî şêweyî xelkê ew destnîşan dikir. Li ser nasnavê bavê fener kevanî û zarokên wî û bi giştî binemala wî tev de jê re digotin û nedigotin da ku ji vê gerdişê berde beyhûde bû herdem wî bi ya xwe dikir.

■ Tabloya Mîdya Xelîl

rîdirêj ez birim odeyeke wisa ku dojeh jê xweştir bû. Di wê odeyê de emîr rûniştîbû weke ku li ser erşa xwedan be. Wê kêlîyê ez gêrî wê dojehê bûm, min dizanîbû wê çi bê serê min, lewma min yekser xwe di quncika odeyê de kumişand hev û bangî Tawisê Melek kir da ku min ji vê qirêjîya ku dê li min bibe, xelas bike, lê wî jî xwe kir ku mirî ye û serî li min û qîrîniya min hilneda! emîrê rîgenî li odeyê serî li qêrînên min hilda û bi çirnaxên hovetîya xwe, xwe li min danî û tu şeref bi gulîyên min re nehîşt. cilên li min parçe parçe çirandin, axîna laşê min ji hev xist û tiştek di min de nehişt, paşê cilên xwe li xwe kirin û ez weke kûçikeke kûzekûz pêkeve li erdê hiştim û di derî re derket. Piştî çend deqeyan herdu zilam ketin hundir, ez pir ditirsiyam ku ew jî bi ser min de temam bikin, lê wan bi destên min girt û ez vegerandim odeya ku ez jê anîm. Ax bavo....!!

-Dilyar û Zînê!. Ka Dilyar û Zînê? Ey xwedayo.... bi ku ve birin kezebên min, ax bavoo, haawar bavoo...!!

Min dest, ling û serê xwe çiqas di derî de lêxist, lê qet kesî li min venegerand. Êdî xwîn di serî û dest û lingê min re derdiket û tevahîya Reqayê di bin qêrîniya min de ma, lê kesî li min venegerand. Ax Zînê, ax Dilyarê eceb çi tînine serê we û hûn li kur in kur... ! Hûn ber bi kîjan qedera nedîyar ve çûn?...

Êdî ji qehra dil û laşê xwe ez ta demekê li ser hişê xwe ve çûm. Ya rast ez nizanim çiqas dem derbas bû, lê ya min dizanî agir bi dil û hinavê min ketibû, evîna dilê min mirîbû û mûmên hêvîyê di çavên min de vemirîn. Piştî çend kêlîyan, mîdeya min pir li hev ket û tiştek di min de nema. Axx wa sed nalet li her tiştê pîroz be û sed nalet li pûştî û heramîya di hundirê min de be, min nedixwast êdî bijîm...!! Min bi hibra xwîna xwe ya sor di koşeya xanî de li ser dîwarê dojehê çîroka xwe nivîsand ‘’Madem xweda bêdeng e, çîroka min berdewam e, min ji ber tirsa xwe gelek tişt bi xwe re birin gorê. Paşê min bi gulîyên xwe, xwe bi dar ve kir û bûm lekeyek li enîya mirovahîyê.

şeva xwe pê mendehoş û sermest bike.

Bi destên sibeheke rûreş û bêpar re qêrîn bi asîmana Şengalê ket, ez nizanim ku çawa xezeba xweda ji gulîyên keçên firîşteyên Şengalê re hat!?. Ji wê sibeha bê rûmet ve Melekê Tawûs baskên xwe li ser vî bajarî rakiribûn û bûbû şahidekî bêdeng û xwe di taldeya esmên de veşartibû. Ev roj ne weke ti rojan bû. Ji nişka ve neyaran bi dengê "Elahû Ekber" hêvî di hinavên her gundîyekî de qut kir. Wan neyarên bê rûmet, bi lingên xwe li derîyan dixistin û çi zilam li pêşîya wan dihatin dîtin, dikuştin û jin, keç û zarokên Şengalê ji xwe re dibirin. Wê rojê dîrokê helbesta keçên Êzîdî bi gunehî di guhên cîhanê de olan dida û digot;

"Hurmizgan riman atiran kujan
Wêşan şardewe gerey gewrekan
Zorkar ereb kerdine papû
Ginaw paleyî heta şarezûr
Şin û kenîka we dîl beşîna
Mêrd azar tilî we rûy hiwêna"

Wê sibeha bê xîret, bi sedan keçên Şengalê bi yek solixê xwe bi dar ve kirin da ku nekevin nava destên dijmin. Pirek ji keçikên weke min jî li çolistanên rût û repal ku bi qasî çîlkek av be jî lê tune ye, ketin nav destên wan û niha jî wek pezên qurbanan hefsarê min di dest wan de û ez li vê sûka neyran hatim firotin, peleke spî bi sînga min xistin û li ser nivîsandin (100 Dolar). Hîna ez biçûk bûm, hêvîyên min di xeyalên kêfxweşî û xwendinê de diboriyan. Lîstokên zaroketîya min tenê bûkeke lastîkî û kulmek ax bû. Dema ku neyaran bi gulîyên min ên ku bi axê hûnandî ve girtin, di wê keftelefta qerebalixê de, min ji bilî herdu xwîşkên xwe yên biçûk kes nedît. Min bi destên wan girt û berneda. Wan bi gulîyên min digirtin û ez li pey xwe xuş dikirim, xwîşkên min jî bi min re xuş dibûn. Ji bo ku wan ji min nestînin, min got:

-Ev zarokên min in, ji bo xwedê bihêle ew jî bi min re bin!..

Piştî ku emîrê Daîşê ez û herdu zarokên bi min re, em ji sûka Reqayê kirîn, ew bajarê ku jixwe re kirin paytexta Dewleta Îslamî. Ji wê kêlîka ku em gihiştin wir û şûn ve kirasekî reş û tarî li bejna min e, narînî gerandin. Emîrek ji emîrên Daişê ku ew bi xwe yekî biyanî bû, ez û zarokan li erebeya xwe siwar kirin û ber bi mala xwe ve çû. Piştî ku em gihîştin wê devera ku ez nizam kuder e, zindan bû, dojeh bû, ez nizam a ku tê bîra min em gêrî odeyeke mezin û sar kirin. Li odeya li rex vê odeyê qêrîna bi sedan keçên kurd dihat.

Şev bû. Şeveke bê îman bû. Ez û zarokên jihalketî ku yek li ser lingê min ê rastê paldayî bû û ya din li ser ê çepê. Ji nişka ve du zilamên ku xizmetkarên emîr bûn, hatin bi destên min girtin û ez weke mirîşkan bi erdê ve li pey xwe kaş kirim. Destên min û her du zarokan "Dilyar û Zînê" ji hev qut bûn. Qêrîna zînê û Dilyar li pey min gihîşte erşê xweda, lê mereq nekin xweda wê kêlîyê mirîbû ji ber ku qet tu deng jê nehat û dilê wî bi herdu zarokan neşewitî. Wan herdu zilamên

Gulîyên Darizandî

Evîn Teyfûr

Bi destên sibeheke rûreş û bêpar re qêrîn bi asîmana Şengalê ket, ez nizanim ku çawa xezeba xweda ji gulîyên keçên firîşteyên Şengalê re hat!?.

Werin, werin yek ser yekê re ye. Sipehî û xweşik in. Pir erzan in û bi pereyên hûn dixwzin, dikarin bikirin. Hîn nû ne û nehatine bikaranîn. Werin werin jinên kurd... Werin jinên kurd... werin jinên şengalî yên xwedî gulîyên dirêj û esmer in.

-Ev a gulîreş bi çiqasî ye?.

-Ev a gulîreş tevî her du zarokên pê re bi 100 dolarî ye. Ka bi kêfa xwe binêre mewlayê min, hîn keçên nezewicî jî hene!.

-Mmmm...! Baş e.. baş e. Ez ê zarokan jî bikirim, bila xizmeta me bikin.

-Bila li te pîroz be mewlayê min,

bûye erebîya Daişî, (Eyn El-Islam), sembola dagirkirina welatekî ye ku tu kok û binaşeyeke dagirkeran tê de tune ye, bi guhertina navê wê dixwazin bi darê zorê nîşan û pênaseyeke sexte ji bo xwe li wir çêbikin.

Dara gwîzê wek vebêjeke romanê, sembola şehedeke çendîn salî ye ku di sînga wê de her tişt li ser Kobanê û dîrok û şênîyên wê heye.

Veguherîna rengê çavên Rodîyê vebêjer bi rengê kesk, ku rengê çavên Perwîna hezkirîya wê ye, sembola şînbûna dubare, vejîn, dilovanî û aştîyê ye.

Dema Perwîn li Rojê dinêre, çavên wê mîna ronahîya Rojê zer dibin. Roj bixwe Xwedayê ronahîyê ye û rengê wê jî xweşî, tebat, hêvîdarî û şahîyê temsîl dike.

Bi vî awayî, em dikarin qala sembolên din jî bikin, lê min hewil da qîma xwe bi van çend mînakan bînim, da ku zêde ji vêya dirêjîyê nedim nivîsê.

– Rêbaza xeyal, wehm û guman di romanê de

Xeyal, cîhana hestkirî û hestan e, lê şik û guman girêdayî bi cîhana rasteqîn e. hilêxistina berdewam a vê yekê di romanê de bûye sebeb ku carinan roman ji rewşa Realîte derbasî qada sorealîzmê bibe. Xwînerê romanê bi caran rastî mijarên xeyal, wehm û şik û gumanê tê. kabûs û sehmexewnên Perwînê û mêrikê bihêrs ku di xewê de êrîşî wê dike, jina ku mar û dûpişk ji bisk û kezîyên wê dibarin û berdewam tê nav xewna Perwînê, mêrikê lal ku Perwînê dil heye destê wî di xewnê de bişewitîne, lê dema ku di xewê de wî dibîne ji tirsan zimanê wê tê girêdanê. Ev xeyal û wehmên weke kabûsê bi şik û gumanên aşkere ku şênîyên Kobanê di cîhana rasteqîn de û têkildarî êrîşa Daişê tûşî wan dibin, bi başî di romanê de tên hilêxistin. Mirovên welatekî ku hertim bi xeyalên xweş li jîyanê û hawîrdora xwe nihêrîne, dema ku dibînin cînarên wan her dema ku xwestine çi bobelat û karesat anîne serê wan, xwezayî ye ku xeyal û hestên wan ên baş veguherin şik û gumanên beraqil û piştî vê, haya wan ji derketina dîyardeyên nebixêr ên nata Daişê hebe.

– Kurteyek li ser wergera farisî ya romanê

Wergerandina deq û nivîsên wêjeyî ji ber zimanê dijwar û lihevaliyayî yê bikarhatî di wan de bi caran dijwartir e ji wergerandina nivîsên din, vê yekê jî em dizanin ku di wergerandina nivîsên wêjeyî de, wergêr rastî gelek berbendên çandî û cuxrafyayî û derûnî yên ciyawaz di zimanên Jêwergerandî (jêder) û Lêwergerandî (armanc) de tê. Lewma bi nêrîna min ê xwîner, wergera romana 'Firîna bi baskên şikestî' îdeal û baş e, bi awayekî ku xwîner pê nahese nivîsa li ber destê wî, 'werger' e û ji zimanekî din li farisîyê hatiye wergerandin. Bi nêrîna min, Wergêra romanê, 'Sayîme Xakpûr' di xebata xwe de tam serkeftî ye û ez vê serkeftinê lê pîroz dikim.

Helîm Yûsiv bi rêbaza zindînimandin û Teşxîsê (Personafication), Dara Gwîzê, nebat û gîya û her tiştê ku li Kobanê heye, wisa dide axaftin ku dibê qey ew jî bi qasî şênîyên Kobanê ji hebûna Daişê û sipaha gurên reş nefret dikin. Dara gwîzê bi dîroka Kobanê agahdar e û rastîyên dîroka bajêr vedibêje. Ev dar mîna di kesayetîya helbestvanekê de dîtinên xwe bi rêya afirandinên wêjeyî vedibêje û ev yek kêş û cezebeyeke taybet di çîrokê de diafirîne. Di dawîya çîrokê de, vebêjine nenas jî ji nav goristanê radibin da ku qedera du hunermendên şehîd yanî Hadî û Burhan ji xwîner re ronî bikin. Di beşa dawîyê de dîyar dibe ku Burhan jî evîndarê lehengeke romanê bûye, lê xortên têkoşer ên Kobanê derfetek ji bo raderbirîna evîna xwe tunebû, ji ber ku Daişê ev derfet ji wan standiye. Tiştê pir balkêş ev e ku şênîyên bajêr bixwe jî hemû heta astekê dibin vebêja serpêhatîyan û li ser Kobanê bi îhameke pir watedar bi berçavxistina rola jinan wek dayîkekê, diaxivin:

(Xirecir û qelebalixî)

- Çi bûye?
- "Kobanê diwelide".
- Ev cara yekê ye dibihîzim ku bajarek diwelide.
- Na heyran, jina ku diwelide navê wê Kobanê ye.

– Hin Rêbazên Hunerî Yên Romanê

a- **Ironîzim (Irony):** Ev rêbaz di romana 'Firîna bi baskên şikestî' de bi caran hatiye bikaranîn, çi dema ku Rodî di destpêka romanê de der barê qewimîna bûyereke xerab li Kobanê diaxive, an jî dema ku ew Daişîyan dişibîne kaleqijikên ku ji çend alîyên cîhanê ve hatine û êrîşî ser Kobanê kirine, tu erkeke wan ji bilî xwarina goştê mirovan û wêrankirinê tune ye, çi jî dema ku Perwîn qala kabûsên xwe dike. Çi dema ku dara gwîzê behsa ziwabûna kanîya bajêr û zerbûna şelpeyên daran û şînkatîya derdora bajêr dike, çi jî dema ku kesek bêyî ku bi rastî jeneral be, kincên leşkerî yên bavê xwe li xwe dike û mîdalî û nîşanên şanazîyê bi sînga xwe ve dike; kesê ku hertim bi tolhildanê difikire û şênîyên bajêr jî wî weke Jeneral bi nav dikin.

b- Bikaranîna zimanê pêkenîyê: Helîm di romana xwe de carnan jî zimanê pêkenîn û qerfê bi kar tîne; gava ku jeneralê bêçek û bêleşker xortan hînî meşqa şer û meşa leşkerî dike, an jî çaxê ku Salimê kor bi Kekê re dikeve galegalê û piştî mirina jina xwe, xwe davêje bextê Kekê ku jê re jinekê bibîne, her wiha dema ku Rodîyê evîndar, hezkirîya xwe dibîne û zimanê wî nagere ku tiştekî bibêje.

c- Bikaranîna sembolan û afirandina dîmenan: Di romana Helîm de afirandina sembolan bi çend cureyan e û her yek ji wan xwedan wateyeke taybet e. Weke mînak "Kanîya Spî" ku navê wê di dirêjahîya dîrokê de çend caran ji alîyê dagirkeran ve hatiye guhertin, carekê ji zimanê kurdî bûye erebî, yanî 'Eyn El-Ereb' û cara din ji zimanê erebî

werger

jenerêl û daxwaza wî ya tolhildanê, pirsgirêka Perîwînê û kabûsên ku ew dibîne, pirsgirêka Salimê kor û mirina jina wî û çend pirsgirêkên din ku hemî di çarçoveya bûyer û rûdanên ku diqewimin de, dibin destek û alîkar ku Helîm Yûsiv romanê bi başî bidomîne. Li vir careke din xaleke balkêş heye û ew jî ev e; ku konflîkt di asteke berfireh de li nav romanê tê qalkirin, li kêleka konflîktên kesane yên Rodî û Perwîn ku bixwe hewil didin girêkan vekin, her wiha pirsgirêka Salimê kor ku xwe diavêje bextê Kekê de ji bo çareyekê ji pirsgirêka xwe û yên din li romanê bibîne, konflîkta sereke ya romanê diyarbûna heman pirsgirêka dîrokî û kevn e, lê bi awayekî pir xeternaktir û tirsbartir yanî Daiş yê ku weke girêkekê lihevalîyayî ketiye nava jîyana şênîyên bajêr; lewma xelk hemû ketine tevgerê ku bi hev re vê girêkê vekin. Hêjayî gotinê ye ku girêklêdan di romana Helîm Yûsiv de hêdî hêdî mezin û mezintir dibe; bi awayekî ku mirov difikire ev girêk her çend di cihekî romanê de dê vebibin û dawî lê were, lê weke ku lehengeke romanê (Vîyan Amara) dibêje; bi zûbûnê dê neyên vekirin.

– Vegotina Romanê

Di romana Firîna bi baskên şikestî de ravekirina serpêhatîyan dikeve ser milê çend vebêjeran de (Multî narratative); kesayetên ku hemû bi zimanê xwe diaxivin û ji xwîner re qala serpêhatîyan dikin. Di rastîyê de, tu kese ji derveyî çîrokê serdestîya xwe li ser bûyeran û pêvajoya serpêhatîyan tune ye, ji bilî kesên ku bixwe di nava bûyeran de ne. Ya balkêş ew e ku ev sê vebêjer, hemû yan ji malbatekê ne, an jî li kêleka hev in. Helîm Yûsiv bi vê rêbazê dide dû du armancan: Ji alîyekî ve, xwe ji gotinên bêserûber ku pêvajoyeke normal di hin romanan de ye, rizgar dike, û hevgirtin û pevgirêdaneke dilîn dide ravekirin; ji alîyê din ve, bi vê cureya vegotinê dibê qey ravekirina bûyeran şibihandîye qada cengê; cenga ku biryargeha fermandetî û operasîyona wê xaleke taybet e, ev rewş jî jixwe hêzeke ji têkoşîna gelê Kobanê li dijî Daişê ye. Vegotina Romanê dikeve stûyê Cîhan û Rodî ku xwişk û bira ne, her wiha dara Gwîzê ya li hewşa mala Perwînê, keçika ku di dawîya romanê de bi Rodî re dizewice, lê piştî bîst rojan ji daweta wan, hovên Daişê di reşatîya şevê de êrîşê dibin ser wan û tevî bi dehan kesên din, ew her du jî di nav xwîna xwe de digevizin û şehîd dikevin. Tiştê ku hêja ye ez li ser rêbaza baş a ravekirinê bibêjim, ev e: Di dawîyê de, her sê vebêjer rola xwe didin Cîhanê, keçika ku di halê hînbûn û veguhestina hîndekarîyên xwe de ye, keçika ku zindî dimîne da ku çîroka trajîk a Kobanê vebêje. Rola Jinan ne tenê di vegotina kesayetîya vebêjer a sereke anku Cîhanê de berbiçav dibe, belkî li seranserî romanê rola keç û jinan di têkoşîn û beşdarîya di çalakîyên civakî de gelekî berbiçav e. Babeta din ev e ku, li kêleka Rodî û Cîhanê, pîredarek jî vegotina serpêhatîyan digire ser xwe.

nivîsandina senaryoya fîlmekî amade bikin, ne tenê ji bo Kobanê, lê belê ji bo pêwendîya digel cîhana hunerê de; Lê çimkî li welatê Helîm Yûsiv, derfeteke hunerê heye ku tenê ji bo hunerê bijî? Huner di vî welatî de biêş û renc e, koçberkirina bi darê zorê, berxwedana li hemberî destdirêjkerên wekî çeteyên Daişê, zindan û awaretî, derbiderî, bêmalî, revendî û hezar û yek birînên din ên bêderman hatiye dagirtin; birînên ku carinan hunerê ber bi xwekujîyê ve didin. Hema wisa ku di destpêka romanê de, nivîskar vê rastîyê bi xwekujîya stranbêjê ji bajarê Hadî û Burhên radixe ber çavan. Mirina wî hunermendî sembola mirina hunerê ye, hunera ku Daişî gihîştin her derê, destpêkê ew û sembolên wê rûxandin û ji nav birin. Rabûna ji nav goran ji bo kirina xebateke hunerî ku biryar e serpêhatîya tehl a miletekî bike fîlm û senaryo, nîşaneyeke gelek berbiçav e ku mijara nîşanenasîna 'Ferdinand de Saussure' (zimannasê ji Swîsreyê) û 'Roland Barthes' (rexnegirê Fransî) di warê wêje û hunerê de destnîşan dike; ev rabûna ji gorê ji bo vejandina mijarekê di çarçoveya şêweyekî hunerî de dikare gelek mînakan temsîl bike. Ji wan yek ev e, tiştê ku mayînde dibe huner e, bi gotineke din ew ê ku mayînde dibe, ew e yê ku bi şêwazekî hunermendane canê xwe kiriye gorîyê gelê xwe, ya din jî ev e ku mirin ne dawîya her tiştî ye, weke ku payizeke bi biharekê avis be. Rabûna ji gorê di romana Helîm Yûsiv de, vejandina hêvî û mirazên gelekî ye, bawerîya wî bi rasteqîn, rewabûna mafên wî û serkeftina wî, heye.

Destpêkirineke wiha ji bo romaneke ku trajedîya herî xembar a cîhanê di nava xwe de dihewîne, destpêkeke ku xwîneran di asta herî jor de bi şîyana romanivîs dide hesandin û wiha dike ku ji rêbaza wî ya afrîner û hunermendane re bibêje: Aferîn.

– Konflîkta Romanê

Em Konflîkta an jî milmilaneya romanê ji zimanê vebêja mayînde ya romanê, anî ji zimanê cîhanê dibihîzin. Balkêş e heke ez bibêjim ku vê konflîktê zemîneyeke dirêj û dîrokî heye, lê carinan bi şikl û rengekî nû li nava mirovên ku di dirêjahîya dîrokê de bêpar mane, dîyar dibe û pirsgirêkan çêdike. Vê carê, wisa ku 'Cîhan' dibêje, ev girêk û konflîkt, an jî ev pirsgirêka kevn a dîrokê bi dîyardeyeke bi navê Daişê, çend qatan hovtir û tirsnaktir, yaxeya mirovna digire ku tu wextî li ser axa xwe xwedîyê mala xwe nebûne û hertim ji bo vî mafê xwe yê rewa şer kirine. Diyarbûna Daişê û êrîşên wê yên dirindane berîya her tiştî raserî miletê kurd hat û xwîna wî mêt. Di vê navberê de balkêş e, ku kurdan nema bejna xwe li hemberî hovîtîya Daişê tewandin û ew têk birin. Konflîkta sereke ya romanê di qonaxa yekem de hema ev pirsgirêka kevn û dîrokî ye ku aniha bi reng û rûyê Daişê, zat û cewherê xwe yê sereke nîşan dide.

Tevî ku li kêleka vê konflîktê, konflîktên normal ên çandî û jîyana kurdî jî tên hilêxistin, wek mînak evîna Rodî û Perwînê, pirsgirêka

■ **Şîroveyek Der Barê Wergera Farisî Ya «Firîna Bi Baskên Şikestî» De**

dûr amajeyê bi hemû hevzimanên Helîm Yûsiv dike ku yek bi yekê wan pişk û pareke xwe di beşa pêkvedana sembolîk û wênekî ya 'Firîna bi baskên şikestî' da heye.

Nemaze der barê lehengên romana Helîm Yûsiv û fîrîna wan, ev gotina 'Friedrich Nietzsche' hat bîra min ku dibêje: "Kesê ku dixwaze fêr bibe ku rojekê bifire, divê fêr bibe ku li ser pîyan raweste, bimeşe, bibeze û bazde û bireqise; bêyî derbaskirina van qonaxan, mirov nikare rasterast dest bi firînê bike."

Bi vî awayî ez navê romanê yanî 'Firîna bi baskên şikestî' di çarçoveya heman vegotina Nietzsche da dinirxînim. Dema ku ez li kesayetên romanê difikirim, hemûyan wiha kir, destpêkê li ser pîyan rawestîyan, piştre bi rê ketin, paşê bezîyan û hilbazdan û dawîya dawîn jî firîyan.

– Destpêka Romanê

Her romanek bi rêbazekî; anku bi teknîkeke ciyawaz û taybet dest pê dike. Hinek ji nuqteyekê dest pê dibin û di dirêjahîya xêzeke rasterast de digihêjin xal û têgeha dawîyê. Tevn û pêkhateya hin romanan weke xelekê ye, yanî ji nuqteyekê dest pê dibin û di dawîyê de digihêjin heman nuqteyê. Destpêka hin romanan nişkêvayî ye, wekî teqîna volkanekê bi rûdaneke serhejîner û diltezîn dest pê dibin. Ev taybetmendî hemû di romana Firîn bi baskên şikestî de tên dîtin, lê ez bixwe navekî ji destpêkirina vê romanê re datînim: Destpêkirineke weke aşîtê ye; aşîta ku berdewam bi ser naveroka romanê û lehengên wê de dihêwire û tê xwarê û wan dike bin xwe; ji alîyekî ve ji nişka ve berjêr dibe û ji alîyê din ve top û gilorkên wê bi dirêjahîya xêzeke bêdawî didomin û serê dawî û li pey hev li heman rûdana diltezîn a yekem vedigerin. Balkêş e ku xala destpêkê hema bibêje ji bo hemû lehengên romanê bi vegereke yeksan û wekhev dixitime, çi yên ku şehîd dibin û careke din dibin bînerê têkoşîna rêhevalên xwe; çi jî yên ku zindî dimînin û hevparên şehîdbûna şehîdên xwe ne. Weke ku Helîm Yûsiv dibêje, "Zindîyan li ber kamerayê qala xwe û mirîyên xwe dikirin." Ev hevok nîşana pêkvegirêdana mirina mirovan û hunera wan e.

Hadîyê fîlmçêker û dostê wî yê senaryonivîs yanî Burhan ji gorên xwe radibin da ku projeya çêkirin û

Şîroveyek Der Barê Wergera Farisî Ya "Firîna Bi Baskên Şikestî" De

Ezîz Nêmetî
Wergera ji farisî:
Berat Qewîendam

wergera romana ‹Firîna bi baskên şikestî› îdeal û baş e, bi awayekî ku xwîner pê nahese nivîsa li ber destê wî, ‹werger› e û ji zimanekî din li farisîyê hatiye wergerandin

werger

Navê Romanê:

Ez ê destpêkê balê bikişînim ser navê romanê. Dema ez li navê Romanê fikirîm, ev pirs di mejîyê min de geriya: Mirov çawa dikare bi baskine şikestî bifire? Bi rastî wateya Firînê di romana Helîm Yûsiv de çi ye? Lê dema ez gihîştim dawîya romanê, careke din li navê romanê vegerîyam û gihîştim vê bawerîyê ku Helîm Yûsiv bi bijartina navê 'Firîna bi baskên şikestî' dîmeneke îhambar û pirwate afirandiye, dîmena ku pêwîstîya wê bi şîrove û lêhûrbûnê heye; Şîroveyeke Nêzîk û Şîroveyeke Dûr. Şîroveya nêzîk amaje bi şênîyên bajarekî dike ku piranîya wan şehîd bûne yan jî dane ser rêkoçeke şehîdane, Şîroveya



■ **Tabloya Rewşen şêxo**

dîsa xanî kerr û bêdeng bû, Lemya dîsa vegeriya ser text û xwe pal da, piştî bîskekê rabû çira vêxist, li pêşîya awêneyê sekinî, baş li rûyê xwe nerî, girnijî û çira vemirand, li ser têxt xwe dirêj kir û radestî xeweke kûr bû. Rûyê wê wisa di wê girnijînê de ma.

Di wan kêlîyan de Mistefayê Şamî li pêşîya dadgerkî rûken sekinî bû, rûyê wî qermiçî, temenê wî hezar sal bû. Tawana Mistefa ya revînê jê re got, Mistefa nizanîbû çi bersivê bide, tenê got gorr cihekî ji bo mirovan nabe. Yê dadger bi dilxweşî kenîya û biryara dadgehê der heqê wî de ragihand.

Zilamên cilspî xwe avêtin Mistefa û ew birin erdeke kesk û berfireh. Li wir jê re hate gotin ku wê di avakirina koşk û qesran de bixebite, peyvek tenê jî ji devê wî derneket û nekir qîrîn û hawar, lêbelê li dora xwe zîvirî mîna lawirekî ku dema derîyê qefesê ji kel lê tê girtin, çavên wî mîna du zarokên serjêkirî bûn.

Di wê kêlîyê de, erdeke hişk û erdeke şîn, ku tenê asîmaneke çêkirî ji cagên polayê hebû.

girîyê wê rawestîya, bi tenê xwe li ser textekî berfireh dirêj kir, xeyal dikir, ku zilamine cilspî hevjînê wê dibirin xakeke fireh û kesk. Hingê xemgînî kevokek bû, cilên şînê li xwe kiribû û bitirs di bin baraneke xurt de difiriya. Xew mîna zarokekî çav xemgîn hat, di dest de guleke reş û straneke ji mexmela germ, lê zingilê derî bi awayekî tûji û berdewam lê diket, Lemya ji xewê şîyar bû. Serê xwe ji ser balîfê rakir, bi baldarî li deng guhdar dikr û çavên xwe bi tilîyên xwe difirkandin, hîna zingezinga zingilê derî berdewam bû, bi dengekî veziliyayî di bin bandora bawişkan de got: Kî ye?.

Dengekî zivir û naskirî hat û bi fermanî got: Veke!.

Ji ser textê xwe rabû, pêxwas bazda, hewşa malê ya ku bi ronahîya heyvê tije bûbû, derbas kir, bilez ber bi derî ve çû, bi tevgereke lezgîn û meraqdar vekir, dît ku hevjînê wê mîna dareke bê çiqul sekiniye û bi kefenê spî pêçayî ye.

Mistefayê Şamî bilez derbasî hindir bû û ji Lemyayê re got: Derî baş kilîd bike ji ber van rojan diz pir bûne.

Lemya bi ya wî kir, derî baş girt û da pey Mistefayê ku derbasî odeya xewê bû.

Mistefa xwe li ser text dirêj dike, Mistefa bi dengekî westîyayî ji Lemyayê re dibêje: Çirayê vênexe. Kêlîyekê Mistefa bêdeng dibe, ji Lemya dipirse: Tu razayî bûyî?

Deng ji Lemya nayê, xwe li kêleka Mistefa dirêj kir, hilkehilk pê ketibû. Mistefa xwe pê ve dizeliqîne û bi nazkî jê re dibêje: Min germ bike.

Dengê Mistefa tê guhertin, kêfxweşîya xwe winda dike, dengê wî vediguhere dengekî lerzok û bitirs: Min nikarîbû li wir binivim.

Lemya di ber xwe de dike minmin, lê devê wê di wê kêlîyê de mîna kevirekî qayim bû, Mistefa diaxive, dengê wî balindeyekî reş û bi herî ye: Ez bextewer im ku goristan ji malê ve nêzîk e, û di hatina xwe de ez rastî ti dewrîyên polîsan nehatim.

Çiqas dilê min bi wan dişewite, ew kesên ku di goristanine dûrî malên xwe de tên veşartin, lewre neçar dimînin ku di gorên xwe de binivin.

Dengê Mistefa hin bi hin kêm dibe û piştî bîskekê winda dibe, Lemya ya çavên wê vekirî û zîq li zikê xênî dinêrî, bi tenê dihêle.

Dema ku derî bi xurtî lê ket, ji nişka ve tirseke mezin xwe berda nava awirên wê, xwe dît ku bi lez ber bi derî ve diçe, bi dudilî vedike, du polîsên cilên wan spî sekinî bûn, yekî ji wan got: Kanî hevjînê te Mistefayê Şamî? Çima te hişt binive û vegere? Tu nizanî ku ev kiryara te li dijî zagonê ye?

Herdu polîs derbasî malê bûn, yekser berê xwe dane odeyê, bi hêrs û acizî derbas bûn, dema çavên wan li Mistefa ket gotinên xerab û sixêf jê re dan. Bi tirs hişiyar bû, girîya û hawar kir, lê herdu zilaman guh nedanê de, ew ji text daxistin û rakirin mîna parçeyek dar, ji malê derketin û dengê girîyê Mistefa di bêdengîya şevê de, tûjtir û bilindtir dibû.

Bi derbasbûna çend kêlîyan re

Zindan

Zekerîya Tamir
Wergera ji erebî: Aram Hesen

Gorr cihekî ji bo mirovan nabe. Yê dadger bi dilxweşî kenîya û biryara dadgehê der heqê wî de ragihand..





werger

Mistefayê Şamî ji lawik, stêrk û gîyayê kesk hez dikir, lê belê ji avakirina xanîyan westîyaye, piştî kêlîyekê wê çavên wî bêne girtin, mirin guleke ji berfê ye, di damarên wî de veşartiye, vaye sibeha wê hatiye.

Bi kêfxweşî girnijî dema hate bîra ku xanîyên avakirine wê bi mirina wî re birûxin û bibin kavil. Bilez bazda û kete nava kolanine zer de, bi dengekekî tije hêrs, xem û qehir bang li bayê dikir. Bi vî awayî dûrî xanî, lawik û gîyayê kesk çû, piştî çend demjimêran di goristaneke bi xanîyan dorpêçkirî de, hate binaxkirin. Hevjîna wî Lemya pir girîya, lê bi hatina tarîtîya şevê re

Navê pirtûkê: Gotinên Pêşiyan û Nifirên Kurdan

Nivîskar: Occo Mahabad

Naverok: Ferheng -folklor

Pirtûk, xebata sêsalî ya birêz Occo Mahabad e. Tê de bi hezaran gotinên pêşîyan û nifirên Kurdan hene. Pirtûk ji bo zargotina me ya Kurdan gencîneyeke dewlemend e, û ji hemû parçeyên Kurdistanê gotinên pêşiyan û nifirên Kurdan dihewîne.

Nivîskar hewl daye ku li gor nivîs û gramera îroyîn binivîse da ku bê zehmetî ji alîyê her Kurdekî ve were xwendin û fêmkirin.

Hejmara rûpelan: 244

Cih û dîroka weşandinê: Weşanxaneya JJ/



Navê Pirtûkê: Tefsîra Teremaxî

Nivîskar: Mele Elîyê Teremaxî

Naverok: Ziman

Ev berhema hêja berîya 400 salan ji alîyê zimannasê kurd Mele Elîyê Teremaxî ve hatiye nivîsandin. Pirtûk wekî yekemîn gramera kurdî ya kurmancî tê binavkirin. Ev berhema qaîdeyên gramera erebî digel farisî destnîşan dike, paşê jî kurmancî dide ber wan.

Hêjayî gotinê ye ku beriya niha pirtûka Mele Mehmûdê Bazîdî ya qaîdeyên ziman ji weşanên Weqfa Mezopotamyayê derketibû.

Her çend yekemîn rêzimana kurmancî, ya Elî Teremaxî (1590) be jî, lê wisa xuya ye cara pêşîn xebata ku tenê ji bo rêzimana kurmancî û bi zimanê kurmancî hatiye kirin, xebata Bazîdî ya hêja ye.

Cih û dîroka weşandinê: Weşanxaneya Nûbiharê /2020



Navê Pirtûkê: Pêjna Baranê
Nivîskar: Kamran Simo Hedilî
Naverok: Roman

Nivîskar Kamran Simo Hedilî bi romana xwe ya Pejna Barane berê xwîneran dide rabirduya Zîro yan jî Serdar. Her çiqas roman serpêhatîya mirovekî bixuyê jî di heman demê de behsa alîyên balkêş ên serdemeke gelek girîng dike. Ku hê jî ev serdem bi awayê xwe yê herî dijwar tê jîyîn. Têkosîn, evînî, dildarî, hevalbendî... Yanî jiyan bi xwe hatiye pênasekirin bi zimanekî helbestî...

Hejmara rûpelan: 170

Cih û dîroka weşandinê: Weşanxaneya JJ/ 2018

Navê Pirtûkê: Welatê Min
Nivîskar: Medya Yaklav
Naverok: helbest

Jinên Kurd çawa di şoreşa Kurdistanê de cihê xwe girtibe, rengê xwe dabe û dengê xwe tevlî awaza şoreşê kiribe di warê wêjeyê de jî ristek girîng lîstiye. Her çiqas berhemên tên xwestin heta niha kêm mabe jî, em dikarin deng û rengên wan di vê dîlana awazê de bibihîzin. Yek ji van jinan jî jina têkoşer Medya Yaklav e, ku ji ber raman û têkoşîna xwe hatiye girtin û ji ber cezayê mûebetê ev 27 sal e girtî ye.

Nivîskar di helbestên xwe de balê dikêşe li ser êşên gelê Kurd, hesret, hêvî û qîrîna azadîyê û xwestiye bi hest û çavên ferdeke ji vî gelê ku welatê wê bûye çar parçe, lê tevî her tiştî li ber xwe dide û têdikoşe, bê jîyan bi çi rengî dikare xwe di helbestê de bihûne bîne ziman.

Di pirtûkê de 91 helbest hene û ev helbest di qonax û dîrokên cuda de, her wiha li girtîgehên bajarên cuda yên li Kurdistan û Tirkîyeyê hatine nivîsandin.

Cih û dîroka weşandinê: Weşanxaneya Aram / 2020

Navê pirtûkê: Analîzek li ser Rojnameya Kurdistanê 1898-1902

Nivîskar: Ahmed Kanî

Naverok: Lêkolîn

Kurdistan yekem rojnameya kurdî ye, cara pêşîn di 22ê nîsana 1898an de li Qahîreyê derketiye. Xwedî û berpirsyarê pêşîn Miqdad Midhet Bedirxan e, piştre birayê wî Ebdurehman Bedirxan dibe berpirsyar. Li sê welatên cihê, Misir, Îngilistan û Swîsreyê, li ser hev 31 hejmarên wê derketine. Rojname bi du zimanên sereke; kurdî û Tirkîya Osmanî derketiye. Her çendî li derveyî welat derdiket Jî, lê li nava welêt jî dihate belav kirin. Birêveberên Osmanîyan ew qedexe dikir û nedihêlan ku li Kurdistanê belav bibe.

Ev xebata Ahmed Kanî teza wî ya lîsansa bilind e, li Zanîngeha Artuklu-Mêrdînê. Nivîskar bi hûrgilî yek bi yek li ser naveroka rojnameya Kurdistanê xebitîye, analîzeke têr û tijî kirîye.

Cih û dîroka weşandinê: Weşanxaneya Apec- Swêd / 2019

Navê Pirtûkê: Şengal

Nivîskar: Mehsûm Bagok

Naverok: Lêkolîn

Ev pirtûk li ser Şengalê hatiye û bi taybetî li ser fermana 73an (3 Tebaxa 2014an hatiye niv'sandin. Di naveroka wê de pir mijar hene.. erdnîgarî, çanda resen, berxwedan, serkeftin û hêvîyên azadîyê di nava hev de hatine bidestgirtin.

Hijmara Rûpelan: 206

Cih û dîroka weşandinê: Weşanxaneya Akademîya şehîd Asya Yûksel û Abid Xelîl a civaka demokratîk/ 2020



Navê pirtûkê: Gotinên Pêşiyan
Nivîskar: Mehmet Oncu
Naverok: Ferheng

Ev berhem, ferhenga herî mezin û berfireh a gotinên pêşîyan e. 50 hezar gotinên pêşîyan di vê berhemê de cih digirin. Ji vana nêzî 30 hezar gotin, ji hêla nivîskar (berhevkar) ve ji qadê hatine berhevkirin. Berhem ji 4 cildan pêk tê. Her cildek di navbera 1214 û 1248 rûpelan de ye.

Bi giştî ji 235 beşan pêk tê. Mînak: Gotinên pêşîyan ên li ser jinan, gotinên pêşîyan ên li ser mêrxasîyê, gotinên pêşîyan ên qencî û xerabîyê û... hwd.

Di vê berhemê de zêdetirî 2 hezar çîrokên gotinên pêşîyan hene. Her wiha zêdetirî 4 hezar peyvên ku zêde nayên zanîn an jî di ferhengan de cih nagirin bi dîpnotan hatine şîrovekirin.

Cih û dîroka weşandinê: Weşanxaneya Sîtav / 2020



Navê pirtûkê: Serhatiyên Mela Nesreddîn
Nivîskar: Berhevkirin û amadekirin: Ismet Yalvaç
Naverok: serpêhatî

Ev pirtûk hejmarek ji çîrok û serpêhatên melayê zana û navdar Nesreddîn digre nava xwe. Armanca ji komkirin û nivîsina wan ne tenê ji bo ku xwîner demeke xweş û komedî derbas bike, her çîrokek wekî gotineke pêşîyan an amerêk ê axaftinê li ser rewşa jîyana civakî ye, lema ji her bûyer û çîrokeke vê pirtûkê mirov dikare ders û pendekê derêxe.

Hejmara Rûpelan: 150

Cih û dîroka weşandinê: Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ 2019

Pirtûkên derketî

Navê Pirtûkê: Kobanî Çepera Rûmetê- beşa 1ê
Nivîskar: Meryem Kobanî
Naverok: Bîranîn

Li ser şerê Kobanê pir hatiye nivîsîn û gelek film hatine çêkirin. Lê pirtûka ku Meryem li ser serpêhatîyên xwe nivîsîye taybet e. Ew ne tenê şahida ji roja destpêkê ve bû û di hemû bûyeran de bû, lê fermandara hêzên şervanên Kurdî bû jî.

Di pirtûkê de detayên ku heta niha kesî nebihîstine nivîsîne. Mînak di dema destpêkê de bi tena xwe û bê alîkarî di enîya şer de bi derfetên kêm û kêmasîya çekan li hemberî Daişê ku çekên modern û xwedî derfetên mezin bûn şer didomandin. Daiş ew çekên modern di dema girtina Mûsilê de ji leşkerên Iraqê bi dest xistibûn. Çawa bi keleşinkofekê li hemberî tankan şer bikî? Çawa di alîyê moral de şervanên xwe li hemberî dijmin mobîlîze bikî? Ev Pirtûk bersivên van pirsan dide. Ji alîyekî din ve Meryem dide xuyakirin ku bîra/ hişmendîya wê qewîn e. Axaftinên wê bi gel re, bi şervanan re, wisa zindî ne weke ku berîya rojekê bin.

Ev Pirtûka di warê dîrok û kultûra Kurdistanê de jî agahdarîyên girîng dide. Mijarên azadîyê, dadê, namûs, peywîr (wezîfe), lêborîn û hêvîyan dinivîse. dîrokê zelal û xweş şîrove dike ku li Kobanê hatiye nivîsîn.

Cih û dîroka weşandinê: Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ 2020

Bûyer û hizirên wê bi awayekî zelal û bi hûrgilî hatine şayesandin. Tevî ku romaneke kurt bû, lê hemû hêmanên romanê tê de bi temamî peyda dibin û kurtîya wê ji aşta wê kêm nekiriye û ti qelsî neketinê. Berevajî bi vî şêwazî rê ji her xwînerî re vebûye ku bê acizî bixwîne, heya "xwînerên bêsebir" jî.

Roman bi sembolan dagirtî ye, zêdetir ber bi surrealistê ve diçe; me derbasî jiyana qaqlîbazan dike, qaqlîbazan wek mirovan dide hizirandin û gera li azadîyê dide pêşîya wan. Gelek tiştên fantazî derdixe holê û qaqlîbazan ji cihekî ber bi cihekî din ve di heman kêlîyê de bê ti tevgerê vediguhezîne. Lê çiqas roman surrealism xuya bike, a raşt mirov bibêje sembolism e. Ji ber felsefeyeke hebûnê tê de rû dide û baweriya gelek mirovan bi wê felsefeyê tê, ji nav wan jî Bach ê ku ev bawerî bi awayekî sembolîk di romanê de raxistine.

Tevî ku guhertinên bingehîn bi Jonathan re ji alîyê derûnî ve çênebûne û tenê rewşa wî weke pêşketin hatiye guhertin, lê guhertina Fletcher ya derûnî û awayê hizirîna wî bandorê zêdetir li xwîneran dike û romanê xweştir dike. Rexnegir Îbrahîm Seydo Aydogan dibêje: "Êdî romanên hemdem ji bûyeran bêhtir li ser guherînan disekinin".(16) Li gor romaneke di sala 1970'î de hatibe nivîsandin, hêmaneke wisa tê de peyda bibe, serkeftineke mezin e.

Di romanê de nivîskar bi xurtî parastina lehengê xwe kiriye û ti mesafe di navbera vebêjer û leheng de nehatiye dîtin. Lê ji ber ku roman ber bi surrealistê ve diçe û armanca wê zêdetir gihaştin 'Kamilbûn' e, ev tişt hatiye nixumandin û beloq nehatiye dîtin, berevajî weke rewa hatiye dîtin.

Bach qaqlîbaz bi awayekî serkeftî şayesandine, jîyana wan bi me daye naskirin û ew dane axaftin. Di herikîna romanê de mirov dibêje qey hêzeke derxwezayî hîştiye em zimanê qaqlîbazan fêm bikin û hest bikin ku vebêjer bixwe qaqlîbazeke û çîroka qaqlîbazekî ji me re radigihîne.

Roman ji alîyê Osman Özçelik ve hatiye wergerandin ji bo kurdî. Hem ji ber ku ji sala 1995'an de hatiye wergerandin, gelek şaşîyên rastnivîsê derdikevin holê ku em dizanin wê demê hîn rastnivîsa kurmancî baş nehatibû rûniştandin, hem jî ji ber ji zimanê tirkî ku ne zimanê romanê yê bingehîn e (a kurdî wergera wergerê ye); gelek qelsîyên wergerê derketine holê. Lê tevî van hemû qelsîyan jî bi alîkarîya xezîneya peyvên Özçelik re wateya romanê hatiye parastin û bi awayekî pir xweş diherike ku mirov naxwaze ji ser xwendina wê rabe, beriya ku dawîya wê bi destê xwe bixe. Lê helbet heger careke din ji zimanê wê yê bingehîn were wergerandin, nemaze piştî zelalbûna rastnivîsa kurdî heya astekê, wê xweştir were xwendin û zêdetir mirov ber xwe ve bikişîne. Romana "Qaqlîbaz Jonathan Livingston" hêvîyên mezin di hundirê xwînerên xwe de ava dike.

16- Aydogan,Îbrahîm(2014).Guman2,Stenbol,r.312

dixwaze bibêje ku kesên baş, ji ber ku dixwazin baş bin, ne kesên derasayî ne. Bila mirov bi vê hicetê xwe nexapîne û sînorekî di navbera xwe û kesên baş de çêneke. Wek pêxember Îsa silavên xwedê lê ku dibêjin ew lawê xwedê ye û bi rêya vê yekê negengazîya wek-wî-bûyîn rewa dikin.

Vegotin û herikîn.

"Destê' sibehê bû. (...) Dengvedana şikevê ya di avê de, ji bo qaqlîbazan gazî ya "taştê" bû. Wê gavê, bi hezaran qaqlîbaz bi qîjewîj û bi lez bi hewa ketin. Rojek nû dest pê kiribû, rojek tijî xebat û lebat.

Taa wê de, pir dûrî deravê bahrê û dûrî şikeva masîvan qaqlîbaza "Jonathan Livingston", bi serê xwe ceribandinên firînê dikir. Ji rûyê bahrê bi sîh mîtroyî bilind, lingê xwe berjêr, nukilên xwe berjor kir. Ji bo fitilokek bervaja êş da parxwanê xwe û baskên xwe vekêşand. Ku bikaribe di vê de biserkeve, wê bikaribe ji berê zehftir hêdi bifire. (...)"(15)

Destpêkê nivîskar bi şayesandineke giştî dest bi çîrokê kiriye. Derav û qaqlîbazan û jîyana wan a rojane dişayesîne. Ji nişka ve berê xwe dide cihekî hinekî dûr ji deravê û şayesa rewşeke awerte dike! Ne weke dîmena giştî ya destpêkê bû. Li vir nivîskar bi girêkekê dest pê kiriye û ji destpêkê de teşwîq bi xwînerên xwe re çêkiriye, nemaze dema pirsan di aqilê xwîner de çêdike. Gelo 'Jonathan Livingston' kî ye? Çi çîroka wî ye? Hewl dide çi bike? Çima ji derdorên xwe cuda ye?

Vebêjer herdem çîrokê di çavên Jonathan de ji me re dibêje. Tiştên ku Jonathan nas dike bi xwîneran jî dide naskirin. Vebêjer tiştekî ji Jonathan zêdetir nizane û ji xwîneran re ranagihîne.

Lê vebêjer ji Jonathan cuda bû, dengekî derveyîn bû ku her tişt der barê Jonathan dizanî û ji xwîneran re vedigot, hemû şayes û şîrove ji Jonathan werdigirt; bi gotineke din hizirên Jonathan dixwendin û bi dengê xwe ji xwîneran re werdigerande gotineke derveyîn. Nivîskar ji bo naskirina kesayetan her xwe nêzî Jonathan kiriye, lê hin caran jî berê xwe daye Fletcher û alîkarî jê xwestiye ji bo zêdetir derûnîya Jonathan bi xwîneran bide naskirin, nemaze di dawîya beşa sêyem de ku Fletcher bi dengê xwe yê taybet alîkarîya vebêjer kiriye. Yanî di çend kêlîyên dawîyê de û bi xatirxwestina Jonathan re di nav herikandinê de vebêjer û şêwazê wî diguhere û vê carê di nêrîna Fletcher de çîrokê vediguhezîne xwîneran.

Roman ji alîyê teknîkî ve bi awayekî sade, zincîrîn û herikbar hatiye nivîsîn. Herikandina wê ji destpêkê heya dawîyê li ser ritimekê meşyaye bê ku lezbûn û derengmayîn di ti paragrafên wê de rû bide. Yanî mirov nikare dest tê werde û ti hevokan kêm an zêde bike.

14- Heman jêder,r.73
15- Heman jêder,r.11

têkilîya wê bi mijara me re, me xweşt çend bendan jê bigirin:

"mende sigar îkî cîhan men bû cîhana sigmazam

gewherî lamekan men im kewn û mekana sigmazam

cism île can men im welî, cism île cane sigmazam."(11)

Şîrove:

Di min de du cîhan bi cih dibin, ez di vê cîhanê de bi cih nabim

Ez gewherê necihbûnê me, di gerdûn û cih de bi cih nabim

beden û can di min de bi teşe dibin, di beden û can de bi cih nabim.

"Li gor Chiang, yek rêgeza vî karî hebû. Divêt kû xwe bi çavê qaqlîbazek kû xwedî rêgeha bi tixûb û xwedî qasî mîtrok bask nebîne. Rêgeza vî karî; têgihîştina bîra jîyanek gihîştî ya bênav ya hebûna xwe bi xwe ye. Di gerdûnê de, li her cîh û li derî demê."(12)

Dema mirov li helbesta Nesîmî û van hevokên ji romanê dinêre, dibîne ku felsefeya Richard Bach pê bawer dike û felsefeya nesîmî heman ramanan radikin. Ew felsefeya ku napejrîne mirov di laşekî, cihekî an jî demekê de sînordar bibe.

Sullîvan:"Tu di nava bi milyonan qaqlîbaz de yeka bijarte ye. Piranîya me bi hezaran dijwarîyên mezin gihîştine vir. Em ji dinyakê derbasî dinyake din ku dişibihe dinya me bûn. Tew di ser de me hay jê nîne ku em ji ku hatine û em li ku ne. Û em rojane jîyan. Ji ziktêrkirinê, ji pevçûnê û di nava ref de daxuyana xurtîyê hêjatirên girîng hebûn. Ji bo gihîştina vê bîrê, gelo em di çend jîyanan de derbasbûn? Bi hezaran Jon, bi hezaran!... Û paşê, ji bo sehkirina gihîştinê belkî em di yek, belkî jî di sed dinyan de derbas bûn. Û di ewqas dinyên din de jî em hînî gihîştîbûnê bûn ku ew armanca jîyanê bû."(13)

Hizireke din di nava romanê de bi xurtî derbas dibe, ew jî derbasbûna gîyanê ji jîyanekê ber bi jîyaneke din ve, ango mayîndebûna giyanê. Li vir jî felsefeya ku Bach pê bawer dike dîsa derdikeve pêş. Her wiha felsefeya 'di jîyanekê de gelek jiyan borandin' ya ku wek rewşeke awerte tê dîtin, bi rêya lehengê me derdikeve pêş, ew jî bi rêya xwenaskirin, li ser xwe zêde xebitandin û li hestên xwe guhdarkirinê pêk tê. Mirov dikare bibîne ku nameya Bach di vir de jî, ew e ku bi xebatê mirov dikare hemû sînoran bişkêne û tiştekî derasayî namîne.

Jonthan: "Nehêlin min bi xwedêtîyê nasbikin. Mecalê nedê ku navê min bi şorên bêhişî miqeddes belav bibe. Te soz da min Fletch? Ez qaqlîbazekim. Heye ku... ez ji firînê hez dikim."(14)

Jonathan heyîneke normal e, ne xwedê ye û ne jî lawê xwedê ye. Bach

11-http://www.bizturkmeniz.com/ar/index.php?page=article&id=103665

12- Bach,Richard.Wer:Özçelik,Osman(1994).Qaqlîbaz Jonathan Livingston. Weşanên Firat,r.41

13- Heman jêder,r.37,38

Tirs, hêrs û bêzarî sedemên kurtbûna jîyana mirovan in. Li vir mirov bala xwe dide vê yekê ku nivîskar ji hizira qaqlîbazan derketiye û tam hizirên mirovan nîşan daye. Bi vê yekê re mirov dikare bibêje ku nivîskar mirov bi qaqlîbazan sembolîze kirine.

Felsefeya hebûnê.

Fletcher: "Fikrên wan ne xema min e! Firîn çawa dibe ez ê pêşî wan bikim! Ku dixwazin, ez ê ji binî de derkevim dervî qanûnê. Û ez ê wan poşman bikim!.."(7) "Ya rastî ez fehm nakim, tu çawa dikare ji refekî harbûyî ku qasî gavek berê li dû kuştina te bû hez bike." (8)

Jonathan:"Fletcher a reben! ji çav dîtina xwe bawer ne be, dîtinên te, yên bi tixûbin. Bi haybûnê binhêre. Bixebite ku tu bighîje bîra hînbûnê. Tu wê bi vî awayî bighê rêya firînê." r.73

Fletcher: "Ma tu sînor tune Jonathan? Naxwe roja ku ez jî wek te hilû bibim nêzîk e. Ku ez li derava te xuyam, ez ê çend teknîkê fîrînê pêşî te bikim."(9)

Ji van xêzan mirov dibîne ku Jonathan nûnertîya hizira îdealîst dike, Fletcher jî nûnertîya hizira realîst dike. Li vir em dibînin ku Bach xwestiye hizira îdealîst derxe pêş û bide xuyakirin ku bi realizmê mirov nagihîje 'Kamil nabe'; ango ji bo têkilîyên bi gîyanê re carinan realîzm têrê nake û divê mirov hinekî bi surrealistî tev bigere. Bi taybet ku di destpêkê de Fletcher xeşîm derxistîye û di dawîyê de ew jî aniye ser rêya mamostayê wî Jonathan.

"Mutesewifan gîyana mirovî wek firindeyekê dîtiye ku ew firinde dîlmayîna di vê cîhana nemayînde de red dike û firîna li bilindahiyan bi hembêzkirina azadîyê hildibijêre."(10)

Mirov dikare di romana Bach de hizirên ku dişibin rêbazê mutesewifan bibîne, ku wî jî bi awayekî sembolîk roman vegotiye. Dema mirov dibîne kesên li ser Rêbazê Sofî dimeşin gelek caran li dor xwe dizîvirin û hebûna xwe weke laşekî di vê jîyanê de ji bîr dikin, ji ber di tevgera zivirîna li dor xwe sivik dibin 'weke firindeyan dibin' û xwe ji wî laşî azad dibînin. Di romanê de jî mirov dibîne ku Chiang û Jonathan di heman kêlîya ku tê de pê dihizirin ji cihekî ber bi cihekî pir dûr ve diçin, bê ku baskên xwe bilivînin. Mirov tê derdixe ku herdu heman hizir in, lê di romanê de bi awayekî surrealist hatiye; pêkanîna xewna Sofiyan bi awayekî fîzîkî ye.

Helbestek Nesîmî heye ku tê de felsefeya wî tê diyakirin û ji ber

7- Heman jêder,r.50
8- Heman jêder,r.71
9- Heman jêder,r.75
10- http://elsada.net/20795/

tevgerên wan ên firînê hene û bi rêya wan tevgeran jî têkildar dibin û ji hev fêm dikin, lê Bach bi zanebûn tenê qaqlîbazên gihaştî wisa nîşan dide û têkilîyên qaqlîbazên din tenê bi qajewajê nîşan dide. Weke bibêje qaqlîbazê li azadîyê negere, qaqlîbazekî ji rastîya xwe derketiye.

Em dizanin ku qaqlîbaz nikarin noqî bin avê bibin û masîyan ji hundirê ava kûr bigirin, weke ku Jonathan dike. Dema ku Bach qala hûrik-mûrikên ku qaqlîbaz li ser xwe têr dikin diaxive, piştre vedigere li ser Jonathanê ku bi masîyên teze ji nava deryayê xwe têr dike diaxive. Dibêje ger mirov di lêgerînê de be, dikare tiştên nûtir û baştir bi dest bixe. Heger mirov raneweste, her li pey pêşketin, vedîtin û di nav lêgerînê de be, wê sînoran bişkîne û astengîyan rûxîne.

Mirov dikare bibîne ku Bach ne bi ecemtîyekê an nezanîyekê, lê bi hostetiyekê ew agahî şaş nîşan dane, angaştên wî yên şaş di derbarê qaqlîbazan de ji qazî ve ji bo gihandina nameyan bûn.

Jonathan; qaqlîbaz an mirov?

Dema ku em dibînin Jonathan rêvebertîya komek qaqlîbazên ji refên xwe hatine qewitandin dike, em dikarin bibînin ku Bach di rêya Jonathan re derbirîna xwe dike. Jonathan rêvebirina hin qaqlîbazan dike ku ji bilî çêja tevgerên pehlîwanî tiştek ji firînê negirtine. Bach jî bi hin mirovan di firokeyê de li ezmanan difire ku ew mirov bi piranî ji bilî ji cihekî ber bi cihekî ve veguheztina bilez ti çêja firînê nabînin. Berevajî Bach; ku xem û xewna wî firîn bû û nivîsandina wî ya vê çîrokê heza wî ya firînê aşkere dide ragihandin. Jixwe Bach bi devê xwe jî dîyar kiribû ku ew çîrok di bingeha xwe de li ser xwe di temenê 20 salîyê de nivîsîbû ku di wê demê de ew nû derbasî cîhana firînê bûbû. Bach hemû ezmûnên xwe bi rêya vê çîrokê bi awayekî sembolîk nivîsandibû.

"Di rojên paşîn de wek qaqlîbazên din jîya. Li rexê bahrê bi qaqlîbazên din re di nava şikevên masîvanan bi qîjewîj, bi dû hûrikên nên, laşê masîyan û qirş û qalan ket. Bi yên din re xwe noqî tiştan kir... şer kir... Belê bi tu awayî hînî vê jîyanê nebû. Fikirî û got: "Bêfêde ye! Min dikarîbû ev rojên vala û bê mane bi hînbûna firînê derbas bikira.". (5)

Weke em dizanin Bach pîlotekî şer bû û piştî demekê dev ji vî karê ne li gor dilê xwe berdabû. Dibe ku ev yek bandor lê kiribe ku şerê qaqlîbazan derxe pêş û hestên Jonathan ên neyînî di derbarê van şeran de nîşan bide. Di vir de mirov dikare ji xwe bipirse jî lehengê romanê Bach an Jonathan e?

"Qaqlîbaza Jonathan, ji zû ve elimîbû ku; Tirs, hêrs û bêzarî vejenên kurtbûna jîyanê ne.(6)

5- Heman jêder,r.13
6- Heman jêder,r.27

in, lê di rastîyê de ew bi gelek qeyd û bendan hatine girêdan û azadîya xwe bi dest nexistine, dîlên gelek tiştên madî ne. Heta hin ji wan rêya azadîya xwe jî nizanin, wek bav û dêya Jonathan û tevahî refê ku jê hatî qewitandin jî. Tenê bi xwarin, nanezik û tiştên madî dihizirin. Em dikarin mînaka wê di van hevokên bavê Jonathan de bibînin: "Bi dengekî nerm bavê wê got: "Li min binêre Jonathan. Zivistan pir ne dûr e. Di nêzîk de wê şikevên masîvanan kêm bibin û masîyên rûyê avê wê xwe berdin kûranîyê. Ku tu dixwaze hînî tiştekî bibe, hînî bi destxistina xwarina xwe bibe. Firîn xweş e, lê belê zikê mirov têr nake. Ji bîr neke, armanca firînê dîtina xwarinê ye.". (3)

Dibe ku Bach çîroka qaqlîbazekî vedibêje, lê zêdetir mirov dikare bibîne ku wî xwestiye rexneyên xwe li ser civakê bi rêya qaqlîbazan veguhezîne. Xwestiye bibêje çawa divê hemû qaqlîbaz azad bin, wiha divê hemû mirov jî azad bin. Lê rêya azadîyê zanebûn e. Yanî em dikarin mirovan jî şûna van qaqlîbazan bibînin.

"Qaqlîbaza Jonathan rojên xwe yên mayî bi serê xwe derbas kir. Ji heremê zinarên asê, ber bi heremên din difirîya û heremên nû kifş dikir. Xemgîn bû. Belê çavkanîya xemgînîya wê ne bi tenêbûn bû. Xemgînîya wê ya esil, ji ber bêbawerîya qaqlîbazan bû ku bi hêza firandina xwedayî nedinasîn. Ew ji nêrînê tirsîyabûn, ji pêşdîtinê revîyabûn."r.25

Di wêjeyê de qaqlîbaz her koçerî, bêrîkirin û tenêtî nîşan dane. Mirov vê yekê di çîroka Bach de jî dibîne, lê bi şêwazekî cuda. Dema Jonathan ji ref tê qewitandin, sedema hestê tenêtiyê ku pê re çêdibû, ne tenêtîya dûrbûna wî ji refê qaqlîbazan bû, lê tenêtîya hizirên wî û pêşketinên ku bi tena xwe pêk tîne bû. Kes wek wî nedihizirî.

Mirov dikare bibîne nivîskar qaqlîbaz û tevgerên wî ewqas kûr û bi hurgilî dişayesîne, ji ber ku wî ewqas agahî li ser firîna qaqlîbazan ji zanîna xwe ya teknîka firînê wek pîlotekî û çavdêrîya qaqlîbazan, wergirtiye.

Çi rast, çi angaşt!

"Du-sê santîman dûrî baskên wê qaqlîbazek çîl spî û rewnaq difirîya ku di dinyê de hevalê wê tune bû." r.51

Qaqlîbaz rengereng in, lê her ku mezin dibin, rengê spî digirin. Nivîskar jî qaqlîbazên gihaştî bi rengê spî nîşan dane, xwestiye gihaştina (kemalbûn) qaqlîbazan bi mezinbûnê nîşan bide. Weke ku bibêje heta mirov negihêje kemalbûnê, mezin nabe; ango mezinbûna rast ne bi temen û salan e.

"Ne bi qîjewîj û ne bi xwendina bê mane, bi zimanê bêdengîyê pirsî: "Yên din li ku ne Sullîvan? Çima şênîya me nîne? Çiqas xerîb e! cihê ku ez jê hatibûm…". (4)

Gelek şêwazên qaqlîbazan û

3- Bach,Richard.Wer:Özçelik,Osman(1994).Qaqlîbaz Jonathan Livingston. Weşanên Firat,r.13

4- Heman jêder, r.37



■ **Romana eatchard Bach «qaqlîbaz»**

gîyanê ji koletîyê ye".(1) Reatchard Bach jî qaqlîbaz hilbijartiye, ji bo bike sembola azadîyê û di rêya lehengê romanê Qaqlîbaz Jonathan Livingston re gera li azadîyê nîşan bide.

Dema mirov dibêje firinde, yekser azadî tê bîra mirov. Ji ber ew bi hêsanî dikarin bifirin û lingên wan ji erdê tê birîn, bê ku rakêşana erdê bibe asteng li hember wan. Mircea Eliade jî di der barê vê yekê de dibêje: "Sembolîzekirina Firînê di hemû astên çandî de, tevî hemû cudahîyên mezin di rêbazên olî û çandî de, herdem derbirîna derbaskirina pîvanên mirovî, bilindbûn û azadîyê dike".(2) Ev gotin jî ji me re tekez dike ku mirov azadîyê di firînê de dibînin, ji ber firîn tiştekî ji karîna mirovan zêdetir e. Her wiha ji ber ku wêje jî li gor Platon vajîkirina rastîyê ye, helbet di wêjeyê de jî firîn sembola azadîyê û şkenandina pîvanan e. Bach jî bi rêya Jonathan û firîna wî ya bêsînor pîvan şkenandine. Lê gelo çima Bach qaqlîbazên normal (ên negihaştî) azad nîşan nedane, tevî ku ew jî difirin? Û em dizanin di wêjeyê de firîn sembola azadîyê ye!..

Mirov dikare nameyekê li vir bixwîne ku ne her kesê azad xuya dike, rastî jî azad e. Gelek mirov jî dema mirov li wan dinêre dibêje qey ew azad

1- http://maaber.50megs.com/issue_january15/mythology1.htm#_ftn4
2- Heman jêder

Qaqlîbaz

Pirhişyar Ismaîl

Jonathan heyîneke normal e, ne xwedê ye û ne jî lawê xwedê ye. Bach dixwaze bibêje ku kesên baş, ji ber ku dixwazin baş bin, ne kesên derasayî ne. Bila mirov bi vê hicetê xwe nexapîne û sînorekî di navbera xwe û kesên baş de çêneke.

Çima Qaqlîbaz?!

Herdem firîn xewna mirovahîyê bûye û gelek hewildanên firînê çêbûne, ta firoke hate afirandin. Lê pêkanîna vê xewnê dîsa bi rêya alavekê pêk hatiye 'kêm maye'. Xewna mirovan ji wisa zêdetir bi tena serê xwe, bê ti makîne û alavan firîn, xwe ji zagonan rizgarkirin û xwe azad dîtin e. Wiha firîn di bîra mirovan de bi ve azadîyê hatiye girêdan û wek sembola wê hatiye nîşandan, nemaze di wêjeyê de. Di wêjeyê de firinde pir derbas bûne û sembola azadîyê nîşan dane. Weke ku metholog "Jouseph Campbel" dibêje: "Firinde sembola rizgarbûna

ew gelên Mezopotamiyayê ne. Li ser vê xakê bi hezaran ziman, çand, wêje, cilûberg û ruhê civakbûyînê wekî xwe maye. Ji zarokatîya me de tê bîra me şevbuhêrkên hunerî ku kalkên me ji me re sitranên devokî û dengbêjî digotin. Ew wêjeya devokî ku her kesekî/ê lê guhdarî dikir û pêre sermest dibûn. Ji rastîya êşên jîyanê wêjeyeke resen û herikbar derdiket. Dibû stran, helbest û awaz. Ji berê ve li her deverên Mezopotamiyayê çanda bi navê civat, şevbuhêrk, komik û... hwd hebû. Di wan civatan de kî karîba di dîwanên began, axan û paşayan de helbestan bibêje û bidin ber hev ew qehremanê peyvê bûn. Dîwanên herî dewlemend ew dîwanên ku dagirtî civatên wêjeyî bûn.

■ **Adîle Xanim**

Di civata kurdî de jî yekemîn jina ku di vê mijarê de xwedî rol bû Edîle Xan bû. Rast e Edîle Xan di warê kûrbûna wêjeyî de ne li pêş bû, lê belê gava ku avêt; bawerîya wê bi komcivînên jinan dihat. Her demê digot: ”Mirov ji jinan dikare zanibe di gerdûnê de çi heye û çi nîn e,!”. Edîle Xan ji sala 1909an ve hetanî sala 1924an piştî wefata hevjînê wê Osman Paşa wê di buwarê de dikarîbû civakê bi rê ve bibe, û bibe xwedî kesayeteke bi hemû mijara re mijûl bibe û serkeftî be. Ji Helebçayê dest pê kir heta gihişte welatên Farisan jî. Ewqase civat û komcivînên wê bi bandor bûn.

Di rastîya heyî de ev Komcivînên wêjeyî ku di şoreşa me ya Rojavayê Kurdistanê da derketin, gelekî girîng in, lê bi mercê ku ne tenê di navendan de bimînin. Dema ku dengbêjên me şevbuhêrkên xwe li dar dixistin li her deverê digeriyan û diçûn her derê û her dîwanê, ev jî çandeke girîng e ku ew çand vegere û berdewam bimîne. Di wê bawerîyê de me ku wêje tenê bi zêdekirina hejmara salonên wêjeyî ne bes e, mijar ne cih û hejmar e, mijar naverok e, resenbûn e û hişmendîya civakbûyînê ye. Di heman demê de cewhera vê civakbûyînê jî jin bi xwe ye. Di wan komcivînên wêjeyî de jina kurd dikare pêşengîya herî resen ne tenê ji şoreşê, di heman demê de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê ta bighêje Rojhilata Navîn bike.

■ **nazili fadil**

Weke nimûne jî di dawîya sedsala 19an de çanda salonên wêjeyê dest pê bû, ji salên 1890î de hetanî dawîya sedsala 20 emîn. Weke tê gotin ku jina navdar Xanima Nazlî Fadil Paşa li welatê Misrê ku ew bi xwe jina yekemîn e ku xwestiye Komcivatên wêjeyê yên taybet bi jinan pêş bixe û di nava civakê de bike çandeke serxistina daiyalogan. Di wan civatan de jinên wêjevan, rewşenbîr û bîrewer amade dibûn û gengeşe li ser gelek mijaran dikirin. Nazlî Fadil di wan civatan de xwestiye kul û êşên jinan ku di rêka nivîsan de bi hev re parve bikin. Di dema xwe de ku jinên Misrê xwedî vîneke serbixwe û lêgerînên cuda ne. Ev yek daye nîşandan ku çanda Salonên wêjeyê ramanan digihîne gel hev, parvekirinê bi pêş dixe û ev jî çandeke Rojhilata Navîn e.

Ev çanda Rojhilata Navîn e, xwedan kok e. Her demê xelk û milet li civakbûyîna xwe geriyane. Di rastîyê de gava di mijarê de em dikevin nava liv û lebatê de, em dibînin ku pergala heyî ya cîhanî bi taybetî ya kapîtalîzmê dixwaze vê civakbûyîna jinê - civakê derbasî warekî qelb bike. Gelekî li ber çavan tê dîtin ku komikên wêjeyê li seranserî Ewrupayê û welatên wê digihên hev, lê belê çi gengeşe dikin? Çendîn bandora van gengeşan heye? çendîn ev mijarên ku wêjeyê dixe nîqaşê de dikare pirsgirêkên ronakbîrîyê û wêjeyê çareser bike?! Sererast bike?! Di vê mijarê de guman hene! Bi dehan an jî bi sedan jin bi vê erkê radibin, nemaze di warê xebatên parastina jîngehê de jî, lê mixabin ne di wê çarçoveyê de ye ku karibe vê cîhanê ji rewşa desthilatdarîyê û şer rizgar bike.

Pirsa girîng ev e; avabûna evqase salonên wêjeyê heye, lê çima wêjevanên ku karibin civakê li ser koka wê bihêlin derxînin pêş dernakevin? Dê û kalên me dibêjin: “Mala ava ne bi bilindahîya xwe ye, lê bi dagirtina xelkê xwe ye!”. Mijara ku tirsa mirov li pêş dixe ev e; çendîn salon zêde dibin; ewqase civak ji civakbûyîna xwe dûr dikeve. Barê herî giran dîsa tê ser milê jinê.

Yek ji wan miletên ku di dîrokê de çiqasî şer û talanî bi ser wan de hatiye jî, lê çanda xwe û civata xwe parastine

komcivîn, komên çand û wêjeyê, şevbuhêrkên wêjeyî û ..hwd dike têne gengeşekirin. Bi taybetî jî li welatên Ewrupayê weke Salonên wêjeyê di rojevê de ne. Bingeha peyva "Kom" ango "Komik" bi xwe jî ji rihê Jin – Dayikê ve hatiye. Her çiqasî ji malê, malbatê, êlê, qebîlê û gund hetanî bighêje bajaran û welatan jî jin serê ta girtiye û li derve belav kiriye.

■ civatên katarîna

Gava em li koka vê peyvê dipirsin peyveke latînî ye, "Salon" di wateya cih an jî komcivatek e gelek kes lê têne civadin û gengeşeya mijarekê dikin, an jî keseke nivîskar bi mebesta giftûgokirina mijarekê û rexnegirtinê têne civandin. Niha jî di sedsala 21ê de li her devera cîhanê salonên polîtîkayê jî li pêş in, ne tenê yên wêjeyî hene. Ew bi xwe xwedî rolek in ku karibin bi hişmendiyeke kolektîf civakê hişiyar bikin û asta rewşenbîrî û çandî berfireh bihêlin.

Gava em dibêjin "Civatên Wêjeyê" sedsala 15-16an tê bîra mirov, ku komcivatên bi navê "Salonên Çandê" yên wê demê tê bîra mirov. Bi taybetî jî li Firansayê, dîsa em dibînin bi destpêşxerîya jinan ev şêwaz ketiye rojeva civakê de. Di sala 1908an de li Firensayê yekemîn Civatên Wêjeyê derketine pêş, tê gotin ku jin li hev kom dibûn û mijarên ku pêwîstî pê didîtin gengeşe dikirin, jina ku ev mijar kiriye rojeva civatê Katren Do Romboy ye; Jineke ji xwe bawer, di heman wextî de dikarîbû jinên cuda cuda kom bike û ji nêrînên cuda re vekirin hebû. Katarîna ku di hin civatan de jî û di mijarên çandî û wêjeyî de zilam jî vexwendine û beşdarîya civakê ji dayîna nêrînên hevbeş li pêş xistiye. Ev civat hetanî sala 1959an jî berdewam kirine. Ji wê demê û bi şûn de gelek salonên rewşenbîr û wêjevanan bi destpêşxeriya zilaman hatine birêvebirin û êdî civakê ji xwe re kiriye mîna çandeke wêjeyî û rewşenbîrî.

Di çanda Rojhilata Navîn de jî civatên dîwana paşan, şêxan û mezinên dewletan jî gelekî ber bi çav bûn. Di serdema Seyf Eldewla Elhemedanî de civatên dîwanên wî bi nav û deng bûn, ji ber gelek wêjevan û helbestvan kom dikirin û di wan civatan de hemû naverokên wêjeyî dihatin ser ziman. Di serdema Umewîyan û Ebasîyan de jî bi taybetî di civatên Mamûn, Ebdulmelik Bin Merwan û Şerîf Murteda de û... hwd.

Ji Civat, Komcivîn û Şevbuhêrkan Hetanî Salonên Wêjeyê

Nêrgiz Ismayîl

Di civata kurdî de jî yekemîn jina ku di vê mijarê de xwedî rol bû Edîle Xan bû..

Di hemû pêvajoyên dîrokê de jinê mohra xwe ya zêrîn hiştiye. Ji bo avakirina civakê jî bûye xwedî hebûneke şênber. Tekez jin bi xwe jî van şopên xwe yên dîrokî lêkolîn bike û zanibe ku ne tenê jin "kesek" "takekesek e" di civakê de. Jin di wateya civakbûyînê de rihê civakê digerîne. Bêguman di qada wêjeyê de jî jin cewhera xwe teysandiye. Ji dîrokê û ta vê serdemê, wê xwezaya xwe ya civakî derbasî perensîbên civakî kiriye. Peyva ku di vê demê û di gelek civatan de tê ser ziman Civat,

tiştan pêşkeş bikim. Ji ber ku mijar li gor demê xwe diafirîne. Carinan ez li hin şanoyên Kurdî temaşe dikim. Dinêrim ku tu têkilîya wan bi rojê re nîn e. Mijareke ku berî bi hezar salî qewimî ye dikine şano. Ez nabêjim bila nebin. Bila ew jî hebin, lê gelek mijar û bûyerên ku bêhtir pêwistî pê heye hene. Yan jî tu lê dinêrî, dînê gundekî dikin mijar. Halbikî ew gund şewitiye lê tu dînê gund dixê mijara sereke. Yanî divê meriv di hilbijartina mijarê de li roja xwe, pêdiviya dema xwe bifikire. Ji xwe mijar dibêje îro roja min e. Divê meriv jî li gor van pêwistîyan tevbigere û guhên xwe bide dema xwe.

-Ji bo vê hevpeyvînê gelek spas. Heger tiştekî ku hûn bixwazin lê zêde bikin hebe kerem bikin.

Spas ji bo we jî.

Kamran Simo Hedilî

di Sibata 1955an de li gundê Hedilê yê bi ser navça Hezexê ve hate dinyayê.

Ew, endamê Yekîtiya Nivîskarên Swedê ye, endamê Pena Kurd a Navnetewî ye û endamê Kongira Netewî ya Kursistanê KNK ê ye. Niha serokê Înstutiya Kurdî li Stockholmê ye.

Ji 1982an ve dinivîse. Kurteçîrok, helbest û lêkolînên wî di rojname, kovar û malperan de hatine weşandin.

Berhemên wî:

Civata Giyanan [Kurteçîrok] Weşanên Navenda Pedagogiya Kurdî, Stockholm - 2006

Serpêhatiyên Winda (Kurteçîrok) Çapa yekemîn Weşanên Înstituya kurdi Li Stockholm -2019.

Helbest Çi Ye [Lêkolîn] Weşanên Înstituya Kurdî Li Stockholmê, Stockholm- 2009

Lorîna Pênûsê [Helbest] Weşanên Kîtabî Arzan Stockholm – 2004

Ji Enfalê Şeveke Bê Sibeh [Helbest] Weşanên Navenda Pedagogiya Kurdî, Stockholm - 2006

Min Deng Kuştin [Helbest] Weşanên Navenda Pedagogiya Kurdî, Stockholm - 2006

Kîjan Kulîlk Çavên Te Ne [Helbest] Weşanên Înstituya Kurdî Li Stockholmê, Stockholm – 2009

Berbanga Êvara Mirî [helbest] Weşaşên Înstituya Kurdî Li Stockholmê, Stockholm- 2017 Berbanga Êvarê [Helbest] Çapa 2mîn, Weşanên J&J, Amed - 2018

Dilê Xewnên Xwe Me [Helbest], Weşanên Înstituya Kurdî Li Stockholmê, Stockholm- 2015

Dilopên Lal [Helbest] Çapa 2mîn, Weşanên J&J, Amed - 2018

Babilîsok [Roman] Weşanên Înstituya Kurdî Li Stockholmê, Stockholm- 2012

Pêxemberê Jibîrçûyî MANÎ [Roman], Weşanên Ar, Stenbol - 2013

Qêrîneke Bêdeng RINDÊXAN [Roman] Weşanên Aram 2015

Pêjna Baranê [Roman] Weşanên J&J, Amed – 2018

Kurd, berî 50 salî ne xwedîyê saloneke wêjeyî jî bûn. Hebûna jî ne yên me bûn, ne bi zimanê me bûn. Qaşo li bajarekî me sînemayek hebû. Lê li ber çavên me, li sînemaya Amûdê 263 zarokên me di kêlîyekê de şewitandin. Ji xwe ew jî ne bi zimanê me bû, Erebî bû. Li Bakur bi Tirkî bûn, li Rojhilat bi Farisî bûn, li Başûr û Rojava jî bi Erebî bûn. Divê em wekî gel, hewldaneke gelekî mezin bikin ku mînak em teknolojîyê bikin amûra xwe û înternetê wekî saloneke wêjeyî ya mezin qebûl bikin û vê çand û hunera xwe ya dewlemend pêşbixin.

-Ji bo vekirina saloneke wêjeyî çi pêwist e? Şert û Merc çi ne û ji bo xebateke wisa divê meriv xwedîyê çi taybetmendiyan be?

Li hemû derê dinyayê, salonên wêjeyî bi erbabên wî karî re tên avakirin. Divê kesên ku van xebatan dimeşînin xwedî nêrîneke estetîk, nûjen û zane bin. Lê divê em vê jibîr nekin, heger rêveberî û otorîteyeke te ya siyasî nebe tu salonekê vekî jî dê ji te bistînin. Divê ew rêveberî hebe ku ev xebat were parastin. Wextê ku ew hebûn û parastina sîyasî çêbû, tu dikarî van salon radestî kesên ku ji vî karî fêmdikin bikî. Dikarî kadroyên van salonan diyar bikî. Her kesek li gor pisporîya xwe dê xebata xwe bimeşîne,wek roman, helbest, çîrok, sînema, şano, dengbêjî... Jixwe di çanda me de çavkanîyeke pir dewlemend a hunerê heye. Û divê em Kurd, di van salonên xwe de sansur û otosansuran jî nekin. Ev xerabîyeke mezin dide wêjeyê. Bêhtir jî otosansur zerereke mezin dide. Wêje divê azad be. Lê divê ne xirabkarî be. Xirabkarî ne azadî ye. Jî ber ku em hêdî hêdî derdikevine ronahîyê. Yanî hê roj li me û welatê me qamekê jî bilind nebûye. Va nû roj dihile û wêjeya me jî ronî dike. Divê em vê ronahîyê jî gelekî baş û zane bikarbînin. Bi hişmendîya miletê xwe, welatê xwe, çand û hunera xwe tevbigerin. Divê rêveberên salonên me jî bi vî awayî tevbigerin.

-Baş e mamoste, heger hûn berpirsê saloneke çand û wêjeyê bin hûn ê çi mijaran ji bo gengeşe û nîqaşê hilbijêrin?

Gelo mijarek heye ku mirov nehilbijêre? Na. Hemû mijarên çandê mijarên hilbijartinê ne. Her tişt bi hunerê re têkildar e. Derhêner dikare were fîlmê xwe pêşkeş bike, wênesazek dikare tabloyên xwe pêşkeş bike, helbestvan dikare were helbestên xwe bixwîne, nîvîskar dikare romana xwe bide nasîn, çîrokbêj dikare çîroka xwe bixwîne, dengbêj dikare bisitirîne... Yanî divê her rengê hunerê were nîşandan. Û xaleke din ya girîn jî ev e ku, mijara bûyeran roja xwe diafirîne. Roj tê, wêje te gazî serhildanê dike. Roj tê, wêje xwe bi xwe te gazî avakarîyê dike. Roj tê, ew wêje gazî dike dibêje xerabike. Yanî ez ê mijara xwe li gor rojê bineqînim. Wê rojê çi pêwîst be, pêdivîya gel bi çi hebe wêje ber bi wir ve diafire. Divê ez çi bidime gel? Divê ez li van xalan bifikirim û wê rojê wan

Enstîtuya Kurdî li Stockholmê mehê sê çar caran civînan lidardixin. Vêga ji ber pandemiyê em civînên xwe li ser înternetê pêk tînin. Em van civînan li ser tora civakî jî belav dikin. Bi vî hawî, her civîna me ji alîyê bi hezaran kesî ve tên temaşekirin. Bi milyonan kes jî dikarin xwe bigihînin. lewma em dikarin ji vê xebatê re, salonên wêjeyî yên teknolojîk bibêjin. Ji ber ku em li ser înternetê digihin hev, pêşkeşî tê kirin her kesek xebata xwe ya wêjeyî nîşan dide, wek xwendina helbestê, xwendina nivîsê, nirxandinên pirtûkan û gelek tiştên bi vî rengî. Û bi ser de hemî cîvak dikare xwe bigihîne van civînan. Ji ber vê divê em teknolojî û tora civakî bi vî hawî binirxînin û baş bikarbînin.

-Baş e, Li Bakurê Kurdistanê rewşa salonên wêjeyî çawa ye gelo?

Li Bakur jî gelek xebat û hewldanên bi vî rengî çêbûne. Wek malên dengbêjan, malên jinan, Navenda Cîgerxwîn, Navenda Nûbiharê, Yilmaz Guney û bi gelek navên cuda salon hatine avakirin. Bi navên serkêşên me yên wêjeyî gelek salon vebûn û di van salonan de gelek xebatên rêkûpêk hatin kirin. Lê ev salon jî di demên ku şaredarî di destê Kurdan de bû hatin avakirin. Paşê dagirkeran dest danî ser şaredarîyan û gelek ji van salonan girtin. Lê dîsa jî gelek hunermend û wêjehezan li gel van astengîyan xebatên xwe di salonên curbecur de meşandin û hê jî dimeşînin. Wekî din, ji teknolojîyê jî sûdê werdigirin. Bi destpêka vê pandemîyê re, mirov ji hev dûr ketin lê bi vê re fersendeyeke nû derkete holê. Em dikarin salonên xwe yên wêjeyî li ser înternetê ava bikin. Em her li ku derê bin jî dikarin di van salonan de wêjeya xwe pêşkeşbikin, binirxînin û pêşbixin. Li Bakur jî hewldanên bi vî rengî hene. Gelek komên wêjeyî hatine avakirin û komcivînên xwe li ser înternetê dimeşînin. Xebatên gelekî serkeftî dikin.

-Gelo mirov dikare bibêje ku ev komên ku li ser înternetê hatine avakirin dikarin îro valahiya van salonan tije bike?

Ez bawer im, ne sedî sed be jî li gor xwe rola wan dilîze. Berê gava ku me li enstîtuyê civîn li dar dixistin herî zêde sed kes tevlî dibûn. Lê vêga em behsa bi hezaran kesan dikin. Mînak, me duh li ser înternetê civînek lidarxist, 40 helbestvanî helbestên xwe xwendin. Yanî, divê meriv hertim li serkeftin û pêşxistinê bigere. Ji ber ku ev hezar sal e em yekemîn care bi dinyayê re dimeşin. Em Kurd, ne li pey dinyayê dimeşin êdî. Divê em her derfetê ji xwe re wek amûreke pêşxistina ziman, çand, wêje û hemî tiştên xwe bikarbînin. Divê em li pişt xwe aliqî nemînin, pêşvebiçin. Tenê kesên ku hêvîya wan a paşerojê nîn e pesnê rabirdû didin, yanî behsa berê dikin. Divê em ne ji wan kesan bin. Divê em bêhtir li pêşîya xwe binêrin. Me berê tu xweşî nedît. Em weke civaka

-Girîngî û bandora salonên wêjeyê ser bizava çand û wêjeyê çi ye?

Salonên wêjeyî, di her serdemê de rolên gelekî girîng lîstine. Ji bo pêşxistina mirovahîyê cihekî sereke û girîng bûn. Di van salonan de pêşxistin û şiyarkirin jî hebû. Ji ber kirinên di van salonan de, gelek kes ji alîyê rêveberan ve hatin îdamkirin û êşkencekirin. Insan dihatin şerjêkirin û serê wan di deriyê van salonan ve dihatin daliqandin. Û digotin, "heger hûn ji serê xwe hez dikin hay ji gotinê xwe hebin, gotinên xwe îdareyî bikarbînin." Yanî digotin çi were ber devê we nebêjin, pêşî baş bifikirin. Ji ber ku hin gotinan civak hişyar dikirin û ji bo kral, împarator û rêveberan dibûn tehtîd. Dema ku rêveber, ne bi dilê gel bûna, wêjesazan ev rewş dikirin mijara hunera xwe û rexneyên xwe nîşan didan. Gel hişyar dikirin. Ji lewma ev salon, xwedî roleke gelekî mezin bûn. Di pêşxistina mirovahîyê de jî, di veguherîn û xwenûkirina civakan de jî xwedî bandoreke bihêz bûn.

-Belê, em hinekî jî behsa dema xwe bikin. Wek ku hûn jî dizanin bi demê re teknolojî gelekî pêşket û tora civakî bi hêz bû. Gelo van pêşketinan li ser salonên wêjeyî bandoreke çawa kir? Rola wan qels kir an bihêztir kir?

Her tişt bi demê re tê guhertin. Berê ji bo temaşekirina şanoyan em mecbûr diman biçin salonê. Lê niha, ev şano di bin telîyên me de ne, em neçin jî dikarin temaşebikin. Şano, dîsa di salonên xwe de tên amadekirin û pêşkeşkirin. Teknolojiyê bi her pêşketinê bandor li ser civaka dema xwe kiriye. Tora civakî jî wilo. Helbet bandor li salonên wêjeyî jî kiriye. Lê meriv lê mêze bike, wêje bi televîzyon û kompîturan ketiye malên me. Bi van em dikarin bigihin her rengê wêjeyê. Li gor nêrîn û kirina me em dikarin bi van pêşketinan salonên wêjeyî xurt jî bikin, qels jî bikin.

-Yanî van pêşketinên teknolojî di alî de em çawa dikarin sûdê werbigirin?

Em li gor lêgerîna xwe dikarin gelekî sûdê jê werbigirin. Dinyaya niha di bin deh teliyên me de ye. Derfeta me heye ku em xwe bigihînin hemû agahîyên di derheqê dinyayê, wêjeyê, çandê û hew wekî din de. Heger em li xweşîyê bigerin em dikarin ji teknolojîyê sûdê werbigirin. Di jîyanê de ti tişt yekalî tune ye, ne tenê reş û spî ye. Teknolojî jî bi vî rengî ye. Divê em li başîyê bigerin. Wek mînak, bi saya teknolojîyê rêzefîlm, pêkenok, şano, fîlm, belgefîlm û muzîkên bi kurdî li her alîyê cîhanê tên amadekirin û belav dibin. Ev tişt hemû di salonên wêjeyî de tên amadekirin û em bi teknolojîyê dikarin temaşebikin. Em naçin salonekê li Qamişlo yan li Amedê, lê dîsa jî em dikarin li wan temaşebikin. Wek temaşevan em dîsa wek ku li wir bin. Wekî din, em wek

yên Ewropayê em bibînin ku salonên wêjeyî roleke siyasî, çandî û hunerî lîstine. Di wan de him şano, him opera û him jî stranên ku civakê şiyar bike dihatin pêşkeşkirin. Li welatên din bi cureyên din jî dihatin çêkirin. Li welatê me jî, salonên wêjeyî, ode ango malên dengbêjan bûn, yê stranbêjan û çîrokbêjan bûn, odeyên civatê yên gundan bûn ku di wan de gelek tişt dihatin parvekirin. Ew jî salonên wêjeyî bûn. Yanî salonên wêjeyî li her welatî, li her parzemîna dinyayê û di nava her miletekî de bi awayên xwe yên cuda cuda çêbûne.

-Salonên wêjeyî ji kîjan demê ve û ji ber çi sedeman derketine holê?

Bawer im, em nikarin dîrok, ol û çandê ji hev cuda bikin. Wextê ku em li mirovan û li wêjeyê mêze dikin, ew jî ji hev cuda nabin. Her wiha ol û wêje jî ji hev nayê cudakirin, dema em li dîrokê dinêrin ol û wêje jî bi hevdu re meşiyane. Û yek ji pêwîstîyên mirovan jî ew e ku werin gel hev û ji hev tiştan fêr bibin. Ev tişt ji serdemên pêşî de hene. Heger em li Xirbereşkê (Xirbereşt, ew cihê ku Tirk jê re Gobeklîtepe dibêjin.) û li parestgehên Sumeran mêze bikin. Beriya bi 12-13 hezar sal, mirovan dîn û xwedayên xwe afirandine û bawer kirine. Û di wan cihên ku avakirin de, wêje jî çêkirine. Ev cih di serdemên xwe de rola salonên wêjeyî dilîstin. Wekî din parestgehên gelek olên din jî ev tişt kirine. Di wan de jî, ji xwedayên xwe re stran gotine, dans kirine, şano kirine û gelek tiştên din yên bi vî hawî pêkanîne. Yanî, li şûna ku em li bersiva salonên wêjeyî ji çi serdemê ve hatine avakirin bigerin, divê em lê binêrin ka bi çi awayî û çima hatine avakirin. Ji ber ku salonên wêjeyî ne tenê di serdema Grêklanda nû, yanî Helen ango Yunana kevin ve hatiye avakirin. Dîrok bi vî rengî teng dimîne. Derketina salonên wêjeyî digihe deh hezar salan. Wek mînak, Hurmizgehên ola Zerdeştîyê li welatê me rola van salonan dilîstin. Mazdageha Zerdeşt a bi navê Nûbiharê, parestgeha ku Zerdeşt bixwe ava kiriye. Di vê Mazdagehê de, Zerdeşt bixwe bawermendên xwe li hev kom kiriye û ji wan re gatayên xwe bi awayekî helbestî xwendiye. Her wiha di vir de stran hatine gotin, govend û sema hatine gerandin. Divê em ji wî çaxî bigirin û werin salonên îro yên moderan. Erê îro salonên girtî, bi temaşekirina mirovan tên avakirin. Lê berê mirovan hemî tiştê xwe bi zimanê xwedayê xwe digot, helbest, çîrok, destanên xwe di wan salonan de afirandin û fêrkirin. Heta dibistanên perwerdehîyê di wir de bûn, rêkûpêkkirina mirovan jî di wir de dihate kirin. Ji lewre, dîroka salonên wêjeyî gelekî kevn e. Yanî em dikarin bibêjin, pêdivîya mirovahîyê her tim bi wêjeyê hebû û salonên wêjeyê jî ji vê daxwazê re dibûn bersiv. Ji ber tişta ku estetîkî daye û mirov kiriye mirov wêje ye. Bi derketina ziman re wêje jî derket. Hemî tiştên xwe jî bi zimanên xwe afirandin. Bi vê re wêje jî bû parçeyek ji jiyana mirovan. Parçeyekî ku ji mirov nayê cudakirin.

Nivîskar "Kamran Simo Hedilî" ji "Şermola" re:

Divê kesên ku xebatên Salonên wêjeyî dimeşînin xwedî nêrîneke estetîk, nûjen û zane be..

Hevpeyvîner: Desteya Sernivîskar

Hevpeyvîna hejmarê

-Dem baş Birêz Kamran Simo Hedilî, hûn bi xêr hatin.

Gelekî spas.

-Em dixwazin di vê hevpeyvînê de behsa salonên wêjeyî bikin. Gelo hûn salonên wêjeyî çawa pênase dikin?

Salona wêjeyî, cihê ku her tiştê bi rengê wêjeyî têde tê kirin, tê nirxandin û tê nîşandan e.

Li gor dîtina min, salonên wêjeyî li gor neteweyan têne guhertin. Heger em vegerin sedsalên navîn

Îro li dinyayê ne ez gune me
Xaliq, Li dinyayê ne ez gune me
Ya Reb tu îmdat bikî ne ez jî qûl û
ez jî ebdê te me. (14)

Encam

Armanca vê lêkolînê, dîyarkirina naverokên ku dengbêj di kilamên xwe de bikartînin, Yan jî herî zêde kîjan naverok hatiye vegotin. Di kilaman de herî zêde mijara eşq û şer hatiye vegotin. Her tişt dibe naverok, yan jî dengbêj her tişt xistine naveroka kilamên xwe de. Ev tişta ku me vegot li ser hunera dengbêjî û erdnîgarîya ku dengbêj li ser dijî têkildar in. Derûnîya dengbêj jî bandorê li ser kilaman dike. Dengbêj di kilamên xwe de carnan peyamekê dide, yan jî bûyera ku vegotîye xwestîye ku bîne ber çavên me. Eşqa xwe carnan ji jinekê re carnan ji xwezayê re carnan ji bo welat vegotîye. Di kilaman de pêwendîyên çandî, civakî, erdnîgarî, derûnî û mirovî hene. Ev pêwendiyên di navbera wan de, di warê dengbêjiyê de, li ser dengbêj bandorê dike. Dengbêj ji bo kilamên xwe jî ji wan tiştan sûd digire.

Çavkanî

-Beğik, Mahmut. (2018).Reso Şahê Dengbêjan, Nûbihar, İstanbul: Nûbihar Yayınları.

-Karataş, Turan.(2007). Ansiklopedik Edebiyat Terimleri Sözlüğü. Ankara: Akçağ Yayınları.

-Kardaş, Canser. (2017).Aşığın Sazı Dengbêjin Sözü, Ankara: Eğiten Kitap Yayınları.

-muhteva.nedir.org/

-Yıldız, Ayhan ve Taşkın, Hanifi.(2018). Şakiro Kewê Ribat. İstanbul: Nûbihar Yayınları.

14- Beğik, r. 166-167.

Lê lê gulê rebenê li dinyayê geriyam
Ez gul im, gula di zinêr da
Hey wayê.. hê..hê hê..hê..lê lê hayê hayê
Ez gul im di gula di zinêr da
Payîze xelkê gulên xwe çirpandin
Gula min maye li qeyayê, ma li çiyayê bilind
Stûyê xwe xwar kiriye di ser sosinê ra şax û mêl daye
Felek mala te mîrat be, min sond xwariye
Ez terka çelengsiwarê xwe nakim
Heyanî bi destê min bigrin, gidîno min daxin qebra germ û sar da
Heta nê ser min melekê mewtê, qasidê Şahê Merda

Di vir de gilî û gazinên xwe li hemberî felekê tîne ziman. Mala felekê wêran be, hê ciwan bû, li dinyayê hişt ku kêfxweş be, lê di kalbûna wî de êş û elem daye wî. Dilşabûna felekê xapandineke. Belê felekê ew şa kir, lê niha ew li cem hevalên wî feqîr û belengaz hiştiye.

Felek mala te mîrat be, emrê min 13 û 14 bû
Te dilê min li dinyayê gelek şa kir,
Di dawiya emrê min de ev çi êş û elem bû
Te li canê min peyda kiriye, ji par û pêrar de
Hey wayê hê.. bêje hey wayê hey wayê..
Lê lê rebenê ez a li dinyayê gelo gul im, guleka ter û tazî,
payîze xelkê gulên xwe çirpandin
Gula min maye li qeyayê, ma li çiyayê bilind,
Maye li ber sirê seqemê, hey Rebiyo, rût û tazî
Felek mala te mîrat be emrê min 13 û 14 bû
Te dilê min li dinyayê şa kir
Ev a çi êş û elem bû payîze te li canê min peyda kiriye
Ez ji hevalê xwe mame sitûxwar û feqîr ewqas bi belengazî
Hey wayê hê hê hê hê..Bê de hey wayê hey wayê…

Hawara xwe ji Rebbê xwe re vedibêje. Bawerîya wî li hemberî Xweda şikêstî ye. Ya renkor bûye her du çavên wî kor bûne. Paşê dibêje ez qûl yanî xulamê te me, ne jî ez ebdê te me.

Rebiyo ez li dinyayê gul im gula ber qefayê
Ez a korê her du çavê min rijiyayê
Rengê çelengsiwarê min xerab bûye ji bihar da
Ez nizanim ji sirê ye ji seqemê
Sê payê wî ji sermayê
Felek bila ji îxbala min ra, mala te mîrat be, te kona li ser kona dayê
Emrê min 13 û 14 bû te dilê min gelek şa kir
Ev a çi êş û elem bû, payîze te li canê min peyda kiriye
Axira emrê min e, te ez dîn û har kirim berdame dinyayê
Hey wayê hê hê… hê hê…lê lê hey wayê hey wayê

Hem nav e hem nav e hem namûs e kuro şerm e
Wê Rizgo hey wayê
Lê Qoçan birawo
Ehîî (12)

Dêrsim e Xweş Dêrsim e

Ev kilam, ji bo xwezaya Dêrsîmê hatîye vegotin. Dengbêj, gazîyekê dike, wextê ku hest bi xweşîyekê bike. Heza xwe li hemberî xwezayê dibêje. Xwezayê ji hin alîyan ve wisa rave dike. Bajarê Dêrsim xweş e, ava çemê li gelîya, gol li alîyekî ve ser wî de tê. Dengê avê tîne ziman. Av bi gimgim û zimezime, diherike.

Wey lo lo, wey lo lo, wey lo lo,wey lo lo,wey lo lo, wey lo,
Wey lo dilo, marimo, ne min go ezê çûmê Dêrsimê, xweş Dêrsim e,
Ax de avên çema kanîka, li geliya, li gola li ser min da têne
Gimegim e, zimezim e, wey dil, weydil…

Di vir de dengbêj ji bo hin kesan bang dike. Gundîno û malîno, di mala wî de du dengbêj rûniştîne. Tembûra wan teswîr dike, bi zivîn û zêrîn e. Dengbêj dibêje ji bo kula dilê min lêxin, şêwîş; yanî kesê ku ji ber bêxemî yan jî ji serxweşîyê nikare li ser lingan raweste, dibêje ew kes di mal de nîne.

Gundî, malîno, minê mala xwe didayê du sazbende rûnîştîne,
Sîmeke sazê wana zivîn e, yek zêrîn e,
Şêwîşê biskê çê di mal da nîne, ji kula dilê min re lê dixin
Ringering e, dingeding e, wey dil, wey dil… (13)

Gula di Zinêr de

Di vê kilamê de li ser quling, siruşt, xerîbî, hezkirin, mirin, dilşabûn û gilî û gazinên hemberî feleke diaxive. Bawerîya ku li hemberî Xweda şikestî heye. Dengbêj ji gulê re dibêje ez reben im li dinyayê digerim. Ez gul im, lê guleke ku di zinêr de ye. Ev gul gihîştina wê dijwar e û meriv nikare bigihêjiyê. Her kes gulên xwe çirpandine tenê ya wî ma ye. Ji hezkirîyê dûr ketiye, ji hev dûr in. Gula wî ma ye li çîyayekî bilind û stûyê xwe xwar kirîye li ber sosinan. Li benda xwedîya xwe ye. Di navbera gulê û hezkirîyê wê de sondek heye. Dibê felek mala te wêran be, sond xwarîye ku dev jê bernade. Tenê derdê wê tenêtî ye. Ji xwe ewle ye kes niakre bigihêjiyê û zererê bidiyê. Gulê xemgîn e, çimkî ji hezkiriyê xwe dûr e. Paşê dibe qebra sar û germ. Heta Xweda rihê wî jê bistîne terka gulê nake.

12- Yıldız, Ayhan & Taşkın, Hanifi. r. 269.
13- Beğik, r. 182.

Tu rabe bi destê mi gulîbira Xwedê bigre birevîne
Bavê ber bextê axakî bi bext
Mi navê mixara xirave mixara bê bînî mixarekî bê ayik e
Qoçanê birayê mi rabûye ranebûye heftsalîya xwe da
sekman e
Vê sibengê malxirabno tivinga desta da fenanî
pûrta teyrê Tawûs ditaîse

Wê xwe biavêje ber birayê Qoço, wê bibêje ez gotina te dikim, li bedena Rizgo nexe. Kurapê wî ye, heyfê ku ew li Rizgo bixe, ew mêranî ye. Wê saca xwe di rêya xwe deyne, dest mede Rizgo, derba li wê gulîrabîrayê bixe. Daxwazî ji birayê xwe dike. Dibe di nav heval û hogirên wan de li wê bixe ji bo Qoço we bibe binav bişeref binamûs. Wisa di ristikên din de berdewam dibe. Jinik ji Rizgo hez dike, dixwaze Rizgo wê birevîne. Em wiha fêm dikin ku Rizgo kurapê wê ye. Birayê wê naxwaze ku ew bigihêjin hev. Paşê birayê xwe teswîr dike di heftsalîya xwe de ye rabûye û ranebûye sekman e. Yanî dijwar e bi quwet e. Wiha jinik şîna xwe û hîsê ji bo Rizgo dibêje:

Ez ê xwe bedrim pêşiya Qoço bibêm Qoçiyo
Ez ê bi te kim tu yê bi Xwedê kî derbetê
li bedena Rizgo mexîne
Rizgo lawê apê te ye peyakî heyf e darê pişta te ye
Mi teniya sacê di riya xwe daye
Bi destê zorê li ruwê Rizgo aniye
Derbekê li bedena mi gulîbira Xwedê bixîne
Di nav heval û hogira de ji te ra hem nav e hem şeref e
hem namûs e
Wayê Rizgo hey wayê lê Qoçan birawo
Ahî

Li vir dîsa berf li wan barîya ye. Taybetmendîya berfê tîne ziman. hê berf nerm e. Wisa dîsa di beytên jêr de dubare dike.

Rizgan berxê li me barî berfa nerm e ê hê yê berfa nerm e
Rizgan berxê li me barî berfa nerm e
Tu sêr bike li vî erdî bi ser me de da girtî çerm e
Destê mi gulîbira Xwedê bigre birevîne
bavê ber bextê axakîbi bext
Mi navê mixara xerave
Mixara bê bînî mixarekî bê ayik e
Qoçanê birayê mi rabûye ranebûye
Heftsaliya xwe de sekman e
Şopê digerîne îzê tîne ser me
Tu sêr bike malxirabo ocaxkoro
Ez ê xwe berdim pêşiya Qoço
Ezê bêjim Qoçiyo ezê bi te kim tu bi Xwedê kî
Derbekê li bedena Rizgo nexîne
Rizgo lawê apê te ye peyakî heyf e darê pişta te ye
Mi teniya sacê di ruwê xwe daye
Bi destê zorê ruwe rizgo aniye
Derbekê li bedena mi gulîbira Xwedê bixîne
Di nav heval hogira da ji te re

Bîst mêr kuştine maqûlo, dîsa gava xwe dirêj kiriye, sond xwariye Ranabe ji ser cenazê Evdal û Kerem e.

Kerem û Evdal kesên maqûl in. Dengbêj li ser maqûlîya wan dixwaze gilî û gazinên xwe bîne ziman. Gilî û gazinên wî ev in ku îslam tune ye.

Lo mîro lo mîro lo mîro, lo mîro ho Ax lo mîro lo mîro lo mîro lo mîro lo mîro Hew maqûlo ez nemînim ji maqûliya te ra çi bikim li dinyayê îslamî tunî ne. (11)

Rizgo

Ev kilam ji alîyê naveroka xwe ve gelekî dewlemend e. Gelek tiştan di hundirê xwe de dihewîne. Di klamê de em rastî dîlan û şînê tên. Her wiha di kilamê de şaristanîya civakî jî heye. Yanî, nirxên welatekî yan jî neteweyekê di hundirê xwe de dihewîne. Di kilamê de netew, nirx, dil û şîn heye. Porkurbûn û teyrê Tawûs di Êzîdîyatiyê de tê xuya kirin. Keçikek dema ku hezkirîyê wê dimire ji bo hezkirîyê xwe pora xwe jê dike. Di ristên jêrîn de Rizgo berxê birayê xwe ye, em vê çawa fêm dikin? Bi şayesandina wî em fêm dikin; dema bêhna ba nehatiye û hê jî berf spî ye. Bang dike, li wan berf barîye lê taybetîya berfê tîne ziman, berf spî ye. Ji bo ku gilî, gazin û nifirên xwe bîne zimên gazî Rizgo dike. Malxirabo tê vê sibehê sêr bike, sehr bike. Tivinga ku di destê Rizgo de weke pûrta teyrê Tawûs e, di destan de çirav e.

Rizgan berxê bira li me nehata bîna bayê sî têye hê berfa sîs e Rizgo berxê li me barî berfa sîs e Tu sêr bike vê sibengê malxirabo Tivinga destê Rizgo fenanî pûrta teyrê Tawûs e desta da ditaîse

Di çanda kurdan de porkurkirin tê wateya mirinê, şîn û êşê. Jinek, dayîkek, keçikek ji bo ku êş û şîna xwe nîşanî civakê yan jî kesê ku jê hez dike, bide pora xwe kur dike, ev kes dibe ku kur be, bav be yan jî hezkirî be, pora xwe jê dikin û dîyarî wan dikin. Di kilamê de behsa jineke wisa tê kirin, dema ku hîsên xwe tîne zimên gulîbira jinike porkur e. Dibêje rabe bi destê min bigire birevîne. Jinik jê daxwazî dike bila wê bavêje axakî ku bi bext e. Mixara xirabê ye, bê bînî û ne li ser hişê xwe ye. Paşê birayê rabûye û nerabûye, heftsalîya xwe de ye. Ev sibengê bi nifirekê malxirabo, ocaxkoro tîne ziman, dibêje ku tivinga di destan de wek pûrta teyrê Tawûs e. Keçikê birevîne lê dema ku keç hate revandin bibe bal axayekî bibext.

11- Beğik, Mahmud, Reso Şahê Dengbêjan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2018, r. 155.

nedihatin kuştin. Wek Kerem û Evdal. Neheqî heye, heger îslam hebûya ewqas mirov nedihatin kuştin. Piştmêrî qeśt ev e heger welatekî Kurdan hebûya qey Îran dikarîbû ewqas Kurd bikuştana. Ji bêwelatûyînê zilm û zordarî li gelê Kurd dibe.

Lo mîro! Lo mîro! Lo mîro! Ax lo mîro lo ho,
Ax lo mîro! Lo mîro! Lo mîro! Ax lo mîro lo ho,
Ez nemînim ji maqûliya berxê
mala bavê xwe gulîbirê
Hew li dunyayê çi bikim îslamî tunîne
Lo mîro sibe ye min di Evdal ba kir
Kerem, Kerem dengê xwe nekir
Evdal ba dikir Kerem, Kerem dengê xwe nekir
Ev du berxê mala Evdilla Miśtefa
Begê rûniştin gaza biniyayê
Herduya bi hev re mişêwere kir
Ya pepûk ez im ya ku îsal hatiye
serê berxê mala bavê min mehrûmê

Li bendên jêr Eyûb pêxember bi bîr tîne. Dibêje tiştên ku hatine serê Kerem û Evdal wek Eyûb pêxember in. Eyûb pêxember di jîyana xwe de gelek dijwarî dîtibû. Ew dijwarî ya ku Eyûb pêxember kişandîye Kerem û Evdal jî kişandine. Dengbêj xweśtîye ku li ser dijwarîya ku Eyûb pêxember kêşandîye dijwariya Kerem û Evdal jî bibêje:

Li dinyayê bila nê serê Eyûbê kurmaxwarî
Kurma goştê canê wî tarûmar kir gidîno
Heyfa min nayê li kuştina Evdal û Kerem bi hêsîrî li hewşa Emîr Tûman
Heyfa min tê li wê heyfê, çilê zivistanê, ecêba giran min bi çavê serê xwe dî, gidîno
Min dî Ferzende, Besra çû derê birê Ehmê Keko xweyî nekir

Li vir dîsa dubare dike. Bangî li mîro dike, paşê gilî û gazînê xwe dibêje:

De lo mîro, lo mîro, lo mîro lo, lo mîro lo
Ax lo mîro lo, lo mîro lo, lo mîro lo, lo mîro
Ez nemînimji maqûliya berxê mala bavê xwe, pepûkê
Hew gidîno ez çi bikim li dinyayê piştmêrî tunîne.
Lo mîro sibe ye bi Qisqaniyê diketim di ber de çem e
Xwedê xerab bike şewitiya Qisqaniyê bişewite di ber da çem e.
Min dî Keremê bejnzirav, Evdalê pozberan fena cara qasê xwe daye cem e
Min nizanibû eza pepûkê axa berxê mala bavê min mehrûmê bikşîne Îrana şewitî torpaxa Şahê ecem e.
Heyfa min nayê li kuştina Evdal û Kerem li hewşa Emîr Tûman da bi hêsîrî gidîno
Şahde şihûdê berxê Mala Eshed bavê Elfesiya li dinyayê gelek hebûn

Paşê bi dengkirinê rewşa xwe dibêje. Bi hin peyvan rewşa xwe tîne ziman. Dibêje ax ez delîl im, tişta ku rastîya tiştekî misoger dike. Sefîl û firar e.

Ax delîl im yadê,
Sefil im yabo, ez firar im ax
Ahîî

Dîsa bi bangkirinê berdewam dike. Bekir axa jî rewşa xwe vedibêje, dilê ter, şîrîn û xweş seyran e. Careke din dibêje ku terka Golê nakê, bi sond dayînê ve tîne zimên. Terknekirina xwe wiha nîşanî me dike, heya mêran nekujin, laşê wan nabe qesebxane.

Heseno lo lawo şewitiya Golê bişewite
Ji dilê min û ter a şirîn e hay xweş seyran e
Sibe bû mi dî xort û bendê di Mala Mahmûd Begê
Li derê dîwanê, hê yê li hev civiyane
Min dî Bekirê Axê bi sê denga ba dikirî go Heseno lo lawo
Min son xwarî tu cara terka şewitî Golê nadim
Heya mêra nekujim, cendeka nexim hê yê qesabxanê
Ax delîl im yadê,
Sefil im yabo, ez firar im ax (7)

Kilama Lo Mîro

Kilam li ser Keremê Qolaxasî û Evdal hatîye gotin. Bûyereke civakî û şerî ye. Kilamek sîyasî û dîrokî ye. Kesên ku tê de derbas dibin; Keremê Qolaxasî, Evdal, Eyûbê kurmxwarî, Ferzende, Besra, Ehmê Keko.

Keremê Qolaxasî: Di serhildana 1925an de fermanderekî şervanên Şêx Seîd e. Di dema ku derbasî Îranê dibin, dewleta Îranê daxwaz dike ku çekên xwe deynin, lê Kerem û hevalên xwe çekên xwe danayînin. Leşkerên Îranîyan çekên xwe gir alî wan didin û gelek kes tên kuştin ku Kerem jî yek ji wan e. (8)

Evdal: Evdal kurapê Kerem e. Ew jî li Îranê bi Kerem re şehîd dikeve. (9)

Ferzende; Ji çar lehengên Serhildana Agirîyê ye. Beşdarî Şoreşa Şêx Saîd dibe.(10) Dema hereket têk diçe, Ferzende diçe ser sînorê Îranê. Ji sînor derbas dibin û fermandarên leşkerî yên Îranê dixwazin ku hemû Kurd çekên xwe deynin û teslîm bibin. Ferzende birîndar dibe. Dema ku em li bendên jêr dinhêrin, bangî mîr dike. Mîr Keremê Begê Qolaxasî ye. Ji ber ku îslam tune ye gilî û gazina xwe li hemberî tunebûnê tîne ziman. Ji tunebûna îslamê hatine kuştin. Hger Îslam li îranê hebûya gelek mirov

7- Yıldız, Ayhan & Taşkın, Hanif. Şakiro Kewê Rifat, Nûbihar Yaayınları, 2018, İstanbul, r. 275.
8- Beğik, Mahmud, Reso Şahê Dengbêjan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2018, r. 84.
9- Beğik, r. 84.
10- Beğik, r. 85.

Ji xêra Xwedê ra mizgînxwaza mizgîniyek bida min reberê
Bigotana Mamedê te bi xêr û selametî ji xurbetê vegeriya
Bila şevê payîzê bihata biba mêvanê min keleşê, min seyranê
Welat welat welat welatê me nîne
Dilê min ê kul ê bi birîn, delaliya dilê min ma li welatê jêrîn
Mamedo! Bihar e quling ji Sêweregê
Daniye li ser mêrg û çîmenê mala bavê min gulîkurê
Hêlîna xwe çêkiriye li ser caxa vê merekê
Xwezil ji xêra Xwedê ra, mizgînxwaza mizgîn bida min
Bigota Mamedê tê bi xêr û selametî ji xurbetê vegeriya
Bila şevê payîza bihata biba mêvanê sing û berê min keleşê, çavbelekê welat ax welatê min nîne
Ez çi bikim sebra dilê min ma li welatê jêrîn e (6)

Wisa kilam tê dubarekirin. Keçik jî bêwelat e, quling jî bêwelat e. Keçik bêwelatbûna xwe dişibîne bêwelatbûna quling. Keçik bêwelatbûna xwe tîne ziman. Em jî bêwelatbûna quling ji hêlîna wî fêm dikin. Lê di dawîya beşên kilamê de her car keçik bêwelatbûna xwe û quling tîne ziman. Çimkî hêlîna quling herdem xerabûyîye. Di kilamê du dewr tê xuya kirin. Yekemîn bihar e ya duyemîn jî payîz e. Em di kilamê de evîn, hezkirin, bêwelatbûn, xerîbîyê dibînin.

Heseno

Kilama şer e. Şer di navbera Mala Mahmûd Begê û Heseno de derketîye. Li ser çîyayê bi navê "Golê" de problem derketiye. Dengbêj li ser asêbûna wan ku li ser Golê vê kilamê vedibêje. Bangî Heseno dike. Golê bişewite, ji Bekir axa û Heseno re wek şîr û şekir e. Bûyerê, dengbêj wiha dibêje, sibehekê du xort û benî ye mala Mahmûd Beg li ne tê de bi hevre dişêwirin. Paşê Bekir axa bangî Heseno dike, ti caran dev ji Golê ber nade. Bernedana xwe wiha tîne ziman, dibe heya fermana min ji Enqerê, Şam, Diyarbekir û Helebê heya ranebe.

Heseno lo lawo şewitiya Golê bişewite
Ji dilê min û te ra şirîn e hey fenanî şekir
Sibe bû mi dî xort û bendê di Mala Mahmûd Begê
Li derê dîwanê, hê yê mişêwre kir
Bekirê axê bi sê denga ba dikirî go Heseno lo lawo
Ez tu cara terka şewitî Golê nadim
Heyanî fermana mi ranebe ji Şam û Heleb ji Enqerê ê hêyê ji Diyarbekir

6- Beğik, Mahmud, Reso Şahê Dengbêjan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2018, r. 168.

Di kilamê de hezkirîyê xwe dişibînê berxê sibê. Keçik, lawiko wiha teswîr dike; dibe rengê pora wî sor an jî qehweyî be, paşê dişîbîne gîyayekî xwarinê. Piştre wê destê hezkirîyê xwe bigre li şêx û zîyaretan bigere ji bo daxwazîya wan qebûl bibe. Da ku êdî miradê wan biqedînin. Yanî li gor daxwaza wan bi cih bê, yan jî miradê wan bibe.

Berxê sibe ye delaliyê dilê min lawik e
Fenanî mewija kej a bêdendik e
Ez ê rabim bi destê delaliyê dilê xwe bigrim
Li ser şêxan û ziyaretan bigerînim
Belkî ji ba xwedê da ricakî miradê miradxwazan biqedînin
Bi tevayî miradê min û delaliyê dilê min hasil bikin

Di her sê ristikên dawî de dibêje lawiko, loman nekin ji min, ez sîyeke rihê xwe di rêya wî de feda bike jî ji bo wî pir hindik e, çimkî keçik ji bo wî lawî dikare hemû tiştên xwe feda bike. Evîn û hezkirina ku ji wî lawî dide nîşandan gelekî mezin e.

Lo delalîyo gilî û gazin û loman ji min mekin
Vê sivekê ruhê xwe di rêka te da feda bikim
Ji bona min keçikê pir hindik e (5)

Quling

Quling, temsîla zozan, berî, bêwarî, xerîbî, koçkirin û xurbetê ye. Quling herdem bêwelat e. Di destpêka kilamê de jinekê bangî li Mamedo dike. Ew jina ku bangî Mamedo dike, jê hez dike. Hêlîna xwe li ser dîwanê çêkiriye. Quling hatîye hêlîna xwe li ser mala bavê keçikê danîye û li wir keçik wiha dibêje: Gulîkurê nifira li xwe dike. Hêlîna xwe li ser dîwanê çêkiriye.

Mamedo! quling rabû ji Rewanê
Daniye ser çayir û çîmenê mala bavê min gulîkurê
Hêlîna xwe çêkiriye li ser caxê vê eywanê

Paşê keçik ji quling mizgînîyekê dixwaze. Dibêje quling bila ji min re bibêje Mamedo ji xurbetê bêqeza û bela vegerîyaye. Lê ew daxwazîya jinekê ye ku ji quling dike. Lewra quling wek mirov dihesîbîne, wisa quling li benda mizgînîyekê ku ji mirov re bîne. Paşê dibêje şevê payîzê ji wê re bibe mêvan lê xwe weke keseke kotekî malê keseke din jê distîne û ji bo xwe dibe, bi peyva keleşê tîne ziman. Lê dilê wê bi kul û bîrin bûye, sebeba wê ji ber ku dilê wê yanî Mamedo li welatê jêrîn maye, dibêje:

5-Yıldız, Ayhan & Taşkın Hanifi, Şakiro Kewê Rifat, r. 98.

mijareke hevpar pêk tîne. Di kevneşopîya dengbêjan de lehengên dînî (olî), di lehengên mîtolojîk de erdnîgarîyeke zêde tê bidestxistin, lê belê di kevneşopîya dengbêjîyê de ev tişt bi bajarên Tirkîyê û Sûrîyê ve sînorder e. Mijarên weke eşq, hezkirin, qehremanî, hezkirina welat, êşa xurbetê û... hwd mijarên hevpar ên her du kevneşopîyan e.(4) ji fikrên berhem an jî metnên wêjeyî ku dixwazin bidin me û ji me re vebêjin, naverok tê gotin. Ango bi gotineke din tijîkirina nava berheman e.Yanî mijar, tema, raman, hest, xeyal, bûyer, rewş, mirov, amûr û... hwd. Her tişt dema ku helbest esas bê bidestxistin ji naverokê bêtir têgeha "xwe" tê bikaranîn.

Dolek Bona hizrî û nêrîna dinyaya derve ya estetîka û hunermendî wek hêla şewqa hunermend tespît dike. Û van tespîtan dike; "Estetîka modern di dewrekî wisa de ye ku ji alîyê şiklî-navorekî de nîqaşên mezin hene. Lê belê di sedsala bîstemîn de nêrînên li ser şikl û naverokê, em bi kurtasî bidin nasîn , em diakrin li van sê komadê dabeş bikin.

• Dema ku berhemên hunermendî behsa çi dikin, meriv li ser van gotinan behs bike, naveroka berhema derdikeve holê. Lê mijara ku hatiye behs kirin. Çawa hatiye ziman an jî çawa hatiye îfade kirin, bê pirsîn jî wê çax "şikl" derdikeve holê.

• Naveroka berhemên hunerî, reng, xêz, şikl û... hwd. bêruhên dramatîk, ên dişibin mirovan jî di nava xwe de dihewînin, şikl jî hemû têkîliyên di navbera wesetî, sedemî, hîsinî tîne ziman. Îdiaya vê nêrînê dema ku berhemên hunerî, ên zimanî bûne mijarên sereke, bi vî awayî îfadekirin jî gengaz e; naverok, têgehan re; şikl jî di navbera wan de pergala saz dike û têkîlîyê datîne.

• Naverok, an jî berhemnên hunerî "çi" bûna wan fikr an jî tema ye. Şikl jî di nav berhemê de pêşkêşkirina terz an (rêyan) an jî temayê ye. (Karataş. 2017. r. 215).

Dengbêj dema ku kilamên xwe vedibêjin di bin bandora gelek tiştan de dimînin. Şer, eşq, bêrîkirin, hesret, hezkirina li hemberî Xweda, netewperwerî, qehremanî û... hwd. Tenê ev nîne, aborî jî bandorê li ser dengbêjan dike. Em dikarin ji kilamên wî dengbêjî ve jîyana wan jî bibînin. Carnan jîyana xwe jî dixin kilamên xwe de.

Lawiko

Di Kilama Lawiko de keçik gazî lawekî dike. Keçik di banga xwe de hezkirin, bêrîkirin û êşa xwe li hemberî wî tîne zimên. Dema em destpêka kilamê dinêrin keçik bangî hezkirîyê xwe dike. Destpêka kilamê wisa ye:

Eman werî werî li min ax lawikoo
Lawiko lawiko lawiko oy oy lawikoo

4-Kardaş, h.b, 204.

Peyvên Sereke:

Naverok, dengbêjî, stran, erdnîgarî, tema.

Destpêk

Naverok çi ye? Naverok tê çi wateyê? Di der heqê naverokê de gelek pênase hatine çêkirin û vegotin. "Muhtewa/naverok/mane; di berhemeke wêjeyî de ji peyva pêşîn heta peyva dawîn li ser kîjan hîs û ramanê sekinîye(tema), kîjan bûyer, çavdêrî û mesele yan jî mijara ku li ser ve sekinîye û ji xwendevanan re çi vegotiye" (Kardaş, 2018: 107). "naverok, Ev peyva ku tiştan di nav xwe de dihewîne. Wateya peyvekê yan jî ramanekê." (1) Yanî em ji peyva naverokê: hewandin an jî tê de hebûnê fêm dikin. Di kilam, helbest, berhem... û hwd. Di hundirê xwe de çi dihewîne û tê de çi heye? Dengbêjî li ser hemû mijarên civakî û ferdî tê hêvisandin. Bi giştî li ser eşq, bêrîkirin, mêrxasî, mirin, civak, dîn, gilî û gazinê û li ser demê û mijarên xwezayê jî tê behs kirine. "Tiştên ku ji naverokê bê fêmkirin mijar, şiverê, raman, bûyer, heyîn, hîs, dîmen û wate ye." (Kardaş: 2017. r. 107). Di berheman de mijar, tema û peyamên hatibin xwestin ku bên dayîn naverokê pêk tîne. Naverok, tema û mijara berhemên hunerî pêk tînin. Kardaş, di dengbêjan de naverokê wiha tîne ziman; "Di kevneşopîya dengbêjan de temaya ku herî zêde tê bidestxistin hezkirin û eşq e. Temaya hezkirinê dibe ku bi vî awayî dabeş bibe; hezkirina Xweda û pêxemberan, hezkirina dê û bavan, hezkirina xwezayê, hezkirina cinsî ya hemberî hev, hezkirina welat. Êşa ji dûrketinê, hesreta welat, hesreta demên borî, kêmhêvîbûn, tirsa ji mirinê û ji xurbetê jî bûne mijarên sereke. Mijarên exlaqî, dînî(olî), sîyasî û aborî jî di berhemên dengbêjan de cih girtine." (2)

Di berhemê kevneşopîya dengbêjan de mijara herî zêde tê bidestxistin hezkirin û qehremanî ye. Hezkirin, eşq, şerên di navbera eşîran de, serhildanên eşîran li hemberî otorîteyan, hezkirina welat, êşa xurbetê, hezkirina xwezayê di serê mijarên dengbêjan de cih digrin. Erdîgarî jî bandorê li ser dengbêjan û naverokê dike. Kardaş, li ser erdnîgarîyê wiha dibêje; Cihên erdnîgarî weke zozan, hemû bajarên Tirkîyê, bajarên Sûrîyê, warê eşîran, cihên pîroz jî di berheman de derbas dibin. Di berheman de kesayetên oldar, kesayetîyên mîtolojîk jî dibe ku cih bigrin. Dînê Êzîdî, Xiristîyanî, misilmanî û mezhebên misilmanan; cihên ku bi hev re lê dijîn an navên lehengên cîranan jî di berheman de pir tê bikaranîn. (3) Ji alîyê naverokê ve mijara hevpar a herdu kevneşopîyan e, yek jî mijara hezkirinê ye, hezkirin,

1-muhteva.nedir.org
2-Kardaş, Canser. Aşığın Sazı Dengbêjin Sözü, Eğiten kitap, Ankara, r. 204.
3-Kardaş, h.b, 204.

Di Dengbêjîyê De "Naverok"

Dengbêj dema ku kilamên xwe vedibêjin di bin bandora gelek tiştan de dimînin. Şer, eşq, bêrîkirin, hesret, hezkirina li hemberî Xweda, netewperwerî, qehremanî û... hwd.

Elîf Gûn

Kurte

Wekî ku ji serenavê diyar e em ê di dengbêjîyê de "naverokê" bidin nasîn. Armanca vê xebatê ev e; ku di dengbêjîyê de dengbêj di kilamên xwe de herî zêde kîjan (naverok) vegotiye û li ser sekinîye? Sedemên hilbijartina van kilaman çi ne? Her wiha em dê di destpêkê de li ser çemka "naverok" rawestin. Ji bo mijar baş were fêmkirin em ê hin agahîyan di der heqê naverokê de bidin, û li ser hin kilamên Reso û Şakiro rawestin. Di wan kilaman de herî zêde kîjan naverok ber bi çav e, em dê li sere wan rawestin û wan dahûrînin.

20-Pirtûka Îlyada, Homîros, wergera erebî, çapa duyem, 2008, navenda nişt îmanî ya wergerê

21-kovara elfann a elektronîk, zavayê yonanî yê herî bişens e di hemû dawetên cîhanê de, 25.4.2020 demjimêr 5:30

22- Malpera al-jazirah, Abdilmihsin bin Abdillah el-Madî, 02.05.2020, demjimêr 11:40

23-Malpera Rûsya bi erebî, teqalîd ezzewac fî rûsya, Hîşam Birahîm, 09.05.2020, demjimêr 10:10 êvarê

24- Malpera al-jazirah, Abdilmihsin bin Abdillah el-Madî, 02.05.2020, demjimêr 11:40

25-Kurtenivîsa gotareke di wîkîpedya ingilîzî de 09.05.2020, demjimêr 02:15 p.n

26-Heman jêder

27-Rojnameya Gel a online, raporek 2017 bi navê: Tu çi dizanî li ser qelen li Çînê? Dîrok 10.05.2020, demjimêr: 01.00 sibê

28-Malpera el-medîne news, 08.05.2020 demjimêr 10:00 êvarê

29-Malpera al-jazirah, Abdilmihsin bin Abdillah el-Madî, 02.05.2020, demjimêr 11:40

30-Malpera wîkîpedya kurdî, Zerdeşt, 05.05.2020 demjimêr: 12:30

31-Malpera Mewdûh, ma hîye qewanîn Hemorabî, Îslam Fethî, 20.04.2020 demjimêr 04:00 p.n

32-Dîwana diwem, Sewra Azadî, Şam 1954, helbesta Dezgirtiya Xortan

33- Dîroka Wêjeya Kurdî (Tarîxa Edebiyata Kurdî), FERAMEZ FÎKRÎ ÇEVÎREL, 2019, r.86

34- Encamên Psîkolojîk ên Serboriyên Trawmayê li ser Pêşketina Jinên Kurd ên Koçber li Yekîtiya Ewrûpayê, Weşanên Weqfa Navneteweyî ya Jinên Azad, H.1, sala 2007an, r.54

35-Heman jêder. r.54

Çavkanî:

1-Human evolution, Encyclopedia 07.05.2020 demjimêr 11:30

2-Mûhemmed Esseyid 09.10.2017, www.scientificamerican.com «El-Insan El-Aqil » Aşe qebil 350 elf am - Scientific

3- Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk, Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî De, Abdullah Öcalan, r. 23

4- Abdullah El-Mesrî 13.01.2016, demjimêr 03:15 p.n, www.ida2at.com Hakaza Neşeet Errasmalîye

5-Malpera Mawdoo3.com, ma hîye qewanîn Hemorabî, 01.05.2020 demjimêr: 05:20 êvarî

6- Dîroka Wêjeya Kurdî (Tarîxa Edebiyata Kurdî), FERAMEZ FÎKRÎ ÇEVÎREL, 2019, r. 85

7- Meyada Keyalî, pirtûka Elmeraa we el-alîha el-mûennese, weşanên sazîya Mûmînûn Bîla Hidûd, 2015 r. 24

8-Malpera books.google.iq, tarîx el-fen el-misrî el-qedîm, Mûherrem Kemal, r.282, dîroka temaşekirinê 05.05.2020 , demjimêr 04:50 p.n

9-Xezal El-Macidî, edyan we mûteqedat ma qebl ettarîx, çapa yekem 1997, weşanxaneya Dar Eşşirûq, Emman, Urdin

10- Meyada Keyalî, pirtûka Elmeraa we el-alûha el-mûennese, weşanên sazîya Mûmînûn Bîla Hidûd, 2015, r. 24

11-Wîkîpedya erebî, essedaq fî esseqafat el-muxtelîfe, 05.05.2020 demjimêr 12:15

12-Wîkîpedya ingilîzî, Bride price, 09.05.2020, demjimêr 12:00

13-Heman jêder

14-Peymana nû, EFESÎ 5, 6 Têkiliya Navmalê, r.344

15-El-Xedma el-erebîye lil keraze, Qasim Brahîm, ma mefhûm ezzewac el-mesîhî we şirûtehû

16-Malpera al-jazirah, Abdilmihsin bin Abdillah el-Madî, 02.05.2020, demjimêr 11:40

17-El-mehr fî elîslam, Mûemmer Mixtar/Ebdilxefar, zanîngeha Mekasir a îslamî, 1ê nîsana 2017, r.105

18-Pirtûka Pîroz Quran, sûret El-Ehzab, ayeta 50, r.424

19-Pirtûka Pîroz Quran, sûret El-Nîsaa, ayeta 4, r.77

weke me got jî stûna malbatê jin e, lê nabe ku ew jin girêdayî kevneşopî, asa û hin kultûrên çewt bin ku rehên xwe berdane kûr û dûr û sedema belavbûna wan çewtîyan mîna qelen; yek jê ew e ku kapîtalîzm û desthilatdarî hêmanên sereke ne di mana qelen de bi vî şêwazê ku wan bixwe zivirandine û kirine bin xizmeta xwe, çimkî çi mijara ku tevlihevî û nakokîyê di civakê de çêbike, ew ji desthilatdarî û kapîtalîzmê re mijara sûdgirtinê ye. Hêjayî gotinê ye ku awayê dabeşkirina civakê bi rengê pîramîtê ku jin bû bindest û kole ew rengê herî xerab bû û xala sereke bû ji berdewamîya vê pergalê re, bo mînak di zagonên Hemorabî de ku di pêkanîna zagonê de newekhevî hebû «tevî ku hatîye gotin çav hember çav e, lê ev yek li gor zagona wî di navbera çînan de ne pêkan e, yanî ger miroveke çîn bilind diranê yekî ji çîneke nizim şikenand siza wî tenê pere bûn û ne şikestina diran bû, her wiha ger mêrekî kolejinek kuşt; siza wî tenê pere bûn, lê ger jinek serbest kuşt; beramberî wê keça wî tê kuştin...»33, her wiha desthilata sermayedar rola mezin di hebûna xizanî û belengazîyê de lîstîye ku li nav mirovên xizan jî di gellek boneyan de qelen ji xwe re didîtin weke şansekî ku hem ji lêçûnên keçê rizgar bibin, hem jî hin pere ji xwe re qezenc bikin « Keç ji bo malbatan sermiyan bûn, ji ber ku wan dikarî hatineke aborî ku ji qelen tê misoger bikin»34 Ji bo kesên dewlemend jî qelen bûye cihê xwedîtin û serbilindîyê rewşeke din a qelen heye ku ew jî keç dibû qelen ji birayê xwe ya bavê xwe re di dema berdêlî de. Xaleke din jî ku hebûna qelen hin pirsgirêkên din bi xwe re tanîn mîna bilindkirina nextê keçê ji hêla mirovên wê ve ji ber ku xort ne bi dilê wan e û dibû sedema revandina keçê ji dû nebûna pereyan û di encama wê de bi hezarên keçan hatin kuştin ji hêla xizmên wan ve ku revandina keçên wan şermezarîyeke mezin bû, yan jî ger rewşa keça revandî ji hêla rûspîyan ve bihata sererastkirin; cardin jî divabû xort qelenê wê yekser radestî xizmên wê bike da ku ew arîşe çareser bibe. Lê ya balkêş ku pirranîya jinên ji wan dihat pirsîn gelo qelen kirrîn û firotine yan na? Bersiva wan NA bû û hin dayîk digotin ew heqê şîrê me ye, yan heqê bi salan xwedîkirina me jê re ye.

Di wan salên ku Daişê êrîş dibirin ser kurdan û keçên wan dîl digirtin, anku weke Daiş bi nav dikir li gorî zagonên îslamê (sebîye) û keçên me ji hev û du dikirrîn û difirotin, lê tevî wê jî hê jî li nav gelê me yê kurd qelen digirin û ew jî li gor di vê lêkolînê de dîyar bû ku hema hema ew jî kirrîn û firotine.

Mixabin di roja me ya îro de ku bi dehên salan hin mirov çûne ser heyvê, beşeke mezin ji jinan li çarhawîrê cîhanê hê jî ji azadîya xwe bêpar in û ev bêparbûna ji azadîyê nexweşîyên mîna qelen jî derxistin holê «Dihate gotin, jin wê bi cilên bûkaniyê yên spî bikeve mala mêrê xwe û tenê wê karibe bi kefenekî spî jê derbikeve.»35 Ma wê çilo ew keç bi azadîya xwe hîs bibe û ew hê jî tê kirrîn û firotin, weke wê weke çi metayên li bazarê bin?!!!

ma bera vê kedê jî ji me re neke?"

"Bera ji sibê heya êvarî nigê wê nekeve bin de, ma bi xêra bavê xwe wê ji me re kara bike yabo?"

Bi van gotinên ku car caran em dibihîzin, rewşa qelen di vê roja me ya îro de belî dibe. Balkêş e ku piranî van gotinan bi devê jinan (xesûyan) tên gotin. Tevî ku ew jî rojekê ji rojan di heman rewşê re derbas bûbûn. Lê pêwîst e em baş haydar bin ku mîna van gotinên bav û kalan ne henek in û ne ji valahiyekê di nava civakê de belav in.

Di vê lêkolînê de me hewl da ku ji hin jinedayikên kurdistanî pirs bikin, gelo nêrîna wan di derbarê hebûna qelen de çi ye? Rapirsîn ji 30 jinên kurd re bû, 28 misilman 2 êzîdî bûn, di nav wan de dewlemend û xizan hebûn, temenê wan di nava 30-45 salan de bûn, her wiha 10 xwende bûn û 20 nexwende bûn, li sê parçeyên Kurdistanê (rojava, bakur, başûr) Mêrdîn, Nisêbîn, Qamişlo, Dêrik, Hewlêr û Dihok lê mixabin derfet tune bû ku li parçeyê rojhilat jî çêbibe û pirs ew bû: Gelo qelen hebe ji bo keçê baş e yan na? encama wê rapirsînê bi giştî digotin: Erê baş e. Divê qelen hebe û ew mafê jinê ye, her wiha zêrê wê misogerîya paşeroja wê ye. Lê bi pirranî rewşa qelen ku weke berîya 50 salî ku qelenê bûkê ji bav re bû yan ji bira re bû da ku ew jî şû bibe, ew nema ye. Jixwe nirxê qelen li hersê parçeyan bi giştî pirr bû, lê her ku herêm dewlemend bû êdî qelen jî bêhtir bû.

Qelen di wêjeya kurdî de:

Wêjevanên kurd hewl dane ku kirasekî din li qelen bikin û ji bo rizgarkirina welat be. Kurdistan bûk e û ji bo qelenê wê jî divabe xwîn bê rijandin.

«Xemlandî me seranser dezgirtiya xorta me Gerden sêvek sor û zer , li hêviya merda me

Qelen xwîn e ne gewher, Kurdistana kurda me Bê tang û top û leşker , îro we ez berdame

Kurdistana delal im , herkes tê min dixwazî Ez pir şox û şepal im, min deng daye bi nazî

Ev bûn bîst û du sal in , li ser min cengebazîKurdo wer min bixwaze, belê bi serfirazî, Cegerxwîn»31

Feramez Çevîrel ji bo welat wisa dibêje: «...Çimkî damezirandina dewleteke bi serê xwe, wekî anîna bûkekê ye: Dibê ev dinya wekî bûkekê ye her kes ji xwe re bûkê dixwaze, hukumranî û selteneta wê jî di destê şûrê rût de ye, kî xweyê wê hêz û quwetê be, yanê kî xweyê çek û rextan be wê ji xwe re bûkê bibe, yanê ji xwe re welatekî çê bike. Hem jî divê qencî, camêrî, bexşîn, qelenê heqê mehrê yanê divê aboriyeke baş jî hebe û cihê bûkê jî hebe, …»32

Encam:

Di encamê de mirov dikare bibêje ku tovika avakirina civakê malbat e û

demê û piştre ku derketina li hemû olên mazin ên yek-xwûdayî jî bûya. Têgihiştina qancî û xirabiyê li gor wê têgihiştina dûalîzma Zerdeşt, li wan bûya» 30

Lê em li dîrokê vegerin di vê dema bawerîya bi Zerdeşt de weke pêxember û xwedî pirtûkeke pîroz; em ê nas bikin ku di warê pêkanîna rêdarî û perspektîfên vî mirovî de guhartin û veguhartin çêbûn; çi di şêweyên wî yên jîyanî û çi jî di alîyê Avestayê de jî. Dibe ku ev yek jî vedigere gellek sedeman mîna sedemên dîrokî, xaknîgarî, çandî, rê û rêbazên jîyanî yên temenê wan vedigere qonaxa Someran (3000 sal B.Z) ku pirr zehmetî bi xwe re afirandin û dibûn kelem li pêşîya van rêdarîyan û pêkanîna wan. Bi rengekî bêtir vekirî; mirov dikare bibêje: Çendî Zerdeşt hewl daye ku vê hişmendîya xerab biguherîne ku bi pêvajoya avakirina şaristanîyên desthilatdarî, arîstokrasî û koletîyê re derketîye holê, lê tevî wilo, vê hişmendîyê berdewam kir û ji ber ku berdewam kirîye; ev rewşên civakî jî mîna qelen berdewam kirine.

Mijara qelen ji mijarên herî girîng in ji ciwanên Kurdistanê re ên ku dixwazin şû bibin. Û ên em bibêjin ku rêjeyeke mezin ji wan çi keç bin çi xort bin bi dest wan nakeve. Çimkî qelen her dem mîna kelemekê ye di devê rêya wan de û yek ji pirsgirêkên civakê yên sereke ye. Ta ku ew qelen peyda dibe ji alîyê malbatên xizan ve; çavên wan derdikevin ji bo wê piştî şûkirinê em di civaka kurdî de axaftinên bi van şêwazan dibînin:

"Me perekê xwe tê de dane yabo!"

"Me komek pere tê de dane yadê,

gişti em dibînin ku nirxê qelen li herêmên rojava bilindtir in ji herêmên rojhilat û başûr, her wiha nirxê qelen li herêmên gundewarên çîyayî bilindtir e ji yên bajaran»27 , loma ji bo ku li Çînê di cihên ku hejmareke mezin ji nişteciyên êlên xizan heye; divabe şûkirin her wiha hejmara zarokan jî were kêmkirin, mercekî zehmet ji bo şûkirinê heye «ger mêrekî xwest ji keçê şû bibe û ferwer li ser erê kir; pêwîst e ew mêr du kg ji mêşan werîne ji bo parastina derdorê, êdî ew xort û xizmên wî wan mêşan didin hev ji sergoyan, an jî şêranî li ser daran datînin da ku mêş lê kom bibin û wan bigirin.»28 bi xêra ew mercê zehmet hewl didin ku ji bargiranîya lêçûnên malbatê rizgar bibin. Careke din gelo ta çi astê ev kiryar mafê hem jin hem jî mêr binpê dike?

Rewşa qelen di civaka kurdî de:

Gelo dîroka qelen di civaka kurdî de vedigere kengî û di roja îro de bi çi rengî ye?

Di zimanê kurdî de ev peyv bi çend şêweyan tê bikaranîn, lê ya balkêş ku li gor etîmolojîya van peyvan di ferhengên kurdî de ku dîyar dikin ew ji zimanê erebî, tirkî û farisî anku; ne bi kurdî ne, jixwe ev rewşa nepeydabûna peyvekê di zimanekî de ew e ku di warê pratîk de nebûna peyvê mîna zimanê kurdî yê kevnar dîyar dike ku qelen nebû da ku peyvek jê re bê terxandin. Hin peyvên di kurdî de hene bo mijara me ev in: qelen, qelend, next, nexd, mehir, mar, cihêz, cîyaz. Tenê peyvek heye ku ew jî şîrbayî ye. Ew jî ji du peyvan e, şîr + bayî û li gor wîkîferheng peyva bayî firoşer e, ku ew jî dibe ku nîşana firotina şîr e ya dayikbûna jinê ye. Weke dîyar bû ku qelen di rewşa xwezayî de weke yadîgarekê bû û ji ber ku kurd ew ji nişteciheên kevnar in ên Mezopotamyaya Jorîn êdî ev çand li nav kurdan belav bû; anku çanda nêzîkatîya ji Xwedawenda Siruştê ya ku bêyî wê ew siruşt berdewam nake û namîne, ji ber ku pirrbûn û berdewamîya mirovan tenê di destê wê de ye. Çimkî li gor gellek lêkolîneran bi hezarên salan ew bawerî di nav mirovan de hebû ku tenê jin a ku zarokan tîne û bêyî ku destê mêr jî tê de hebe.

Di dema belavbûna bawerîya Zerdeştî de jî ya ku li gor di Avestayê de hin mijarin jîyanî yên sereke tê de dîyar bûne, mîna wekhevîyekê di navbera jin û mêr de, her wiha şûkirina bê dilê jinê qedexe kirîye; vê yekê bandor bi awayekî erênî li qelen jî kir. «Persan di dema Zerdeşt de cihekî cîyawaz ji jinê re pesend kiribûn. Ku jin bûbû xwedî mal û mewdan, cihê hevserê xwe digirt û rêveberîya samanên wî dikir» 29

Dibe ku bandora van ramanên Zerdeşt li olên pey xwe re kiribû û vê yekê di warê mafê jinê jî xuya dikir ku her dem ji mijarên sereke bûn di pirtûkên pîroz de «...bandora hizrên Zerdeşt, bi teybetî, weke pêşketina

kiras, pêlava bûkê û text bû. Jixwe ev kevneşopî ta roja îro jî berdewam in «...ji bo em bizanibin zavayê yonanî çi qas bişens e, tenê em bibêjin ew qelenê bûkê nade, lê belê bûk û xizmên xwe divê qelen bidin...»21

Rûsya: Ew jî mîna pirranîya welatên cîhanê di rojên heyî de cudabûn ji demên berê heye «Di dema berê de ji bo jina berzewac bi nav dikirin «Konka» û ew ji navê ajalekê bi navê «Kona» wergirtîye ku ji bo çermê wî dihat girtin.. û ji bo xwestinê bavê zave serdana bavê bûkê dikir û bi vê hevokê axaftina xwe dest pê dikir «bikirrek me heye û metayek we heye.. gelo tu yê metaya xwe bifiroşe?»22 piştre herdu bavan bazara qelen dikirin heya ku bigihaştina lihevkirinekê. Her wiha divabû di roja dawetê de jî beşa dawî ji qelen bide, lê ya balkêş ew bû ku qelen vê carê ji keçên hevalên bûkê re bû «...zave li gor vê kultûrê dest pê dike ku dîyarîyan dide hevalên wê da ku rê li ber çûna hevala xwe vekin. Û pirranî zave di çend têstan re derbas dibû li gor rêûresmên qurbanîyê ku divabû ji nav çend keçên bi mask bûka xwe nas bike»23

Hindistan: Keçên malbatên xizan ji dû kultûra li welatê wan, ku li şûna qelen zave bide êdî bavê bûkê dida yan jî keçê ji mîrateya xwe dida û ji bo wê ew ji şûbûnê bêpar dima «Li Hindistanê hê jî ew kevneşopîya berê ye ta roja îro, ku jin qelen bide mêr, berevajî hemû civakên din.. û li cem hin mezhebên wan ger hevser bimira; jin bi hevserê xwe re dihat sohtin»24

Welatên Afrîka: Bi gelemperî li welatên Afrîka qelen heye û tê binavkirin buhaya jinê. Li nav gellek êlên Afrîka buhaya jinê çend sewal in û ji ber tunebûnê car caran xortê berzewac wan sewalan didize û ji xwe re dike qelen. Di nav hin êlên Afrîka de hê keç zaro ye bavê zave qelenê wê hino hino dide heta ku mezin bibe, her wiha hin bav keçên xwe didin mêr û ew hê temenpiçûk in, tenê ji bo qelenê wê qezenc bikin û mesrefa wê bibe di sukra mala zavê de. Lê ya herî dijwar ew e ku bûk were berdan divabe qelenê zave lê vegerîne û ev yek jî pir arîşeyan bi xwe re tîne mîna ku jina berdayî heger qelen ne li cem wê yan malbata wê qelenê mêr hebe û li hin welatên Afrîka di vê rewşê de ew jin dikeve zindanê û ji bo vê rewşê gellek caran jin digel wî hevserê jîyana bêdilî xwe berdewam dikir ji dû qelen. Jixwe pirranîya van welatan merasîmê şûkirinê li kilîsê naçin serî, ger qelen neyê dan.25

Çîn: Di tevahîya Çînê de qelen weke kevneşopîyekê ye. Ji sedên salan ve berdewam e «rojeke meymûn tê bijartin da ku zave digel xizmên xwe biçin keçê bixwazin û li ser qelen jî li hev bikin û ew qelen roja dawetê tê dan û car caran zave roja dawetê ji bazara ku li hev kirine bêhtir qelen dide da ku camêrîya xwe nîşan bike»26, lê ya balkêş encamên ku rojnameya Gel gihaştibûyê, ku berîya çar salan nexşeyeke grafîkê li çarhawîrê Çînê çêbûbû û tê de dîyar bûbû her ku herêm belengaz be, qelen buhatir e. «… bi

Li gor îslamê ku Quran û Sinneta pêxebmer Muhemmed dibêje, her wiha herçar mezhebên wan (şafihî, henefî, hembelî, malikî) li ser naveroka wê li hev dikin; qelen pênase dikin ku ew qasa pereyên ku li ser zave tê sepandin, lê ew qas ne giran be ku barê zave giran bike, yanî ya girîng dilxweşkirina bûkê ye ku Xwedê bikim du gustîl bin. «…mehr mafê ku divê mêr weke dana Xwedê bide jinê yan mîna dîyarîyekê ku divê mêr bide, ji bo ku ew girêbest zelal be, hem jî ji bo cihê jinê yê cîyawaz û rêzgirtina ji jinê re ye…»17

Jixwe ew qasa pereyan divabe berîya ku jin û mêr şû bibin bê dan. Lê ne Quranê û ne jî Sinnetê (axaftinên Hz. Muhemmed) di derbarê dema dana beşek ji qelenê ku piştî berdanê tê dan de li ser axivîye û ew li gor fitûya zanyarên ola îslamî dîyar kirine ku dibe bê dabeşkirin; beşek berîya şûkirinê û beşa din heger berdan çêbibe.

Di misilmantîyê de weke ku Quranê çend rewşên qelen zelal kirine, çi wergirtina wî be yan dana wî be û demekî di Quranê de hatîye gotin nexwe divê mêr qelenê jinan bidin, nexwe çare jê nîne û di belgeyekê de tê çespandin, ji bilî Hz. Muhemmed ku ew mafdar bû bê qelen jî ji jinekê şû bibe «... û jineke bawermend be ku xwe bexşî pêxebmer ger pêxember xwest jê şû bibe, bê tiştek dibe jê re, ne weke bawermendên din {Ehzab 50}»18.

Quranê zelal nekirîye gelo ew qelen (sedaq) çi qas e? Lê di Sinnetê heye ku qelen giran nekin.

Lê Quranê gotîye ku qelen ji mafê jinê ye û ne tu kesê dine; anku ne ji mafê zave ye yan jî mafê xizmên bûkê ye, ew tenê ji mafê bûkê ye. Ger bi qîm û reza xwe bide hevserê xwe yan xizmên xwe û bêyî ku fişar lê bibe, wê çaxê gengaz e. «Bi nermî qelenên jinan bidin wan, heke ew bi dilxweşî tiştek jê didin wê, li we xweş helal be {Nîsaa 4}»19, di heman Sûreta Quranê de hatîye gotin ku dibe mêr ji du, sê, çar jinan şû bibe digel wan jinên ku dest danîne ser wan (mebest jê; ew jinên ku di encama şerê bi gawiran re dîl dihatin girtin û li mêrikên misilmanan dihatin parkirin).

Hin rewşên qelen li çend welatên cîhanê

Yonanistan: Li Yonanistana kevn li gor hin girêbestên ku di Îlyada û Odêsa de dîyar bûye, qelen hebû. Di her demekê de ev rewş cuda dibû ku bandora şer û aştîyê jî her dem li qelenê jinê hebû, her wiha qelen ji alîyekî ji jina serbest re hebû û ya kole re jî hebû, lê erêkirina bavê bûkê yan xwedîyê wê tiştekî sereke bû.

«Di Îlyada de Axîlis soz dabû ku dibe ew bûkê bibe û bêyî ku buhaya wê bide. Di Odêsa de Xwedawend Afrodêt bixwe ku hevserê wê Hîfaysto dê gefan li bavê wê bixwe da ku qelenê bûkê li wî vegerîne, ji ber ku ew gander e»20 lê hin çavkanî dibêjin ku jinê divabû qelen bide û qelenê ji mêr dihat xwestin tenê du gustîl,

qelenê wê keçê bide bavê wê ku 50 zîv in û divê ji wê keçê şû bibe û nabe wê berde ta sax be û ger bavê keçê nexweşt keça xwe bide wî xortî cardî divê zîvê nirxê qelenê keçikanî bide bavê wê»12, ya balkêş di vir de ku ew keça ku ev zîyan lê hat, ma gelo wê bixwe çi sûd girt ji van sizayan? Ji ber ku di herdu rewşan de sizayê li xort tê birrîn ew dana zîv e û yê wan zîvan jî werdigire bavê keçê ye. Tenê ew keça hejar an ji yekî şû bibe ku deştdirêjî lê kirîye yan jî bimîne li mala xwe û bavê wê qelenê deştdirêjîkirina wê ji xwe re bibe. Di serdemên kevn de û di rêya hin haxaman re rewşa qelen piçekî li ser zave sivik kirin ku ew dikare piştî şûkirinê jî tiştê ji qelenê bûkê maye bide û ev yek di rêya girêbesta Katûba re bû «haxam rijd bûn di serdemên kevn de ku girêbesta şûbûnê hebe da ku bûk û zave şû bibin…»13

Qelen di mesîhîyetê de: Di Încîlê (Mizgînîyê) de derbarê mijara qelen de tiştek nehatîye dîyarkirin, lê di peymana nû de anku Încîl û di çend boneyan de tekezî li ser rewşên şûkirinê hene û dibe ku ev tekezî weke misogerîyekê ji jinê re ye ku jîyana li hezkirinê ava bûye; ew bingeha jîyana aram û şad e. Lê tevî wê jî em dibînin ku di derbarê şêwazê vê jîyanê de mirov rewşine wisa dibîne « 22Ey jinno! Wek ku hûn bi ya Xudan dikin, wusa bi ya mêrê xwe bikin. 23Çimkî çawa Mesîh serê Civînê ye, mêr serê jinê ye û Mesîh bi xwe Xilaskarê Civînê ye, yanî bedenê ye. 24Îcar çawa ku Civîn bi ya Mesîh dike, bila jin jî bi vî awayî di her tiştî de bi ya mêrê xwe bike»14.

Rast e ku ji bo şûbûnê axaftin li ser qelen di Peymana Nû de tune ye, lê di Peymana Kevn de hebû weke hat dîyarkirin di Tewratê de, her wiha di warê pratîk de qelen li nav xiristyanan hebû û ji bo vê yekê jî du teorî hene û yek jê dibêje ku xiristyanan di warê mijara qelen de li gorî Tewratê ev rêûresm pêk tanî û ya din dibêje ku li gorî kevneşopîyên li welatê xwe û devera xwe qelen dibirrîn.

Ev rewşa dana qelen a li gor prensîpên cihûtîyê bi sedên salan li nav xiristyanan dom kirîye, lê bi zagonekê ji hêla desthilata olî û sivîl ve di Împeratorîya Romanî ku dawî lê anîne.

«-dibe ku hin mercên taybet di navbera herdu alîyan de hebin ji bo xanî û mobîlya û ji bilî wan ku tiştin din hebin ku ji wan re girîng in. Tê zanîn ku car caran xort û keç bi hev re alîkar in. Ya hewceyî gotinê ye ku tu qelen bê dan ji bûkê re yan ji xizmên wê re tune ye.»15

Qelen di misilmatîyê de: Berîya ku mirov qelenê bûkê piştî îslamê zelal bike, pêwîst e rewşa qelen di nava welatên Hîcaz de bîne zimên ku îslam li wir derket. «Ereban li qelen dinêrî weke buhaya jinê bû û bi nav dikirin (nafîce).. û qelen hejmarek hêştir bûn ku dergîştî ew dibirin ber konê dergîştîya xwe.. û hejmara wan hêştiran li gor xweşikbûna jinê û nirxê xizmên wê ye.. û hatîye gotin ku xizmên jinê tiştek ji qelenê wê nedidanê…»16

Pêwîst e em ji bîr nekin ku di rewşên şer de jî dema ku jin dîl dihate girtin qelenê wê hebû, lê bi şêwazekî din ew qelen dihat dan, ku li bazarine taybet bi dîlgirtinê dihate firotin û di demên berê de ew jin li wê bazarê li ber zilam şûtî rût pêşkêş dibû û zilaman weke metayekê ji xwe re hildibijartin, cardî jî her yek ji wan nextê wê cuda bû û ew jî li gor ciwanî, xweşikbûn û êla wê keçê dihate nirxandin. Her wiha ya ku herî xweşik bû, ew para mezinê êla ku ew keç lê dîl dihat girtin bû. Ev rewşa dîlitîyê bi gellek rengan dihat binavkirin mîna cêrî, bermalî û sebîye...hwd, weke peymanekê dihate nivîsîn di navbera yê ku wan difiroşe û yê ku wê jinê dikirre. Tevî ku ol û bawerîyan hewl didan bi hin ferman û prensîpan bi jinê re alîkar bin, lê nikarîbûn kevneşopîyên civakê derbas bikin ên ku baviksalarîyê ew di hişmendîya wê civakê de çandine û meyandine. Me xwest vê yekê bînin ziman ku ji gava qonaxa baviksalarîyê dest pê kirîye ve û ta qonaxa kapîtalîzmê jî, her dem jina serbest hebû û jina kole ya ku li bazaran dihat firotin û zagonên taybet ji bo firotina wê dihatin nivîsîn, çi ji bo wê be yan zarokên jê çêbibin di paşeroja wê de.

Di vê beşê de ji vê lêkolînê em ê hem li ser rewşa qelen di olan de, hem jî di hin welatên cîhanê de biaxivin, ka gelo bi çi hawî bi rê ve diçin?

Qelen di cihûtîyê de: Di ola cihûtîyê de qelen heye û nabe ku şûbûn pêk were ta ku qelenê bûkê ji alîyê zav ve neyê dan. Çi bi awayê peredayîn an saman be yan jî xizmeta zave di mala bûkê de ta demeke nîşankirî ji alîyê bavê bûkê ve. Ya ku rewşa qelen û hebûna wî di cihûtîyê de sepandîye jî ku çîroka wê ya Hz.Mûsa di Tewratê de heye, hem jî di Quranê de heye (ji bo vê yekê du çîrok hene yek jê di Quranê de ye û ya din di Tewratê de ye. Tewrat dibêje piştî ku Mûşê bihîstîye bi fermana kuştina wî ji Misrê, direve û ber xaka Medyanê ve diçe. Dema ku li ser bîrê ye heft keçan ji şivanan diparêze û pezê wan dide avdan û ji bo vê camêrîya wî bavê keçan ê bi navê Raoyîl-kahinê Medyanê yek ji keçên xwe didê, ya bi navê Safûra û Mûşê jî şivantî kir ji kahin re û li Midyanê bi cî bû. Lê li gor ku di Quranê de hatîye, Mûsa berê xwe daye Medyen û li ser avê du keç dîtine ku avê danagirin, êdî ji wan dipirse çima hûn danagirin? Dibêjin bavê me pîremêreke nikare bê ser avê û em jî li hêvîya şivanan e ku dagirin û piştre em ê dagirin, êdî Mûsa ji wan re avê dadigire. Di encamê de bavê wan jê re dibêje ku ez ê keçeke xwe bidim te û qelenê wê heşt salan xizmetê ji min re bike; anku şivantîya pezê wî ye).

«Jixwe di kiryarên şûbûnê de divabû malbata bûkê beşek ji paşmayê xwe dîyar bikira ku weke qelen bê dan û ji bo wê yekê hebûna keçê di malbata cihû de dibû bargiranîyek ji bavê wê re, ku ew qelen dibû ji mafê zave tenê, di dema ku ne ji mafê bûkê bû tu tiştî bike ji qelenê xwe»11

Her wiha di Tewratê de ji bo qelen ev jî hatîye dîyar kirin «ger xortekî bi zorê keçek ji keçikanî xist, divê

berdewam kir.

«…pêşkêşkirina qurbanîyan ji Xwedawenda Mûsim re "Rinnûtit" spas ji te re: Ku tasek av ji Xwedawendê re dihat pêşkêşkirin da ku vexwe, di jora wê de gurzek simbilê genim û qeseleya wî wek qurban li pêşîya Xwedawendê bû…»8

Di vir de pirseke pirr balkêş tê bîra mirov, gelo ew cihê taybet û cîyawaz ku jinê bi hezarên salan girtibû, çawa zivirî û mêr hino hino ew cihê pîroz jê wergirt û ew bû serwerê cîhanê?

Ji bo vê mijarê hin teorî hene ku ji bo wê di nava dîroknasan de weke lihevkirinekê di derbarê wê de heye ku ew jî vedigerînin naskirina zilam ji maden re, ya ku jê re bû alîkar di çandinîyê de û dûrketina wî ji nêçîrê re, her wiha geşkirina berhemên xwe û di demên pêş de bû xwedî sermaye jî.

« … lê pêdivîya çandinîyê bi kedeke bêhtir hebû ji bo cot û çinînê û di vir de rola mêr mezintir bû û gellek nîşan çêbûn ên taybet bi Xwedawendê bav, lê zivirandina rastînî çênebû ta naskirina madenên ku zilam çandinîyek layiqî hêza xwe kir, ew jî madenê ku ji zikê erdê derxist bû û gellek alavên xwe pê çêkiribûn.»9

Ev çanda yadîgarê di dîrokê de domand ta dema despêkirina avakirina şaristanîyan, ku weke me destnîşan kiribû bi avakirina şaristanîyan li Mezopotamya û despêkirina desthilatdarîyê di rêya avakirina bajêr re, ku di destpêkê de li Mezoptamya Jorîn (Til Xelef) û Mezopotamya Jêrîn (Somer) bû û di encama wê yekê de rêveberîya jinê ya bi hezarên salan dawî lê hatibû, civak bûne çînên cuda ji serwer û koleyan û awayên desthilatdarîya vê civakê di dergehê reşkirina jina pîroz re hat xurtkirin ku ew ji asta xwedawendîyê daxistin asta koletîyê, ne wilo tenê; ew bû yek ji sermayeyên mêr, êdî ew azadîya jina pîroz winda bû û pê re jî çanda yadîgarê hate guhartin; bê çawa jin bû kole, yadîgarî jî bû qelen û buhaya koletîya wê, ku di rêya qelen re jin tê kirrîn û firotin. Ji bo wê ji desthilatdarîyê re mijara yadîgarîyê mijareke pirr girîng û biwate bû û her dem di hewldana guhertin û zivirandina yadîgaîyê de bû û ji bo wê yekê gellek şêwaz û têgînên nû lê bar kirin mîna qelen, nexasim ku mêr di wê demê de bûbû Xwedawendê zemîn û ezman herduyan û pêwîst bû ku civak jê re kole û stûxwar be, her wiha nedibû gotina wî li erdê bikeve.

« … ew rahîba ku rêûsema cinsî ya pîroz, weke xizmetên ayinî bexş dikir di bin sîya Xwedawendan de dê bibe qehb, cinsîya pîroz dadigere cinsîya bazirganî /qehbitî/, dîyarîya bûkê dadigere buhaya bûkê û samanên ku bavê bûkê pêşkêş dike ji bo parastin û xurtkirina statûya wê ya aborî û xweserîya wê dadigere dîyarî, mêvandarî û firavîn di roja daweta wê de»10

Bi domana demê re ew qelen di civakê de bûbû weke pîvanekê ji nirxandina jinê re, yanî keça dewlemend, keça mîr, keça axe û began, her wiha keça spehî û bedew qelenê wê jî giran bû; lê keça xizan û nexweşik dê qelenê wê jî li gorî xizanî û nexweşikbûna wê bûya.

de peyva mehir hatîye pênasekirin ku ew peyv jî di koka xwe de ibrî ye û ew tê wateya (buhaya jinê) ye. Wisa pênase dike:«Mehir: Qelenê bûkê. Nirxê ku ji berdêla bûkê re tê dayîn»6

Jixwe di warê pênasekirina qelen de me xwest em nêrîna hejmarek jinan jî bigirin (10 keçên xwende bûn, temenê wan di nava 18 û 25 salan de bû) ka çawa vê mijarê pênase dikin.

- Qelen ew pereyên ji alîyê zave ve tên dan ku ji bo şûkirina bûkê ye.
- Qelen tiştekî heyberî ye û pêwîst e hebe ji ber ku ew kevneşopîyeke û ger qelen nebe qîma xizmên bûkê jî nayê.
- Qelen kevneşopîyeke.
- Qelen ew pereyên ku tê dan ji bûkê re dema şû bibe.
- Qelenê jinê ew nirxê wê ye, lê nirxê wê yê rewanî ye. Ji ber ku di roja me de nirx bi tiştên heyberî tên pîvankirin, çi pere yan zêr û gewher be. Ger ev tune bin, nirxê rewanî jî tune
- Qelen dabeke kevn e û dîroka wê bi şûkirinê re girêdayî ye.

Ji van wateyan em fêm dikin ku ew zilamê xwedîyê wan pereyan dibe xwedîyê wê jinê, û di encama vê de dibe mafdar di pêkanîna hemû kiryaran de, yanî ew jin û zarokên wê di paşerojê de, zilam dikare ji wan re bibêje bimirin bimirin, rabin rabin û wisa hatîye naskirin û jixwe jina ne bi vî rengî be anku hemû xwestek û daxwazên zilam bi cî neke û di çi rewşê de be ew jin bila bibe; nexweş, westîyayî, xemgîn be yan jî kela havînî, çileyê zivistanî be; ew ne jineke dirust e û nanê wê li mala hevserê wê namîne.

- Pênaseyeke din ji qelen re heye; ku ew weke yadîgarekê ji jinê re yan jî ji xizmên wê re ye.

Lê hêjayî gotinê ye ku ew yadîgara ku digihêje xizmên jinê dibe weke kirrîn û firotinê, ji ber ku ta demeke ne dûr; piranîya xizmên bûkê qelen dixwarin û ew pere li xwe pehr dikirin, yanî ew qelenê qaşo ji bo ku bûk pêdivî û zêr pê bikirre; radestî bav an bira dibû û wan jî bi xêra xwe hin ji van pereyan dê bidana bûkê yan jî nedidanê, tenê dihate gotin mala bavê bûkê qelenê wê giş xwarin. Jixwe di hin rewşan de roja ku qelen dibirrîn dihate gotin hûnê keçê rehel bikin û ev qasa pereyan jî hûnê bidin birê bûkê.

Lê divabe em bizanin ku dîroka vê yadîgarîyê li Mezopotamya pirr kevnar e û vedigere serdema Neolotîkê, ku jin weke Xwedawenda Jîyanê dihate dîtin û ji bo ku mêrek bikaribe nêzîkatîya vê Xwedawendê bike; pêwîst e yadîgareke xwedî nirxine pîroz hebe, da ku ew jina pîroz bi nirxin pîroz were pêşwazîkirin. Jixwe yadîgarên wan di wê demê û wî cihî de xwedî nirx bûn di wê civakê de mîna genim.

« …û dibe ku koletîya ji Xwedawenda jin re, ji dû cihê wê yê cîyawaz ê jinê di wijdanê mirov de ku girêdayî biberbûn û geşebûnê ye,…»7

Hin rewşên nêzî rewşa Mezopotamya ku li Misrê jî li genim dinêrîn weke heybereke pîroz ku ji Kevana Zêrîn, li Ewrupa, bakurê Afrîka û rojavayê Asya belav bû û ev pîrozîya genim di Misra kevn de

Pêşveçûna kapîtalîzmê

Kapîtalîzm weke pergal, ew encama pirrbûna bilez a pereyan bû, ku ew sermîyan û sermaye li bazaran ketin ser hev de, di wir de pêwîst bû ku pergalek hebûya, da ku van diravan bi rê ve bibin. Di demên pêş de bû pergaleke aborî xwedî felsefeyeke civakî û sîyasî ye û hin aborînas dîyar kirine ku awayê derketina pergala kapîtalîzmê bi vî şêwazî bû:

"Di çerxa 18emîn û 19emîn de kapîtalîzma anarşîk bi cî bûbû, di dema ku kapîtalîzma pîşesazîyê dest pê kiribû ku derkeve holê. Ew jî di wê dema ku projeyên wê yên kapîtalîyê dom dikirin, lê bê ku serdestî û kontrol ji hêla dewletê ve, yan ji hêla sazîyên kedkaran ve hebûn. Qonaxa duyemîn a pêşveçûna kapîtalîzmê di nîvê duyemîn a sedsala nozdehan de dest pê kir, di vê de pêşbazî hate sazkirin û rola dewletê di aborîyê de zêde bû".4

Dema ku em dibînin ev têkilîya di navbera kapîtalîzm û desthilatdarîyê de xurt dibe û li gellek deverên cîhanê hema bibêje ku dibin yek parçe, bandora vê yekê li hemû aliyên civakê dike ku babeta qelen jî ji vê pergalê re cihê ku jehra xwe berde nava wê.

Taybetîya herêma Mezopotamya

Taybetîya herêma Mezopotamya di dîroka mirovahîyê de pirr xwedî nirx e. Li vê herêmê şoreşa zanistî ya yekemîn li dar ketîye û ew jî şoreşa zimên bû, ya ku mezintirîn şoreş di dîroka mirovahiyê de ye, çimkî ev şoreşa zanebûn û rambûnê bû û bi kurtasî ew destpêka xwenaskirina mirov ji xwe re û ji yên derdora xwe re bû û ger em wan hezarên salan re berhev bikin, em dê bibînin ku pêngaveke pirr mezin û cuda ye. Her wiha şoreşa duyemîn jî ku şoreşa çandinîyê bû. Jixwe ev şoreş bi rêveberîya jinê bû ku wê çaxê mêr nêçîrvan bû û jin têkildarî çandinîya destpêkê bû ya ku keda mezin jê re ne pêwîst bû, ku berhem tenê li gor pêdivîya malbat an êlê bû, her wiha jin jî hêza wê ya fîzîkî ji jina îro bêtir bû.

Li gor belgeyên ku ji hêla lêkolîner, civaknas û dîroknasan; dîroka qelen (anku dema ku ji rewşa xwe ya xwezayî weke yadîgarî û zivirî dirav û sermaye) ya ku bi awayekî fermî bûbû weke girêbesteke nivîskî di navbera bûk û zavê de, ew vedigere berîya 5000 salan, anku dema Somer û heta dema Babil e, ku ji bo vê girêbestê zagon hebûn û li gor wê zagonê tev digerîyan. Weke mînak zagonên Hemorabî ku li ser qelen axivîye û tê de hatîye gotin ku «Heger jin bimire û zarokên wê hebin qelenê wê ji para zarokên wê ye, ne ji bavê jina mirî re ye...» 5. Jixwe dema em li ser şaristanîyan diaxivin tê wê wateyê ku jîyana gund ber bi jîyana bajêr ve diçû ya ku ji Til Xelef dest pê dike, di heman demê de despêka desthilatdarîya baviksalarîyê ye jî.

Mirov dikare qelen ji dema Somer û Babilan ve û ta roja me ya îro bi çend şêwazan pênase bike:

Di pirtûka (Tarîxa Edebiyata Kurdî)

mirovan ve û li gor teorîyên curbecur; zanyar dîyar dikin ku axaftin di nava 50,000 -70,000 salî de dest pê kiriye û berîya vê demê bingeha pêwendîyên mirov li ser sembol û wêneyan ava dibûn, digel hin dengên mîna qîjînê. Jixwe dema ku em dibêjin mirovê axêver, tê wateya pêşketina hiş û bîra mirovahîyê. Mebesta me ji dîrokan ew e ku, ya yekem û li gor zanyarîyên heyî; temenê hişmendîya mirovahîyê li gor temenê hebûna mirov li ser rûyê cîhanê pirr hindik e (parçeyên ji qerqodeya fosîla Lûsî ya ku temenê wê vedigere 3.2 mîlyon sal) û ya duyem awayê leza vê pêşveçûnê ku li gor hebûna mirov derengî heye û ya herî girîng ji vê lêvegerê dîyarkirina dirêjbûna temenê mirovahîyê di rewşa xwezayî de.

Desthilatdarî û qelen

Ji her kesî re zelal e ku mijara desthilatdarîyê mijareke bi dehên salan cihê lêkolîn û gotûbêjan e. Ew desthilatdarîya ku encama pergaleke ya bi hezarên salan ji alîyê mêr ve rûniştî û bicîkirî ye, ku hino hino pergala dayîksalarî ber bi pergala baviksalarî ve çû. Ew baviksalarîya ku yek ji armancên wê yên sereke wergirtina rêveberîya civakê ji destê jinê û sixurandina siruştê li gor berjewendîyên xwe bûn. Ji bo ku baviksalarîya desthilatdar bikaribe jin û siruştê bindest bike, divabe hemû mijarên girêdayî jinê jî bixe bin kontrola xwe de û yek ji van mijarên sereke yadîgarîya pîroz anku qelen bû û li şûna ku yadîgarî cihê serbilndîyê bû ji jinê re; desthilatdarîyê ew kir qelen û bû cihê bindestîya jinê, di wê dema ku qelen bû ji bo kirrîn û firotina jina pîroz. Bi derketina pergala kapîtalîzmê re, baviksalarîya desthilatdar ew li gor berjewendîyên xwe xiste bin kontrola xwe de û bi rê ve bir, êdî di encama vê yekê de rewşeke nû derket holê. Lê gelo ta kengî ev pergala ku bi hezarên salan mirov li ser xwedî û perwerde bûye û dûrî siruştîya xwe bûye dê berdewam bike. Fîlozof û sosyalîst nêrînên wan derbarê çi kapîtalîzm be çi desthilatdarî de hene ku Teorîya Marksîzmê pêşbînî kirîye ku pergala kapîtalîzmê bi sedema nakokîyên navxweyî dê hilweşe û pergala sosyalîzmê dê bikeve şûnê. Mirov di vir de dikare bibêje ku ne li seranserê cîhanê ev rewş pêkan bû ku pergalek li şûna pergala berî xwe bi cî dibû, ji ber ku li hin welatan em dibînin di heman herêma cografî de pergalên koletî, feodalîzm û kapîtalîzm hersê hene. Loma dê ne bi vê hêsanîyê be rewşên ku desthilatdarîyê zivirandine û kirine kevneşopîyên gelan mîna qelen careke din vegere rewşa civaka xwazayî, Abdullah Ocalan dibêje:”Dema ku desthilatdarî ji pêşengîya civakî ya xwezayî hat veqetandin, wê baş were dîtin ku desthilatdarî çawa weke girêkeke kanserê çiziriye binyeya civakî û lê belav bûye.”3

ye, çima ta roja îro di nav hin êl û malbatan de bi şêwazin ne layiqî wê tê şûkirin? Her wiha di vê lêkolînê de rapirsînek ji bo 30 jinedayik çêbû di derbarê hebûna qelen de û weke nasînekê ji qelen re jî ji keçin li Qamişlo hatibû pirskirin.

Di dîroka mirovahîyê de pirr rêûresm her wiha bawerî hatine guhertin ku dûrî sedema derketina xwe ketine û bûne sedem ji bo rewşa bicîkirina serwerîya mêran an jî mirov dikare bibêje ku ew bûne sedêmên alîkar ên bicîkirina baviksalarîyê anku desthilatdarîya mêr û koletîya jinê. Yek ji wan rewşên ku dûrî wate û gewherê xwe ketîye ew mijara QELEN e.

Teorîyên Pêşveçûna Mirovan

Weke em dizanin ku bingehên teorîyên pêşketina mirovahîyê ji hêla Charlis Darwin ve hatin danîn ku di sala 1859'an de di wê xebata xwe ya navdar de "Koka Celeban" zelal kiribû. «Piştre ev teorî û li gor lêkolînên nû bi pêş ve çûn.

genetîkên mirovên kevin tekez kirîye ku rêjeya wekhevîyê ya bi malbata çampanzî re %98.5 e»1. Ya hatibû çespandin ku dîroka mirovê hişmend a li ser rûyê zemînê nêzî 200 hezar sal in, ku ew bi heman awayî dihizirî û ev pêşketinên di hişmendîya mirov de yên piştî vê dîrokê (anku 200 hezar sal) ew encamên ezmûnên mirov bi xwe ne ku bi hezarên salan dom kirine. Vê dawîyê hin teorîyên nû derketin mîna ya Îlona 2016 «piştî hin lêkolîn ji alîyê hin zanyaran ve ku dîroka mirovê hişmend ji wilo bi gellekî kevintir e û vedigere berîya 350 hezar salî»2 . Lê ji alîyê axaftina



Qelen û Baviksalarî

Darwîn Darî

Jin weke Xwedawenda Jîyanê dihate dîtin û ji bo ku mêrek bikaribe nêzîkatîya vê Xwedawendê bike; pêwîst e yadîgareke xwedî nirxine pîroz hebe..

Lêkolîn

Mijara me mijareke civakî ye, lê dema ku mirov di der barê wê de lêkolîn bike, pêwîst e girêdana vê mijarê bi mijarine din re nas bike, yên ku di cîhanê de bûne axtapot û penceşêr ku pirr zor û zehemet e di rewşa heyî de dawî li wan bê. Loma berîya mirov li ser mijara qelen biaxive, pêwîst e van babetan bîne zimên da ku qelen bi vî şêwazê xwe yê heyî zelal bibe, çi têkilîya wî bi wan re heye? Jixwe yek ji van mijaran; mijara desthilatdarîyê ye, mijara din jî kapîtalîzm e, ku dibe ew herdu babet bersiv bin ji wan pirsên ku di serê mirov de digerin; gelo dîroka qelen vedigere kengî, sedema hebûn û berdewamîya qelen di hin civakan de çi ye, her wiha rewşa qelen di demên kevn û nû de li tevahîya cîhanê heman rewş e, jina ku stûna malbatê ya sereke

■ **semînerk li Pêşangeha Pirtûkan ya Amedê 2/10/2019**

Leylayê (Menaf Osman). Ji romanên romannûsên Başûr ku bo kurmancî hatine wergerandin Hinara Dawî ya Dinyayê (Bextiyar Elî), Hesar û Kûçikên Bavê min (Şêrzad Hesen). Ji romanên romannûsên Rojhilat Helale (Eta Nehayî). Ji romannûsên Rojavayî gelek romanên Helîm Yûsiv hatin nirxandin. Di nava nirxandina Salonên Wêjeyî de roman û çîrokên honaka zanistê, wek romana Medesayê ya Dr. Ahmed Anaç û Kaptanê Mirinê pirtûka çîrokan a Mîran Janbar jî cih digirin…

Di Salonên Wêjeyî de gelek karên curbecur ên wek kargehên romannûsî, helbestnûsî û rexnegirî tên li dar xistin. Di van kargehan da gelek akademîsyenên wek Dr. Remezan Alan, Dr. Zilkîf Ergul, Îrfan Amîda, Çorê Arda û... hwd, cih digirin. Dîsa Salonên Wêjeyî li Fuarên (Pêşangeh) pirtûkan jî gelek panel û semîneran li dar dixin.

Her çi qasî navê van xebatan salonên wêjeyî be jî dem dem ev xebat li park û bexçeyan jî tên kirin.

Çavkanî:

-Qanatê Kurdo, Tanrîxa Edebiyata Kurdî, Weşanên Oz-Ge, Ankara 1992
-Sagniç, Feqî Huseyn, Dîroka Wêjeya Kurdî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002
-Uzun, Mehmed, Antolojiya Edebiyata Kurdî, Weşanên Aram, Stenbol 2003
-Uzun, Mehmed, Destpêka Edebiyata Kurdî, Weşanên Îthakî, çap. 2. Stenbol 2010

Kovar:

-Wêje û Rexne (kovara lêkolîn, rexne û teoriya wêjeyê)
-Zarema (kovara rexne û teoriyê)

Çavkaniyên elektronîk:

-https://www.facebook.com/groups/156628751008 (05.12.2020)
-https://www.facebook.com/groups/1903444186570035 (05.12.2020)
-https://www.facebook.com/groups/685974185129715 (05.12.2020)
-https://twitter.com/

■ **Kargeha romannûsî û rexnegirî a Wêjeyî - 2019**

Di vê serdema pandemîya koronayê da çalakîyên salonên wêjeyî bi piranî online têne kirin. Hin caran nivîskarên berheman li derveyî welêt bi rêya online beşdarî nirxandinê dibin. Wek mînaka çalakîyek online, em dikarin afîşa li jêrê ku tê da hem berhem, hem komên beşdar dibin û bangewazîya komên ku bixwazin bi awayekî online beşdarîyê bikin hene. Dîsa ji afîşa bangewazîyê jî dîyar dibe ku romanên di salonên wêjeyî de tên nirxandin bes bi romanê nivîskarên Bakurê welêt sînordar nînin. Ev romana ku li ser afîşê hatiye dîyarkirin, "Bawerî" ya romannûsekî kurmanc ji kurdên li kafkasyayê ye. Tecrubeya salonên wêjeyî yên li Bakurê welêt, hêdî hêdî li Ewropayê jî belav dibin. Mînak, mamoste Hesîb yek ji rêveberên "Koma Xwendinê ya Amedê" bû. Ji ber guvaşên dewletê mecbûr ma derkeve derveyî welêt. Ew û rêveberên Enstîtûya Kurdî ya Stockholmê niha salona wêjeyî ya cîhanî bi rêve dibin. Li ser afîşê jî ew xwe weke "Koma Wêjeyê ya Swêdê" binav dikin. Hem Koma Xwendinê ya Romanên Kurdî hem jî Koma Helbestê bi awayekî online bi Salonên wêjeyî yên li Bakurê welêt, welatên cuda yên Ewropa û cîhanê ra çalakîyan li dar dixin. Gelek wêjehez ji Başûr û Rojavayê welêt jî beşdar dibin. Gelek kesên navdar û akademîsyenên wêjeya kurdî weke Îbrahîm Seydo Aydogan ji Parîsê, Bavê Nazê ji Moskovayê, Kamran Simo Hedilî ji Stockholmê, Dilawer Zeraq ji Amedê bi rêya online digihîjin hev.

Di van çalakîyên wêjeyî yên romana kurmancî de, romanên curbecur tên nirxandin. Ji dîroka kevnar a Medan Serwerê Med Aştıyago, Nevîyê Aştiyago Gaumada (Fêrgîn Melîk Aykoç) bigire ta romanên şervanên azadîyê, Lênûska

Qedrî Can, Osman Sebrî, Celadet Bedirxan û.. hwd, di şertên zor û zehmet de berhemên wêjeya kurdî afirandine. Ji bo dema niha jî em dikarin li ser Salonên wêjeyî rawestin.

Salonên wêjeyî, ew cihên ku li wir wêje tê xwendin, nirxandin û afirandin. Li bakurê welêt, bi navên curbecur tên naskirin. Wek mînak di destpêkê de "Kulûba Xwendinê ya Diyarbekirê" 2010an de hebû. Bi piranî li Salona Navenda Hunerê ya Diyarbekirê (NHD/DSM) çalakîyên xwe pêk dihanî. Hinek Salonên wêjeyî jî bi navê "Komên Xwendinê" tên bi nav kirin. Weke "Koma Xwendinê ya Amedê" (2017), "Koma Xwendinê ya Cizîrê" (2017), "Koma Xwendinê ya Sendikaya Mamosteyan (Egitim-Sen)" (2018), "Koma Xwendinê ya Farqînê" (2019) û... hwd. Hin ji wan salonên wêjeyî li gor berheman jî ji hev cuda dibin. Mîna salonên wêjeyî yên xwendina roman* û çîrokan an ên xwendina helbestan. Ev salonên wêjeyî gelek karên berhemdar kirin. Di encama xebatên van salonên wêjeyî de du kovarên nîv akademîk, kovara Wêje û Rexneyê û kovara Zarema dest bi weşanê kirin. Ji nava endamên salona wêjeyî çend kesan pirtûkên helbest, çîrok û romanan nivîsîn. Gelek ji wan kesan dest avêtin karê akademîk. Li ser ziman û wêjeya kurdî master û doktorayên kurdî xwendin. Niha li piranîya bajar û bajarokên Bakurê welêt ev salonên wêjeyî xebatên wêjeyî dikin.

Weke ku dunya jî pê dizane, li Bakurê Kurdistanê perwerdeya bi zimanê kurdî qedexe ye. Zarokên kurdan nikarin bi zimanê kurdî perwerdehîyê bibînin. Karê weşangerîya kurdî ji piştgirîya dewletê bêpar e. Dev ji pişgirîyê berdin, heta ji destê dewleta Tirk tê astengîyan li hember berhemên kurdî çê dike. Ji ber van sedeman xwendekarên zimanê kurdî kêm in. Salonên wêjeyî bi xebateke xwebexşî piştgirî didin ziman û edebîyata kurdî. Li piranîya bajar û bajarokên Bakurê welêt salonên wêjeyî bi sendina berhemên kurdî roleke baş dilîzin. Bi dehan endamên van salonên wêjeyî, dema her endam romaneke kurdî distîne, bi qasî hezar romanên kurdî tên firotin. Li welatên ku rêveberîyek gel heye, rêveberî berheman distîne û li pirtûkxaneyan ji bo xwendina gel bi cih dike. Lê li Bakurê welêt, ev salonên wêjeyî rola pirtûkxaneyan digrin ser milê xwe.

Weke me li jorê jî nivîsî, bi piranî mînakên salonên wêjeyî bi navê "Koma Xwendinê ya Romanên kurdî", "Koma Xwendinê ya Çîrokên kurdî" an "Koma Xwendinê ya Helbestên kurdî" tên binavkirin. Bi piranî navê bajar û bajarokan jî li ser navê wan zêde dibe. Lê hin caran bi navê navdarên kurdan jî tên binavkirin. Weke "Koma Xwendinê ya Ehmedê Xanî".

* Derbarê romana kurdî ya kurmancî li Bakurê welêt xebata herî dawî ya bîblîyografîk, di kovara akademik Kurdinameyê, jimara 3. (r. 1-28) da çap bûye.

Salonên Wêjeyî Li Bakurê Welêt

Ahmed Kanî

Li welatên ku rêveberîyek gel heye, rêveberî berheman distîne û li pirtûkxaneyan ji bo xwendina gel bi cih dike. Lê li Bakurê welêt, ev salonên wêjeyî rola pirtûkxaneyan digrin ser milê xwe.

Dema em li dîroka wêjeya kurdî dinêrin, dibînin ku ji destpêka wêjekarîya kurdî heta roja me ya îro Bakurê Kurdistanê cihekî girîng ê berhemdarîya wêjeya kurdî ye. Wek mînakên wêjeya klasîk a kurdî, li Bakurê welêt em dikarin helbestkarên bi navûdeng Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran û Ehmedê Xanî û.. hwd, bidin. Piştî ji holêrakirina mîrektîyên Kurdan û dabeşkirina Kurdistanê li ser çar dewletan, wêjekarên kurd demekê bê derfet man. Lê dîsa jî dengê wêjekaran nehatiye birîn. Bi qasî ku em ji nivîskarên dîroka wêjeya kurdî, yên wek Qanatê Kurdo, Feqî Huseyn Sagniç, Mehmed Uzun û.. hwd, fêr dibin. Wêjekarên weke Cegerxwîn,

Rola nivîskar, rewşenbîr, sazîyên wêjeyî û çandî û rêveberîya xweser di pêşxistina salonên wêjeyî de:

Berdewamîya salonên wêjeyî bi rengekî serkeftî yan binkeftî li Rojavayê Kurdistanê girêdayî ye bi rewşenbîr û nivîskarê çalak û xwedî berhem û asteyeke bilind, salonên wêjeyî bi xurtî pêş dixe û di çavên civakê de bi nirx dike. Lê yên qelis û lawaz, kêm bawerî û berhem û şopedarên berjewnendîyên kesayetî salonên wêjeyî lawaz dikin û rola wan pûç dikin û ta asta ku carnan dibe sedem ku ew salon dimîne nav tenê, pûç dibe û dihele jî.

Piştgirîya dualî girîng e di navbera salonên wêjeyî û hemû sazîyên rewşenbîrîyê de bi hemû cureyên xwe ve, ji ber ku hemû di warê çandê de dixebitin.. Hêjayî gotinê ye ku dîyardeya balkêş ew bû ku wan sazîyên rewşenbîrîyê yên berîya şoreşê û piştî wê gelek caran têkilî û piştgirî ta radeyekê didan hev û piranîya caran rewşenbîrên Dêrika Hemko, Girkê Legê, Tirbespîyê, Qamişlo, Amûdê û Hesekê li çalakîyên hev beşdar dibûn û semînar ji hev re didan û serdana hev jî dikirin û gelekan ji wan rewşenbîran hev nas dikirin û carinan çalekîyên hevbeş jî, mîna Mehrîcana Helbesta Kurdî Li dar dixistin. Lê mixabin wê hevbeşîya rewşenbîrî di wê mehrîcanê de berdewam nekir, ji ber ku destwerdanên nerewşenbîrî ketnê de.

Niha jî pêwendî di navbera yekîtîyên rewşenbîrî û nivîskaran de li herêmên Qamişlo, Kobanê û Efrînê de heye û bi hev re pêwendîdar û hevrêzkar in. Lewre em dikarin bibêjin ew xebata malbatî rewşenbîrî pir pêdivî bi hevkarîya wan bi hev re heye. Dibin agirek di destkeftina encamên serkeftî de.

Erkê Rêveberîya xweser pir gîring e di piştgirîya van salonên wêjeyî de, ji ber ew mîna stûna ku rewşenbîr di xebata xwe de pişta xwe bide ser.

Divê Rêveberîya Xweser bi rastî li gor armancên ronakbîr Ocelan be di dana mafên derbirîn û belavkirina çanda xwezayî ya ku di cîhanê de jê re dibêjin çanda civaka sivîl û astengî li pêşîya avakirina van sazîyên sivîl neyê danîn. Divê zagon werin danîn ji bo dabînkirina mafên wan. Piştgirîya aborî jî bê dayîn. Belavkirina çanda ku nirxên van sazîyan bê naskirin di nav sazîyên xwe de û ew sazî bên şîretkirin ku endamên rewşenbîr di nav wan de, di çalakîyên salonên wêjeyî de beşdar bibin û ya rastir ku bibin endam jî.

Çiqas em bibêjin ku weke îro li Rojava û bi taybetî li herêmên Rêveberîya Xwesrer dîyardeyeke geşbînî di derbirîna rewşenbîrî ya azad de heye û di destpêka belvkirina sazûmanîya civaka sivîl de ye jî, lê komeleyên serbixwe pir kêm in û piranîya wan qels û lawaz in, ji ber yên heyî piranîya wan bi alîyên sîyasî ve girêdayî ne. Ya pêwîst û serkeftî ew e ku ew sazî hebin û di xebata xwe de serbixwe bin û Rêvebirîya Xweser weke alîyekî serperişîtvan piştgirîya wan bike.

Berdewamîya salonên wêjeyî piştî şoreşa Rojava 2011-2020:

Bi destpêka şoreşê re bayê azadîyê bi xurtî li miletê Kurd xist û dil ji bo xebatê bi gelekan re vebû. Eşq û evînîya kurdîtîyê di xebata rewşenbîrî de li cem gelekan serdestî psportîyê bû, lewra rojane komele û sazî li Rojavayê ava dibûn.

Sazîya Nûrî Dêrsimî ya Ramanê Azad ava bû. nivîsgehên wê li piranîya bajarên Rojava hebûn. Di kongireyekî xwe de navê xwe kir Sazîya Zanist û Ramanê Azad. Piştre di kongireyekî xwe yê din de navê xwe kire Ekadimîya Civaka Demokrat û ta niha bi vî navî berdewam e.

Dîsa li Girkê Legê Komeleya Mîdîya ya Lêkolînên Dîrokî, li ser destên çend mamosteyên Kurd ên Dîrokê ava bû, lê destwerdana kesayetî û partîtîyê di nav de, hişt ku dîroknasine pispor jê werin dûr xistin, wê jî bi vînekê berdewam kir. Piştre ma bi du endaman tenê, lê neçû serî, ji ber li gor em dizanin ji zû de bêdeng e.

Li Girkê Legê li ser destên komek ji rewşenbîran gurûpa Rewşa Girkê Legê ya Ragihandinê ava bû û di dema hebûna xwe de xebateke berçav dikir.

Yekîtîya Nivîskarên Kurd ava bû, piştre bû du parçe. Yek bû Nivîskarên Kurd li Sûrîyê û ya din bû Kurdistana Sûrîyê û çendek ji vê jî parçe bûn bi navê Rêya Rast.

Yekîtîya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê 2014z ava bû, her wiha li Kobanê û Efrînê jî. Ya kantona Cizîrê niha bi navê Herêma Cizîrê xebatê dike. Carê li herêman şaxê wê hebûn, lê di kongirê çarem de ew şax bûn nivîsgeh û Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê jî heye.

Li Qamişlo beşek ji jinan komeleya Şawîşka ava kirin. Dîsa li Qamişlo ji bo dîrokê komeleya Sobarto hate avakirin. Komeleya Mîtra jî hate avakirin. Sazîyên perwerdeya zimanê Kurdî jî ava bûn. Ji wan sazîya Fêrkirin û parastina Zimanê Kurdî ya partîya Yekîtî (Elwehdê) û Komîteya Fêrkirina Zimanê Kurdî ya M. Derwêşê Xalib û wilo ya Fêrkirina Zimanê Kurdî ya partîya Pêşverû û...hwd.

Sazîya Zimanê Kurdî (SZK) li hemû heremên Rojavayê ava bû û bi xebateke pir çalak rabû. . Ta îro jî bi çalakî berdewam e. Di kongreeyekî xwe de navê xwe kiribû Tevgera Perwerdeya Ziman (TZP) Lê di kongireyekî din de vegerîya SZK.

Li bajarên mîna Amûdê û Girkê Legê komek rewşenbîrên Kurd û Ereb û partîya Çaksaz di destpêka vê şoreşê de Encûmena Aştîya Civakî ava kirin. Ta radeyeke balkêş xebat di wî warî de pêş ve birin.

Li gelek bajarên Rojava Komîteyên Lêkolînên Wêjeya Kurdî ava bûn. Niha piranîya xebata wê weke îro bû ye navendî li bajarê Qamişlo.

Carinan li Şamê jî me dengê hin sazîyên rewşenbîrîya kurdî dikir û endamên wan dihatin têkilî bi yên Rojava re jî dikirin.

rewşenbîrî berdewam kir.

Dîdargehê ji xwe re kiribû plan ku bi kêmayî mehê carekê şevbuhêrkekê li dar bixe, semînar, helkeftin û babetên din, her wiha nivîsandin, lêkolîn ,pêşangeh, perwerde û hevdîtina rewşenbîran bi wêjevanan re pêk tanî. Çilrojî û salevegera kesayetên Kurd û bîranînên şoreş û dewletên kurdî jî li dar dixist.

Gelek endam tevlî dibûn û gelek jê dûr jî diketin. Hijmara andaman ji (7)an carinan digiha (25)an, ji ber endametîya wê bêyî berjewnendîya kesayetî bû.

Bi xurtî berdewam kir ta rabûna şoreşa Rojava 2011z. Wê bûyerê bi demê re bandora xwe lê kir û bi nerênî berdewam kir.

Bi gştî em dikarin bêjin ev dîdargeh bi demê re ji ber van sedeman qels bû ta xebata wê sala 2018z ma bêrol:

- Ji ber ku endamin ji rêveberîya wê koçberî derve bûn.

-Endamin bi partîyên xwe re ketine sazîyan de.

-Dualîkirina civaka me di navbera Meclisa Rojava û ENKS de gelek endam jê dûr kirin.

-Tevlîbûna gelek endamên dîdargehê ji sazîyên Rêveberîya Xweser, ji dîdargehê dûr ketin û nema lê pirsîn.

-Ji ber berjewndîya kesayetî gelek endam ber bi partî û sazîyan ve çûn, nexasim dema bêhna darayîyê ji wan kirin.

-Bandora xebata xurt a hin endamên wê di rêveberîya sazîyên rewşenbîrî û hunerî yên Rêveberîya Xweser de, hişt ku nema karibin rêveberîya dîdargehê bikin.

Li Girkê Legê Girûpa Girkê Legê ya Rewşenbîrî hate avakirin, her wiha PDK ya bi serokatîya M. Nesredîn Birahîm jî komeke rewşenbîrî li Girkê Legê ava kir.

Komek hunermend li herêma Girkê Legê Komeleya Mihemed Şêxo ya Hunerî ava kirin.

Wê çavbelîyê bandor li ciwanan kir, bi taybetî ji alîyê Dîdargeha Girkê Legê ya Rewşenbîrî ve, komekê ji wan Bizava Ciwanên Girkê Legê ava kirin, di qonaxa xwe ya heyî de pir çalak bû û xwedîyê bizaveke nûjen û çalak bû. Lê hatina şoreşa 2011z bandor li wan ciwanan kir û ew jî di nav sazîyên Rêveberîya Xweser û ENKSê de û li koçberîyê belav bûn. Bandora wan ciwanan digiha gundewrê Girkê Legê û li gundê Kêşikê Bizava Ciwanên Kêşikê hate ava kirin lê zû ew herifî.

Li Dêrika Hemko jî komek komeleyên çalak ava bûn Mînak: Tevna Çand û Hunera Dêrika Hemko ava bû, wê jî bi dehan çalakî li dar xistin, her wiha Komeleya Ehmedê Xanî jî. Komek ji jinan li herêma Dêrikê û di nav wan de ji gundewarê Girkê Legê jî komeleya Baxê Jinên Dêrika Hemko ava kirin û wan jî bizaveke berçav dikir.

Li herêma alîyan Koçka Seydayê Cegerxwîn ji aliyê komek rewşenbîr ve hate avakirin. Ta demekê xebata xwe berdewam kir û li herêma Girkê Legê Yekîtiya Jinên Kurd jî ava bû.

salonan kom bikin.

Li gor wê kesayeta saxlem ji endam û rêveberên salonan re; gerek e rewşek aram, bêyî şer û wêranîyê hebe. Ji salonê re pêwîstî bi nivîsgiheke fireh heye, ji xeynî alavên rewşenbîrî jî divê bermalîyên wê tê de hebin û divê alîkarîya aborî jî jê re bê dayîn.

Rewşa salonên wêjeyî berya şoreşa rojava-salên 1990-2010z:

Tevî ku rêjîma Sûrîyê yekalî bû di bîrdozîyeke tekane de bû .Lê bi hatina çerxa (21)ê, ji ber pir sedeman, wê rêjîmê nema karîbû wê çepera xwe ya yekçand biparêze:

-Piştî koça serokê Sûrîyê Hafiz Esed û danîna kurê wî Beşar weke serok ji dewletê re, xwestin nermîyekê peyda bikin di nav gel de û projene mîna projeya pêşketin û nûjenkirinê û tê de çaksazîya rêveberîyê pêk bînin.

- Avakirina sazînan bi navê gel li Şamê (Behara Şamê). Ji wan jî Ragihandina Şamê (Ilan Dîmeşq) û her wiha yanegeh jî.

- Şikestina dîwarê tirsê ji alîyê Kurdan ve, piştî destkeftîyên li Başûrê Kurdistanê û Raperîna Qamişlo 2004z û pêşketina teknîkê di cîhanê de.

- Bandora nivîsên ronakbîr Abdullah Ocelan û wilo çanda civaka sivîl ji alîyê ragihandina navnetewyî ve.

-Xuyakirina kesên rewşenbîr ên serbixwe di nav civaka Kurdî de.

Jixwe ji wê demê ve, yanî ji berîya şoreşa Rojava ve astеyek ji rewşenbîrîyê di nav partîyên me yên Kurdî de hebû. Mînak Partîya Demukratî Pêşverû Kurdî li Sûrîyê ta radeyekê guh dida wê dîyardeyê, ji ber ku wê Yanegeha Rewşenbîrê Pêşketî (Elmûseqif Elteqedumî) bi fermî ava kiribû û li bajarê Dêrka Hemko dîdar û şevbuhêrk ji rewşenbîrên partîya xwe û yên din re li dar dixst û mijar guftûgo dikirin.

Partîya Yekîtîya Demukrata Kurd li Sûrîyê (Elwehde) jî ta radeyekê guh dida rewşenbîran û bi piştgîrya rewşenbîrên xwe û yên serbixwe şevbuhêrik û helkeft li dar dixistin, bi tayebetî di dema serokê wê yê nemir Emer Simayîl de, yê ku guh dida rewşenbîran.

Bi sazûmanî Yanegeha Rewşenbîrên Kurd 2004z ava bû û Komeleya kurd a keskayetîyê û Komeleya Aborînasên Kurd jî ava bûn.

Di sala 2006z de hin rewşenbîran bi şêweyekî serbixwe li herêma Girkê Legê xwe li hev kom dikirin û babetin hildibijartin, dikirin mijarên semînar û guftûgoyê. Carinan jî hin rewşenbîrên hişvekirî li gor wê demê ji ji hin partîyan, xwe li wan digirtin. Ev diyarde bû dergehek ku ew şevbuhêrk bêtir bi rêxistin bibin û bû bi navê Dîdargeha rewşenbîrî ya Girkê Legê.

Ev dîdargeh di şevbuhêrka bîranîna şewata Sînemaya Amûdê de ya 13-11-2006z bi fermî hate ragihandin û binavkirin ji alîyê komek rewşenbîrên serbixwe û yên di partîyan de. Xebata wê li herêm û bajarên din ûta Şamê jî deng veda. Çiqas jê dihat wê xebata xwe bi şêweyek sivîlî û serbixwe û

Girîngîya salonên wêjeyî û bandora wan:

■ Ji çalekyên Dîdargiha Girkê legê ya Rewşenbîrî-2007

Hebûna van salonan nîşana pêşketina civakê ye, ji ber ku civak, an netewe gelek caran di qonaxine nezanîyê re derbas dibe, dimîne paşketî û nikare egerên wê paşketinê çareser bike, her wiha carinan bindeste jî û nikare rêyên azadkirina xwe bibîne. Lewre ji nav wê civakê yan neteweyê dema ku kesin bi wê rewşê dihisin tên xuyakirin û salonan ava dikin û pêdivîya belavkirina hişîyarîyê nas dikin. Ew kes cîyawz in di nasîna nirxên mîna: Zimên, dîrok, erdnîgar, gerdûn, aborî, hozanî, lêkolîn û hestên neteweyî de. Lewre gîrngîya avakirina civat û komikan bi sazûmanî pir gîring e, ji bo zanistîyê di nava milet û civakê de belav bikin.

Encamên xebata wan rengereng in, semînaran didin, pirtûkan dinirixînin, çap dikin û belav dikin, perwerdeyê didin, li kesayetîya neteweya xwe û mirovahîyê xwedî derdikevin, ta radeyekê têkilîyên civakê bi hev re xurt dikin. Yanî bi giştî dibin egerên hişiyar kirinê.

Şert û mercên damezrandina salonên wêjeyî:

Şert û mercên vekirina saloneke wêjeyî û kesê ku pê ve mijûl bibe hene û gereke xwedî taybetmendîyên cuda bin.

Mercê sereke ew e ku Kes, an kesên ku pê radibin xwedî hestên wê xebatê yê rast be, Ji wê xebatê hez bike, gîyanê xwebexşeyî pê re hebe, ji ezezîtîyê dûr be û divê xwedî bingehekî zanistî be, ta radeyeke bilind bi agahî û zanyarîyan têr û tije be, karibe bersivên rewa ji pirsan re bide. Li cem endaman û bi taybetî li gel rêveberan berjewendîyên neteweyî û civakî di ser ên kesayetî re bin, ne li xwe be, ne nefismezin be, xwenas be, dilsoz be di xebata xwe de û wilo jî bi vîn be ji bo berdewamîya xebatê, demukratnas be û xwedî baweriyên girtina rexneyan be, nirxên hevrêtîya di salonê de nas bike, mafê sazûmanî di ser ê kesayetî re bigire.

Divê sazîyên dewletê, yan yên desthilatê nirx bidine salonan û wan di civakê de kêm û pûç nekin û rewşek demokrat peyda bikin, ji bo bi demê re rewşenbîr pir bibin û xwe li wan

şevbuhêrkên xwe derbas dikirin û gelek caran jî alozîyên xwe yên civakî çareser dikirin, bêy ku tu nav li wan civatan bê kirin, tenê digotin îşev em ê biçin odê. Lê ew ode mîna salonên wêjeyî bû.

Bi bajarvanîyê re û di ber hebûna odeyan re, di nav Kurdan de sazûmanî pêk hat, ew çalakî hinekî bûne fermî, ji wan li dibistana Sor a Cizîra Botan û bêhtir di dema piştî şerê cîhanê yê yekem de, di nav rewşenbîrên Kurd de li tevahîya Kurdistanê sazîyên rewşenbîrî dihatin damezrandin, lê ne hercar navê salon li wan dikirin, ji ber bi navên komele û pen an yekîtî dihatin binavkirin. Lê bi demê re zelaltir bû, ji ber ku bi navê salona Rewşen Bedirxan yek ji wan hate damizrandin. Li Şamê jî hevjîna serokê yekem ê Sûrîyê, yê kurd Mihemed Elî Abid rêzdar Zehra Abid saloneke wêjeyî damezrandibû.

Di destpêka serdema nûjen de, li ser asta cîhanî avakirina salonan bûbû xebateke serkeftî, bi taybetî li Ewrupayê, piştî şerê navxweyî bi dawî hat. Ew serkeftina ramangêrî li Îtalîya ronî da, di çerxa (16)an de, di dema ku jê re raperîna ramangêrîyê tê gotin, avakirina salonan li Îtalîyayê bû dîyardeyeke girîng di hişîyarkirina civakê de. Em dikarin bibêjin ku salonên wêjeyî bûn sedemek ji yên wê raperînê. Piştî Îtalîyayê Firansa jî ew rê girt û salon lê hatin damezrandin û pir pêş ketin. Dîsa em dikarin bibêjin ku di çerxa (17 û18)an de salonên wêjeyê li Firansayê sedemek ji yên guheretina wê ber zanist, demukrasî û şoreşa ferensî bixwe ve bûn.

Li nav welatên ereban jî cîwerkin li ser hebûna van salonan peyda bûn. Sûka Ûkaz li Mekihê û çendekên din li Qahîrê, Şamê, Bexdayê û…hwd.

Gotina salon di ziman de:

Di ziman de peyva Salon gotineke latînî ye. koka wê ne dîyar e, di zimanê Îtalî, Firansî, Erebî, Kurdî û....hwd de jî heye.

Peyva Salon ji mezelek fireh re tê gotin, a pêşwazîyê ye, carnan dibe sale jî û carnan dibe hole jî. Hemû di wateya xwe de nêzîkî hev in. Bi taybetî ev peyva hole di Kurdî û Ingilîzî de ye, ji ber di zimanê Kurdî de gelek caran tîpa (H) dibe (S) weke peyvên Haman û Saman, Hûde û Sûde. Lewre dibe ku Hole bûbe Sale. Nexasim tîpa (O) di Ingilîzî de caranan tê xwendin (A) ji ber peyva Hole di ingilzî de halo tê nivîsandin Halle. Yanî (O) bû (A), lewre dibe ku yek bin.

Gotina Salon di hemû zimanan de –Ji wan zimanê Kurdî- ji mezelek fireh re tê gotin. Lewre ew nav ji cih û wateya wê xebatê re hatiye dayîn, ji ber ku ji hijmarek mezin ji hunermend, nivîskar, sîyasetmedar, helbestvan...û hemû cureyên çand û wêjeyê digire nava xwe û ji wan re Salon tê gotin.

Carnan kesekî zengîn, yan yeke/î xwedî pîşeyeke wêjeyî û carnan komek ji wan dibin damezrînerên salonekê, ava dikin û pêş dixin.

Salonên Wêjeyî û Rola Wan Di Civakê De

Berdewamîya salonên wêjeyî bi rengekî serkeftî yan binkeftî li Rojavayê Kurdistanê girêdayî ye bi rewşenbîr û nivîskarê çalak û xwedî berhem û asteyeke bilind..



Biradostê Mîtanî

Danasîna salonên wejeyî:

Mirov bi pêdivîya xwe ya bi kombûn û civakbûyînê, tê naskirin. Lewre carinan di nav wan de beşek ji kesan dîyar dibe, ku li hev bi rêxistinî dicivin û hest û nerînên xwe bi hev re parve dikin, li hev guhdar dikin û kêlîyên xweş bi hev re derbas dikin. Carinan hevcivîn bi sazûmanî bi cih dihat û carinan ji bi xwezayî.

Gelê Kurd di wê taybetmendîyê de navdar e, ji ber ku evîndarê ramangêrî û hunerê ye, di wî alî de li gundewarên wan, di piranîya gundan de odeyek fireh hebû, tê de her şev çîrokbêj, stranbêj û tinazçî li hev dicivîyan û

pêdivîyeke çist û jêveneger jîyandin û hîskirina wê mijara gotinê ye.

Dikare bê gotin ku jîyan, li gor pêdivîyên mirovahîyê tê şêwekirin, di vir de tevahî amraz û azînên ku tên dîtin, dikevin berfirehîya hunerê. Bûyera ku em dibêjin dengekî xweşik, dîmenê bi çav xweş tê, helbest ango destana baş a ku xîtaba gîyanê dike weke cureyekî hunerê tê nirxandin. Dibe ku ev tune bin jî jîyan bidome, lê ev yek razberkirineke. Di her nihêrtinê de heman veqetandina xweşikbûn û kirêtîyê heye. Dîsa di her nêzîkatîya gîyana mirov de tiştên ku li xweşê diçin û naçin hene. Libat û tevgerîna baş heye, libat û tevgerîna şaş heye. Lewma civakek an jî takekes her çende ku bilind dibe (bi taybetî dema ku çalakîyên hunerê dibe mijara gotinê) ku pêşketin hatibe pêkînandin yek jî di vî alî de dibe derbirîna pêşveçûyînê. Yekî ku di nava teşeyê hunera pir paş de maye ango di nava teşeyê libata pir paşdemayî de seyr dike û diçe, ji hovebertîya wî tê qalkirin. Kesayeta ku kûrbûna gîyanê û dewlemendîyê bi xwe re peyda nake, ji mûzîk, dîmen û bi her awayî teşeyên libata hunerîyên cûrbecûr ve bandor nabe û nakeve ferqa ve yekê, rehên jîyana wî ziwa bûne. Lewma huner, erka xwe ya civakî bêgotûbêj e. Bêyî wê jîyan tenê dikare nêzîkî jîyaneke ajalî seyr bike. Sînorê ku ajal, bi mirovatîyê re dibe yek, dikare biderbirîne. Ev, ne jîyaneke ku were pejirandin e.

Bi vê wateyê di her qonaxa pêşketina civakî û pêngavên çonayetî de rastêrêya pêşketinê ya hatiye pêkînandin, di heman demê de rastêrêya (rasteqînî) pêşketina hunerê jî dide diyarkirin. Jixwe qonaxên civakî yên serûbinbûnên girîng, di heman demê de bi hewldanên hunerê ve darîçav dibin. Her serûbinbûyîn di destpêkê de li warê hunerê pêş dikeve; hem bandorê li hunerê dike, hem jî jê bandor dibe. Bi taybetî qonaxên şoreşî, weke ku bi hunerê tên amadekirin, di gihandina teşeyên çonayetî û xurt de bandoreke girîng çêdikin. Huner bi vê wateyê li hember zorîyên jîyanê henase wergirtineke fireh e. Yanî ew gîyana mirov a ku teng bûye, bi hemû behremendîya seheka (hîskarî) xwe ve firehkirin e. Bi tiştên heyî û kevin qîm nekirin e. Qîmpênanîna wê jî, hêz qezenckirin e. Dikare pênasa şoreşa hunerî wisa bê çêkirin.

Civak û welatê Kurdistan dema ku dibe mijara gotinê, bi pênaseya gîştî ya guncîn a hunerê tişta ku dikare bê gotin, tevahîtiya civakê di mercên feodal û mêtîngerîyê de hatiye rewşeke ku nikare henase wergire û xwe bide pêşxistin û ev yek jî, li ser hunerê bandoreke pir neyênî çekiriye. Lê belê di vir de ya herî girîng ev e: Gel, di gelek dezgehbûnên joresazîyê, têkilî û hêzan de tevî ku pir zorayî kişandiye ango hatiye qedandin, lê sînordar be jî, xwe tenê bi hunerê dikare bide jîyandin, dîsa derbirîna nasnameya xwe dikare tenê bi hunerê bidomîne. Em vê yekê dibînin. Ev yek jî hêza hunerê nîşan dide. Huner dibe taybetmendîyeke civakî ya ku belkî jî dawî bin bikeve û bê windakirin.

bîranîna Augustus ê mezin nivîsîye. Lê dîsa jî klasîkeke wêjeyê ya mezin e. Hunera şano pêşveçûye. Gotinbêjî bi awayekî derasayî girîng e û hatiye sazîbûnkirin. Şêweya zimanê Etalyan ku di warê îfadekirinê de ewqasî hîkarîker e, bawer dikim ku ji hêza gotinbêjîya vê demê tê. Di bin vê gotarê de jî, vîyana hêzeke ku serdestî cîhanê heye. Desthilatdarên herî bihêz, digihîjin zimanê herî bihêz û bi rewanbêjî (belaxat), para koleyan jî, dibe zimanê Ezop ê ku qet nayê fêhmkirin. Dema ez dihizirim ku di navbera hêz û azadîyê, serdestiya zimên û axaftina xweşik de tekilîyeke hişk heye, timî peyvên desthilat¬darên Roma yên gotardêrî(gotarbêjî) tên aqlê min. ereb, spanyolî û îranî di pileya duyemîn de ne ku ev hunera gotardêrîyê pêşvebirine.

Ketina Troya dibe sedema berevajîbûna dîrokeke mezin û domdirêj. "Elyada" Homeros ku piştî Gilgamêş bi nav û deng, deh salên ji vê dîrokê, şerekî dawîya sala BZ 1200î, kiriye destan. Ji ber ku şer dişibe berxwedan û hêrîşên gelek gelan û wiha hatiye destankirin, Elyada bûye xwedî nirxê vegotineke gerdûnî. Ev vegotinên destanî ku hê jî di bîrûbawerîya gelan de tên jîyîn, girîngî û zorbûna gihîştina hêzeke şareza didin diyarkirin, veguherîna serdemên dîrokê îfade dikin.

Wêje Hîmê Gîyanê ye

Şoreşa ku di joresazîyê de dest pê dike, her wiha jêresazîya xwe li veguherînê rast tîne, pêş dikeve û tekûz dibe. Di vê derê de pirsa herî girîng ku bê bersivandin ev e: Erka wêjeyê çi ye? Ango pêwîst e bi gştî huner, bi taybet jî wêje û dîsa ew romana ku beşek girîng a vê yekê ye bi pirsa ka erka şoreşî çi ye, ku em bibersivînin. Ger huner nebe em nikarin qala civakan bikin. lewma huner, amrazekî jêneger e, ji bo civakbûyîn û pêşketina civakî. Bi taybetî, ji ber ku mirov nêzîkatîya xwe ya li hember xwezayê bi zanistî û bi polîtîkayê tam nikare dahûrîne û nikare giyana xwe bi têrbûyîneke daringî têr bike, wî ber bi teşeyê têrbûyîbûneke cewaz, yanî ber bi hunerê ve dibe. Di vê wateyê de huner, derbaskirina pêdivîya gîyanê esas digire. Bêguman pêwendîya vê bi raman ve heye. Bi hêsanî mirov dikare diyar bike ku huner, warekî pir xweser diderbirîne.

Gelek teşeyên curbecur ku xwestekên gîyanî di nava xwe de peyda dikin, weke berhemên hunerî derdikevin pêş me, her wiha têrbûyîna arişî (manewî) pêk tînin. Berhemên pergalê jî dem bi dem hunerê bandor dikin. Dîsa pêşketina polîtîk jî pir ji nêzîk ve pêwendîya xwe bi hunerê re dide avakirin. Lê ji van tevan re em nikarin bibêjin huner. Di alîyê din de, di polîtîka û aborîyê de mirov dikare qala hunerê bike. Gelek bîrdozîyên curbecur nêzîkî huner dibin. Di vir de ya bê têgihiştin ev e ku; huner ji faktorên civakî yên din zêde bandor digire, lê bi wan re nabe jêbûnî ango dibe sîyeke wan a pasîf. Lê belê weke

muzîka olî ye jî.

Perestgehên Sumer û akademîyên çandê yên bi navê Edduba, sazîyên ramanê ne ku otorîteya qeranên rahîb pêşve bibin û bidin meşandin. Di çêkirina mîtolojîyê de, ji alîyekî ve ola di rewşa teolojiyê de, ji alîyê din ve jî, pêşnûmayên di rewşa destanên wêjeyê de, peywirên bingeh ên rahîban, wêjevanan û ramangêran e. Nîppur a pîroz, Babîla vê dawîyê, bi hezar salan bûne navendên çand, ol û wêjeya van karan.

Xwedayê we çiqas bihêz be, hûn jî ewqasî bihêz in. Xwedayê xwe tune bikin, hûn xwe jî tune dibin. Xwedayê xwe şaş bikin, hûn jî şaş dibin. Xwedayê mêr Enkî, yê civaka Sumer a biçîn, xasûk û biaqil, ji destê xwedawenda Sumer Înanna, hemû nirxên wê yên ku di civaka neolîtîkê de afirandine, werdigire û her wiha her tiştê xwe, ji zayenda jin ya di civakê de, distîne. Ev yek ne belaş û rasthatinîyeke, destana mîtolojîk ku çûyina Enkî ya ji Orûk heta bi Erîdû, ji wira standina wî ya 104 "Me" yan û vegera wî ya biserketin heta bi Orûkê, tîne zimên û di nav destanan de nemir bûye. Ev destan vegotineke mîtolojîk, olî û wêjeyî ye, bê têkilî û nakokîyan çawa danûstandin û levdanek di navbera xweda û xwedawendan û weke vedanekê di nava civakê de jî tê jîyandin. Ev karê wêjevanên Sumer, tiştekî şahwer û tekûze ku mirov matmayî dihêle. Eslê wê derûna wêjeyê jî ev e.

Rola Huner Û Wêjeya Rojhilata Navîn Di Şaristaniya Greek De!

Phytagoras, di vê nêrînê de ye ku zimanê gerdûnê yê ahengdar, bi muzîkê dikare were ragihandin (hisandin), bipergaliya armonîa diparêze. Heyînên giyanî di bingeha her tiştî de dibîne.

Tevkarîya Greek a li ser şaristanîyê, bandoreke mezin li ser huner û mirûz (moral) jî kiriye. Di warê muzîkê de, digel bandora Sumer, resenîyek jî hatiye jiyandin. Di perwerdeya dilînan de, pêşveçûn çêbûne. Him strana perestgehê û him jî cureyê takekesî jî pêşve diçin. Phytagores mûzîkê weke zimanê gerdûnê şîrove dike, Sumer jî xwedî nêzîkayiyeke wiha bûn. Jîyan tenê bi mîtolojî, wêje û zimanê felsefîk nayê ravekirin, ravekirina bi muzîkê qenc û qenc rûdine.

Di warê peyker de, weke berdewama Greek e. Behskirina orîjînalîteke cuda zor e. Di muzîkê de, bi taybetî di warê leşkerî de, sirûd û stranên serfirazîyê hatine resenekirin. Em dikarin behsa nimûneyekî cil û girêdanên (kinc) ku taybetmendîyên Roma, bikin. Esîltiya Roma xwe di cil û bergên wê re jî nîşan dide, lêbelê ev yek li ber çava ye ku ji Rojhilat berhevkirine. Di hunera wêjeyê de, bandora Helenîzmê xuya ye. Vergîlîus xwezîya xwe bi Elyada Homeros aniye û destana damezrandina Roma, "Aîneas" li ser

Şaristanîya Sumeran Çavkanîya Yekem a Huner û Wêjeyê Ye

Her serûbinbûyîn di destpêkê de li warê hunerê pêş dikeve; hem bandorê li hunerê dike, hem jî jê bandor dibe.



Abdullah Ocelan

Sumerîyan li heyîna raman û rewişta mirov, asayeke (norm) sazûmanîyê ya gelekî bihêz bi cihkirine. Ev qalibekî sazûmanîyê ye ku di hêza wan sazûmanên berê yên şaristanî pêkanîbûn de ye. Ji ber ku bi nivîsê, bi wêjevanan û bi hêz sazîbûna vê daye meşandin, serdestîyeke bêhempa pêkanîye. Bi hunerê re, bi taybetî bi muzîkê re yekîtîyeke bi aheng damezrandiye, bûye xwedî şêweyekî ku heta weke îro ahenga di navbera jîyan û muzîkê de, herî bi hêz îfade kiriye. Çavkanîya sereke ya

Çanda Kurdî li Qamişloyê, gurûpa Tirbespîyê ya çanda Kurdî", dîdargeha Çandî ya Girkê Legê û ... hwd. Di wan deman de pêwîstîyeke mezin bi van çalakîyên bi vî awayî hebû, ew jî yek ji şêwazên tekoşîna gelê Kurd bû, lewma di demeke ku sîyasetên bişaftinê, zordestî û qedexekirinê yên ku li ser ziman û çanda Kurdî dihatin meşandin, di milê parastina çanda Kurdî de roleke mezin a van çalakîyan hebû,

Piştî 2012an, ji ber guherînên sîyasî, û peydakirina atmosfereke azadîyê di qada çandî û rewşenbîrî de, li kêleka kombûn û yekîtîyên wêjeyî û çandî mîna lidarxistina şevbuhêrik, mehrîcan, pêşbirk û heftîyên çandî, gelek salonên wêjeyî jî hatin damezrandin mîna Mîta û Şawîşka li Qamişlo, her wiha hin çalakîyên ku ji alîyê hin sazîyên çandî ve tên lidarxistin û weke salonên wêjeyî jî têne hesibandin mîna yaneya Enkî ya çandî li Tebqayê, rûniştinên xwendina pirtûkan li Kobanê, yaneya "Nûber"ya ku xwendekarên zanîngeha Rojava beşa wêjeya kurdî bi rê ve dibin.

Çalakîyên salonên wêjeyî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê di çarçoveyeke teng de têne lidarxistin û tenê di warê xwendin û nirxandina pirtûkan de ma ye, tevî ku ew jî çalakîyeke girîng e û pêwîst e, lê di bizava çandî û wêjeyî de ne ewqasî bi bandor e, nemaze piranîya pirtûkên ku têne nîqaşkirin ên nivîskarine ji derveyî herêmê ne, ji ber vê yekê berhemên wêjeyî yên herêmî ji derveyî xebatên rexneyî dimînin. Lewma gelek salon karên wan radiweste çimkî ji vê çarçoveyê dernakevin û rewşa çandî û wêjeyî ya giştî nagirin dest. Lewma pêwîst e berpirsyar û kesên ser van çalakîyan disekinin, mijarên girêdayî rastîya wêjeyî û çandî ya ku li herêmê tê jîyîn bigrin dest, reweşa heyî nîqaş bikin, kêm û kurtîyên heyî derxin holê û çareserîyên guncaw ji wan re deynin, da ku bi awayekî aktîv çand û wêjeyê bi pêş ve bibin, her wisa divê alîyên peywendîdar di rêverberîya xweser de li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê projeyên vekirina salonên wêjeyî destek bidin û piştgirî û alîkarîya pêwîst pêşkêş bike.

Therese, ku wek Madam Lambert, Madam de Tensen, Madam Dodivand, Madam Helvetius, Madam de Rambouiyê diahte naskirin, li Swîsrayê salona nivîskara Swîsreyî Madam Necker (Susan Carragd), li Almanyayê jî salona nivîskar Paul Henri Thierry û... hwd. Van salonan ramanwer, nivîskar û sîyasetmedarên herî navdar ên ku beşdarî ronesansa Ewropî bûbûn dicivandin.

Di dîroka wêjeya Erebî de jî tê gotin ku "Sakîna bint El-Huseyn" li Hîcazê di serdema Emewîyan de saloneke wêjeyî ava kir, û Sakîna bint Welada Bint El-Mustakfî salona xwe ya wêjeyî li Qurtuba li Andalus (Spanya) damezrand, ku tê de helbestvanên mezin mîna Ibn Zeydûn jî hebû. Her wiha, salona yekem a Ereban di serdema nûjen de ji aliyê "Nazlî Mustafa Fadil Paşa" ve vebû, di 1890î de hate damezrandin, û ramanwer û nivîskarên mezin ên ku di jîyana çandî û civakî ya Misrê de xwedan roleke mezin bûn beşdarî salona wê dibûn, mîna Îmam Mihemed Abdo, Saad Zexlûl, Qasim Emîn û...hwd. Her wiha salona nivîskara Libnanî "Mey Ziyada" navdar bû, ya ku di 1912an de li Misrê saz kir.

Li Sûrîyeyê, Salona Maryana Maraş (1849-1919) li Helebê hebû, ya ku yek ji nivîskarên jin ên yekemîn bû li Sûrîyeyê, Salona Mary Ajamî jî ku di sala 1922an de hate damezrandin, û Salona Zehraa El-Abid û...hwd.

Pêvajoya damezrandina salonên wêjeyî di cîhana Erebî de di nîvê duyemîn ê sedsala bîstan de zêde bû, gelek rexnegirên Ereb dîyar dikin ku dîyardeya salonan di serdema niha de li gor rabirdûyê di astek nizm de ye, û ew niha bi tenê bûne cihê hevdîtinên bê plan û bê pergal û nîqaş û rexneyên cidî di wan de kêm in, ev dîyar dike ku paşeroja rexneya wêjeyî û rewşenbîrî li gel Ereban di metirsîyê de ye.

Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê, salona "Fewzîya El-Merî" li Reqayê navdar bû, ku weke jina yekem dihat dîtin ku li rojhilatê Sûrîyeyê saloneke wêjeyî ava kir, wê gelek kesayetên wêjeyî, çandî û sîyasî yên Sûrî dicivandin. Her wiha gelek rêxistin, kom û formên çandî yên Kurdî ku di nîvê salên notî ji sedsala bîstan hatine damezrandin, mîna salonên wêjeyî bûn, weke "Gurûpa Dêrikê ya Çanda Kurdî, Komîteya Şevbuhêrkên Kurdî li Şamê, Koma (Tevn) ya Çand û Hunerê li Derekê, Komîteya Çalakîyên

dicivin û zanîn, diyalog û ramanên çandî bi hev re parve dikin, her wiha cihê lidarxistina çalakîyên cihêreng ên wêjeyî û çandî ye

Damezrandin û domandina salona wêjeyî bi hebûna hin mercan ve girêdayî ye, pêwîst e ku damezrîner û birêveberê wê di milê rewşenbîrîyê de xwedan asteke baş be, her wisa di birêvebirina civînên diyalogê û komkirina nivîskar û rewşenbîran de zîrek be. Wekî din jî divê cihekî dîyarkirî ji bo lidarxistina civînan bi awayekî dorveger hebe, û ji bo berdewamkirinê divê fînans û aborîya pêwîst hebe.

Salonên wêjeyî yekemcar di dema ku wekî "Ronesans" tê zanîn de, li Ewropayê, di sedsala şanzdehan de derket holê. ya herî berbiçav di wê serdemê de Salona Valentine Konrar a Firansizî bû, ku di 1629an de hate damezrandin. û ji wê salonê bi xwe, Akademîya Firansizî çêbû û bû bingehekî xurt ji bo zimanê Firansizî di tevahîya Firansayê de. Ev tê wateya girîngîya salonên wêjeyî, û rola mezin a ku ew dikarin bilîzin, heke şert û mercên kalîteyî di damezrandin û sazkirina bername û çalakîyên wan de peyda bibin

Piranîya gel û neteweyan "salonên wêjeyî" dizanîn, bêyî ku heman navî li wan bikin. Helbestvan, fîlozof, zana û şarezayan ji serdema kevnar û serdema navîn de li pêşberî padîşah û şehînşahan li cihên giştî yan li meclisan diketin pêşbazî û nîqaşan de. Li gel Firewnîyên Misrê, Babilîyan û Greekan kombûn çêdibûn ji bo xwendina helbest û stranan, her wiha "Sûka Ûkaz" li Nîvgirava Erebî navdar bû, helbestvanên Ereban kom dibûn û pêşbirkên helbestan pêk tanîn, Gelek xelîfeyên Abbasî bi meclîsên xwe yên çandî û rewşenbîrî dihatin naskirin, mîna El-Mamûn. Her wisa Mîrê Hemedanîyan bi meclisên xwe yên wêjeyî navdar bû, Helbestvan û fîlozofên herî navdar ên wê serdemê, wekî El-Mutanabî, Abû Fîras Al-Hamdanî, Al-Farabî û ...hwd li meclisa wî amade dibûn.

Ya ku dîyardeya "salonên wêjeyî" cuda dike, pêşengîya jinan di damezrandin û birêvebirina wan de ye. Salona yekem li Îtalyayê ji hêla "Izabella diesta" ve hate damezrandin. Li Fransayê, salona yekem ji hêla "Madam Catherina do Rompuye" ve di 1608an de hate damezrandin, piştre Madlein de Scuderi, û nivîskar Anna

Pêşekî

Rol û Girîngîya Salonên Wêjeyî

Desteya sernivîskariyê

Ji bo çalakîyên wêjeyî û çandî gelek formên rêxistinkirinê hene, dibe ku bi rêya deste, navendên çandê, yekîtî, girûp, rêxistinên nivîskar û ronakbîran bin. Çawa ku cihên civîn, gotûbêj û nîqaşan, bi navên cuda têne naskirin weke mînak peyva parlamento ku di sektora sîyasî de tê bikaranîn, di qada rewşenbîrîyê de jî salonên wêjeyî derketin û di zindîkirin û çalakkirina bizava wêjeyî û çandî de li tevahîya dunayeyê roleke mezin lîstin.

Piranîya çavkanîyan dîyar dikin ku "salon" peyveke Ewropî (Îtalî) ye ku tê wateya "jûreya pêşwazîyê" yan "hol". Salona wêjeyê, ew cihê ku kesên di warê wêje û çandê de dixebitin li hev

• **Pirtûkên derketî** .....
- Qaqlîbaz .. (Pirhişyar Ismaîl)..... 62
- Pirtûkên derketî.. (Desteya sernivîskarîyê) 70

• **werger** .....
- Zindan.. (Zekerîya Tamir-Wergera ji erebî: Aram Hesen)..... 75
- Şîroveyek Der Barê Wergera Farisî Ya ‘’Firîna Bi Baskên Şikestî’’ De.. (Ezîz Nêmetî-Wergera ji farisî: Berat Qewîendam)..... 78

• **Çîrok** .....
- Gulîyên Darizandî.. (Evîn Teyfûr) 84
- Welatê Bê Roj.. (Pêşeroj Cewherî) 87

• **Helbest** .....
- Sîng Mertal im.. (Îsmet Hesen) 89
- Nizanim!.. (Ciwan Qado) 90
- Ragihandina Vînê.. (Xemgîn Remo) 91
- Çima Tu Diçî? ..(Şivîn Hecî) 92

• **Serbest** .....
- Xwendin Afrînerî Ye (Fatma Sîdo)..... 94
- Gundê Qêsim.. (Şerîf Mihemed- Welîd Bekir)af)..... 97
- Rondik .. (Rûken Hisên) 100

Naveroka Hejmarê
- Beşa Kurdî-

• **Pêşekî** .....
• Rol û Girîngîya Salonên Wêjeyî.. (Desteya sernivîskarîyê) 5

• **Analîzên hizrî** .....
• Şaristanîya Sumeran Çavkanîya Yekem a Huner û Wêjeyê Ye ..
(Abdullah Ocelan) 9

• **Dosyaya hejmarê** .....
• Salonên Wêjeyî û Rola Wan Di Civakê De.. (Biradostê Mîtanî)..... 13
• Salonên Wêjeyî Li Bakurê Welêt.. (Ahmed Kanî)..... 20

• **Lêkolîn** .....
• Qelen û Baviksalarî... (Darwîn Darî) 24
• Di Dengbêjîyê De "Naverok"... (Elîf Gûn) 40

• **Hevpeyvîna hejmarê** .....
• Li Gel Nivîskar "Kamran Simo Hedilî" Ye (Desteya Sernivîskar) 52

• **Jin û çand** .....
• Ji Civat, Komcivîn û Şevbuhêrkan Hetanî Salonên Wêjeyê..
(Nêrgiz Ismayîl) 58

Şermola... Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e

Divya bû em weke rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûryê asta keda çandî bilind bikin di rewşên herî dijwar û di şerekî bê hempa de, ku destwerdanên navdewletî , herêmî û xwecihî tevlî hev bûne, şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûryê ji hinavê vê rewşê pengizî. Gelên wê qurbaniyên herî mezin pêşkêş kirin ji bo bidestxistina jiyaneke demokrat û azad , ku nirxên civakbûyînê yên bi hezarên salan rehên xwe berdane bîrgeha vê xakê biparêze, di encama vê keda tê dayîn de me ev kovar weşand ku em tê de hewil didin di riya pênûsên şareza de radeya pêkanîna çandî pêş ve bibin ta ku bibe hêjayî asta bûyerên ku diqewimin, her wiha ji bo bibe bingeh û hêzeke bandorker, ku asta civakê ji milê ramyarî û çandî ve pêş bixe ji bo xwe bigihîne ayîndeyeke baştir û çêtir.

Desteya sernivîskariyê navê Şermola hilbijart ji ber sedemên dîrokî ku reseniyekê lê bar bike. Şermola bi xwe navê girekî dîrokî ye li Amûda Bakurê Sûryê ye, di gel ku girên herêmê bi giştî di serdema Horî-mîtanî de weke nîşana kombûnê di rewşên awarte de û li hemberî êrîşan dihatin bikar anîn, lê piştre ew gir weke rawestgeh û dîdargeha karwanên guhêzer di navbera mîrnişînên hundirîn ên Sûryê û bakurê wê û Kurdistanê bi gelemperî bi kar dihat.

Lewre ev nav rehendeke dîrokî digre ku reseniyeke ramyarî û wêjeyî peyît dike , ta karibe bibe dîdargeheke çandî ji bo rewşenbîrên gelên herêmê bi giştî. Deriyê kovarê vekiriye ji bo hemî şiyanên wêjeyî û afrînerî, ku hevdengiyekê li gel armancên kovarê di şiyarkirnê de dike, her wiha veguhastineke bê hempa di rojeva çandî de li Rojava û li Bakurê Sûryê bi giştî diafirîne, li kêleka sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, rojname û kovarên wêjeyî li herêmê.

ŞERMOLA

شـــرمولا

-Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane û Serbixwe ye, bi zimanên Kurdî û Erebî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê weşandin.
-Di 24 Êlûna 2018›an hatîye damezrandin û Hejmara yekemîn di roja 7›ê Sibata 2019›an de derket.
-Kovarê rêdana xwe Ji Encûmena Bilind a Ragihandinê ya Rêveberiya Xweserîya Demoqratîk a Herêma Cizîrê, li gor belgeya NO 3 a ku di dîroka 29.1.2019›an Hatiye Dayîn, girtîye.

Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.
-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nirxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.
-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û polîtîkayên kovarê derbirîn dikin.
-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tên şandin, ji aliyê zanistî ve bi belge bin, ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvan de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyv de be.
-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin:
Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr, eger pirtûk wergerandî be-cih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname, kovar, malpera elektironîk) - hejmara weşanê (ya rojname û kovaran) - dîroka weşanê.
-Berhemên ku tên şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bênirx e, berê hatiye weşandin, ji dezgehine din re yên ragihandinê hatiye şandin, ji derveyî rêgezên gîştî yên civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

Rêveber û Sernivîskarê gîştî:
Dilşad Murad

Sernivîskarê beşa Kurdî:
Aram Hesen

Beşa hunerî:
Rêvan Yûsiv

Desteya sernivîskarîyê:
Aram Hesen
Abdullah Şikakî
Ehmed Alyûsiv
Fatma Sîdo

-Malpera kovarê:
www.shermola.net
-E-MAIL:
shermola2018@gmail.com
-Telefon û whatsapp:
0998149668

-Kovar li Çapxaneya Şehîd Herekol – Dêrik tê çapkirin.
-Belavkirin û Firotin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşgeha Alşemal – Qamişlo 0998234958.
-Pirtûkxaneya Amara ya navendî (Qamişlo, Bazara navendî) 0937812709.
- Nirxê kovarê (1000 L.S).

Ji Cilên gelêrî yên Kurdî

ŞERMOLA

شـــــرمولا

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane ye

Hejmar: 9 Zivistana 2021 z

Dosyaya Hejmarê

Salonên Wêjeyî

Hevpeyvîna Hejmarê Li Gel Nivîskar Kamran Simo Hedilî

Salonên Wêjeyî Û Rola Wan Di Civakê De

Di Dengbêjîyê De "Naverok"

Tabloya Qapê: Romyo Kobanê